


# NÛDEM

No 2-1992



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

# NÛDEM

2-1992

Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî: Firat CEWERÎ

## NAVEROK

ÇEND GOTIN - Firat CEWERÎ

REMZÎ, RESAMÊ RENGÊN GIRTÎ - Mehmed UZUN

NAV Û DABEŞKIRÎNA XEWNÊN HÎRO - Ehmed HUSEYNÎ

SUWAR Ê HESPÊ KIMÊD - H. KILIÇ

ÇÎROKA SÊZDEH ŞEV Û SÊZDEH ROJAN - Arjen ARÎ

TEYRÎKÊ ÇEMÊ XERZAN - Firat CEWERÎ

PAYÎZ - ŞAHÎNÊ BEKÎRÊ SOREKLÎ

YÊN RAKETÎ - Husên HEBES

MELE EHMEDE CÎZÎRÎ - Zeynelabîdîn ZINAR

Mirina Mirîşka Spî - Dr. Cemşîd BENDER

ŞEVÊN SPÎ - DOSTOYEVSKI - Werger: F. CEWERÎ

AHMED ARÎF - Şêrin BOZARSLAN

SÎ Û SÊ GULE - Ahmed Arif - Werger : Hatice AL

DARA HINARÊ A LÎ SER GÎRÎK - Yaşar KEMAL - Werger: Dr. POLOÇO

FATÎH MUDERÎS - Dilower MÊQERÎ

ARAMÊ TÎGRAN - Derwêş M. FERHO

KEÇIKA KIBRÎTFIROŞ - H.C. Andersen - Werger: Bişarê SEGMAN

HEVPEYIVÎN BÎ H. SILÊVANÎ RE - Xelîl DIHOKÎ

KAM BÎ EDÎTH SÖDERGRAN - Farûk YAKUP

ZEVTE KÎ ÇORŞMEYÊ SÊWREGÎ,

ÇERMÛGÎ Û ALDÛŞÎ - Koyo BERZ

DANASÎNA PIRTÛKAN, LÊKOLÎN - Husên DÛZEN

DANASÎNA PIRTÛKAN - Amadekar : E. HUSEYNÎ

Hevkarê Swêd: Dilawer MÊQERÎ - Hevkarên Swêd yên beşa Zazakî: Koyo Berz, Faruk Yakup

Hevkarê Danîmark: Weşanxaneya Xanî û Batîyî - Hevkarê Awistîralya: Şahînê Bekirê Soreklî. Hevkarê Belçîka:

Derwêş M. Ferho. Hevkarê Almanya: Husên Düzen. Navnîşan : GAMLALANDSV. 36, 740 41, MORGONGÅVA,

SWEDEN. Tel: 0224 - 61428 . Telefax: 0224 , 61428. Pasgîro 636 36 25 - 2 Şerdên abonetiyyê ji bo salekê: Swêd

190 Skr. Ewropa û Rojhelata Navîn 50 DM. Amerika û Awistîralya 39 \$. Reklam: Rûpela dawî bi reng 2000 Skr.

rûpelên nêvî 1200 Skr, nîvrûpel 750 Skr. Ev weşaneke BEYBÛNÊ'ye

Me dixwest ku em hêjmara kovara "Nûdem" a duwemîn li Tirkiyê biweşînin. Lê belê pîrsa destûrê bi derengî ket. Ji ber vê yekê me ev hêjmar bi vi awayî weşand.



*L'homme du midi (100 X 73 cm)*  
*Remzi*

# ÇEND GOTIN



F. CEWERÎ

---

## Fîrat CEWERÎ

**D**i hejmara kovara me ya yekê de, hevwe-latiyekî bi navê Îbrahîm Al ji me re nameyek şandibû û di nameya xwe de behsa serpêhatiyeke xwe ya bi rojnameyeke kurdî re kiribû. Gava mirov serpêhatiya Mîrza Îbrahîm Al dixwîne, mirov hem bi rewşa wî dikene, hem ji pê xemgîn dibe. Îbrahîm li çayxaneyekê rojnameyeke ku nivîs û bendên kurdî tê de hene, dibîne, radihîje wê rojnameyê û bê hedan berê xwe dide malê. Ew li malê pêşî wê rojnameyê ji xwe re, paşê jî ji dê û bavê xwe re dixwîne. Lê mixabin, dê û bavê wî jî, ku herdu karmend in û xwendin û nivîsandina wan heye, ji xwendina Îbrahîm tiştekî fêhm nakin. Gorî ku Îbrahîm Al di nameyêke xwe ya din de dide xuyakirin, ew yeka han li wî dibê gir û ew roj ev roj e ew serê xwe bi kurdî re dêşîne û herweha ew jin û zarokên xwe jî dajo ser xwendin, hînbûyin û nivîsandina zimanê kurdî.

Ev serpêhatiya Mîrza Îbrahîm Al serpêhatiya nivşekî ye. Ji avakirina Cumhûriyeta Tirkîyê (1923) û bi vir de ziman, edebiyat, çand û her celeb toreya kurdî li Tirkîyê qedexe bûye, nivîskar û hunermendên kurd yên ku xwestine pê nûs û firçeya xwe ji

bo gelê xwe li ba bikin, ew tavilê ji aliyê serdestan ve hatine rawestandî, devê wan hatine gem kirin, zîndan û îşkence her bûye para wan. Hem li Tirkîyê, hem jî li welatên cîran yên ku îro serdestiya kurdan dikin, gelek nivîskar û hunermendên kurd derketine, bi zimanên serdestan nivîsandine, di gel pîr zehmetiyan ew dîsan bûne pêşevanên edebiyata wan. Lê mixabin, piştî demekê pîr ji van nivîskar û hunermendên kurd bi dû navê xwe ketine û hunera xwe ji bo gelên serdestên kurdan bi kar anîne. Em hêvîdar in, ku wê ev hunermend û nivîskarên kurd yên zîrek li xwe vegerin û bi kurdîbûna xwe navdar bibin.

Welatên serdestên kurdan ji bo ku ziman, çand û edebiyata kurdî qedexe bikin, wînda û asîmîle bikin wan xwe gelekî êşandine. Ji ber ku ew jî zanin ku ziman yek ji nîşanên neteweliyê ye. Ku zimanê miletekî wînda bibe, nemîne, hebûna wî milletî jî dikeve talûkeke mezin û piştî kurtedemekê ew di nav rûpelên dîrokê de wînda dibe. Ziman çawan ku yek ji nîşan û pîvanên neteweliyê be, ew wîsan kîlîta kulturê ye jî. Gava ziman nemîne, kultur dihare; ku kultur here ew gel bi xwe ji navê radibe. Lê her çiqas serdestên kurdan xwe ji bo

dibe. Lê her çiqas serdestên kurdan xwe ji bo vê windakirin û ji navêrakirina kurdan êşandibin jî, dîsan ew bi ser neketine; ew serpêhatiya hevvelatîyê me yê hêja Îbrahîm û rebeniya wî ya nezaniya zimanê wî êdî dibe dîrok.

Ji ber ku gelê kurd êdî hew pîkolî û stem-kariyê dipejirîne, ew li her derê, bi her awayî ji bo bidestxistina mafê xwe li ber xwe dide. Di van deh donzdeh salên dawî de, bi şiyarbûn û li berxwedana gelê kurd re, di warê ziman, edebiyat û kultura kurdî de jî gavên dîrokî hatine avêtin. Deriyê civata me ya ku di tarîtiya salan de fetisî bû, êdî vedibe, çirûsk û tîrêjên medeniyet û zanistiyê derbasî hundirê wê dibin. Êdî em ji dema bê pirtûk, bê rojname û kovar rizgar dibin; ji bo ku em cihê xwe di nav civatên nûjen û hemdem de bigirin, em bi pênuşa xwe ya di rengê şûr de ye li ber xwe didin. Di demek wilo kurt de, penûsa kurdî bi xurtî li ser kaxizê li ba dibe, dert û kul, êş û elem, xweşî û spehîti, tore û xwezaya kurdistanê û ya gelê kurd bi lîrîzmek xurt tîne ziman. Di vê mijarê de kurdî ewçend bi pêş ketiye, ku di her şaxan de berhemên nemir tîne afirandin. Herweha nivîskarên kurd yên nûdemî û nûjen peyda bûne, ji bo xweşkirin û rohnîkirina civata xwe bi zendên xwe yên zexim, ew ala ku ji aliyê xwedî û hevkarên HAWAR'ê de nêvcî-mabû, ber bi asmanê çiksayî ve dikişînin. Niha gelek kovar û rojnameyên

kurdî yên bi qîmet derdikevin, ev yeka han jî nifşek xwendevan û nivîskar bi xwe re digihînin. Wek me di kurtepêşgotina hejmara pêşî de jî dabû xuyakirin, ku em ne kovara pêşî, ne jî ya dawî ne; lê em ê bixwazin bi pîvanên navneteweyî, bi estetefîk, bi profesyonelî û ya heft girîng jî bi dengê Kurdîstanî derkevin. Loma jî, piştî belavkirina hejmara pêşî ji me re ji her aliyê welêt name, pîrozname û nivîshatin. Ji Ermenîstanê Mîrza Tîmûrê Xelîl û xanima hêja Nûra Cewarî, ji Îranê Mîrza Ehemmed Şerîfî û Perwîz Cîhanî û herweha pîroznameyek ji kovara hêja Sirwe, ji Sûriyê kovara delal stêr û zebatkarên wê, ji Tirkîyê Mîrza Faik Candan û Dr. Cemşîd Bender û pîr kesên din, ji Ewrûpa, Awistîralya û Amerîka jî gelek pîrozname û nameyên xweş ji kovara me re hatin. Vê yeka han gelek dilê me şa kir û kir ku em bi xurtî ji bo berdewamiya kovarê serê xwe biêşînin. Daxwaza ku NÛDEM jî nivîskar û hunermendên her perçeyên Kurdîstanê re bibe pîreya hevdunasîn û hevdubihîstinê hêdî hêdî bi cih tê. Ev yeka han jî zorê dide me ku em dema kovarê kurttir bikin û ne ji sê mehan carekê, lê em wê ji mehê, an jî ji du mehan carekê derxînin.

Gelî nivîskar, hunermend, ronakbîr û xwendevanên kurd yên hêja! Werin em mil bidin milên hev, em bi hev re civata xwe ya ku bermaya gelek medeniyetan e bigihînin cîhana nûjen!



*Remzi*

# REMZÎ, RESAMÊ RENGÊN GIRTÎ



Mehmet UZUN

**B**erî niha bi çendekê, min romana Gertrude Stein "Çîroka jiyana Alice B. Toklas" (*The Autobiography of Alice B. Toklas*) xwend. Gertrude Stein, nivîskar û şahîr, ji Yekitiya Amerikê bû, lê wê piraniya umrê xwe li Fransê û Parîsê derbas kir. Ew di vê romana xwe de, bi devê hevala xwe Alice B. Toklas, bi bedewî behsa jiyana civakî ya Parîsê, di salên 1910-30 an de, dike. Ew hevala nivîskar, şahîr û hunermendên mezin mîna Pablo Picasso, Henri Matisse, Braque, Juan Griss, Guillaume Apollinaire, Ernest Hemingway û h.w.d. bû. Di romana wê de, taxa Montmartê cîhekî esasî digire. Jiber ku Montmartre hingê cîh û warê nivîskar û hunermendan bû. Piraniya wan li wir dijiyan, her şev li wê derê şênahiyek hebû. Modernizm, kubizm, dadaizm, surrealizm li wir ava dibû û dikemilî.

Lê paşê, dewr û dewran guherîn. Çaxa ew nivîskar û hunermend bûn navên navneteweyî hatin nasîn û cîh û malên wan bûn seyrangeha tûrîstan, wan ji wir bar kirin, di ser piran re derbas bûn û çûn aliyê rojava ya çemê Seinê, aliyê Germain des Pres, Saint Michel, Quartier Latin û Montparnassê. Jiyana edebî û hunerî, îcar, li vî milê Seinê şên bû. Îro jî hê wisan

e; piraniya nivîskar, şahîr, hunermend û ronakbîrên Parîsê *Montparnasse*, bi taybetî piştî şerê cihanê yê duwemîn, bû warê hunermend û ressamên. Gelek mal guherîn û bûn atelyê ressamên. Bi dehan, sedan bar, restourand, qahwexane û salon vebûn. Nemaze qahwexana Le Select û restourana *La Coupole* bû navenda hunermendan. Lê gava dinya pê hesiya ku hunermend derin wan deran, ew der jî bûn cîhê tûrîstan... Hunermendan jî dest pê kirin û xwe spartin cîhên hîn nenas.

Di payiza 1987 û bihara 1988-an de, çend demsal, ez jî li Parîsê jiyam. Mala min gelekî dûrî Montparnassê bû, lê min li Sorbonnê, pir nêzîkî Montparnassê, fransîzî dixwend. Xwendegêh li ser *Boulevard Raspail*ê bû. Ew qahwexane û restourandên ku niha li hemû cîhanê nas in, li der û doraliyê bûn. Lê, hema li kêleka xwendegêhê, wî aliyê derve, bala tu kesî nedikişand. Lê li hundir, her tim, hin hunermend û nivîskar rûniştî bûn. Mudawîmên qahwê, xwendevanên lîseya kêlekê, rûniştevanên taxê û ressam û nivîskar bûn. Xwarin û şaraba wê derê nedihate vexwarin, lê qahwa wê xwêş bû. Komeke ressamên tirk, mîna Komet, lawê Nazım Hikmet Mehmet,



*Le portrait de Müzehher  
1964*



Mehmet Ileri, Selim Turan, ji diçûn wê derê. Ressayê kurd Remzî ji heftê carekê—du caran diçû qahwê. Piştî nivroyê, li dora saet 15.00-15.30, ew li wir diciviyar. Hingê xwendina min a rojane ji xelasdibû û carina ez ji diçûm û bi wan re rûdiniştim. Û her cara ku Remzî li wir bûya, ez jî, îlam, diçûm û rûdiniştim. Sohbet her li ser huner, edebiyat û çandê bûn.

Herçî atêlya xebatê ya Remzî hinekî dûrî Montparnassê, nêzîkî Boulevard Lefébvre bû. Ew her roj, ji saet 8.30-9.00-an heta 15.00 an, li atêlya dixebitî û paşê dihat Le Gymnastê. Mîna karkerekî, her roj, di wext û saeta xwe de, ew bi karê xwe mijûl bû. Atêlye ya wî bi xwe bû. Atêlya wî li hewşeke fireh bû. Li kêleka atêlya wî, atêlyên ressayên din hebûn. Cîh, cîhê ressayan û hunermendan bû. Di destpêka salên 50-an de, ressayên tirk ên navdar Fikret Mualla, Abidin Dino ji li wir xwedî atêlye bûn.

Yek ji xatirayên herî rengîn ji rojên min ên Parîsê, ew atêlye ye. Ji her du heftan carekê, roja pêşemiyar, saet 11.00, ez diçûm atêlye, nik Remzî. Hertim li ser paleta wî tabloyek ku ew li serê dixebitî, hebû. Li kêleka paletê, maseyêke biçûk û li serê her celeb firçe, pêñûs û boyax hebûn. Li nik dîwaran, tabloyên ku nivçe mabûn yan jî ew hê li serê dixebitî, hebûn. Li kêleka dîwarekî dîwaneke kevn, du kursî, maseyêke biçûk û li ser masê jî meywene çûlmisî hebûn. Ew sêv û portakalên çelmisî, ji bo wî pir girîng bûn; yek ji kaniyên îlhamê bûn. Wî, firçe di destan de, bi henekî digot, "di despêka ressayiya xwe de, Matisse diçû û pere deyn dikirin da ku hin meywe bikire û wan biçelmisine..." Di qata jorîn a atêlyê de jî, tabloyên wî yên temambûyî hebûn. Pêşiya atêlyê pir fireh bû û li hewşê dînhêrî. Pêşî tenê cam bû. Tîrêjên tavê di caman re diketin hundir û atelye ronî dikirin. Atelya Remzî hertim ronî bû...

Gava ez diçûm ba wî, hertim, çaya me li ser êgir bû. Me çaya xwe vedixwar û dest bi sohbetê dikir. Sohbetên me li ser rewşa kurdan, huner, senhet û edebiyata nûjen a kurdî,

jîyan û tecrubên me û li ser tabloyên wî bûn. Ji peyivîne zêdetir, min jê dipirsî û lê guhdarî dikir. Çirokên avabûn û afirîna tabloyên wî ku wî hêdî hêdî behs dikir, pir balkêş û xweş bûn. Welê dixuya ku her tablo û berhema xwedî jiyanêke taybetî û çirokeke balkêş bû. Li pey tabloya wî *Famme au col de Fourrure* xebateke dûr û dirêj hebû. Ew bi mehan çûbû *Le Select* ê, li wir li pîrejina ku her car dihat û qahwe vedixwar, nihêrêbû û li ser kaxizan, bi qelesa reş, taswîra tabloya xwe çêkiribû. Ji serpêhatiya avabûna tabloya wî *La Fournache*, meriv dikarîbû romaneke modern û bedew derxista. Tabloya wî *Le fauteuil au bouquet* xwedî umrekî dirêj û balkêş bû. Yanê serpêhatiyên tabloyan û zimaneke wan ê xas hebû. Meriv diviya bi wî zimani bizanibûya da ku dunya Remzî jî binasiya. Dost, heval û nasên me yên hevbeş hebûn. Yek ji wan, nivîskarê fransîzî yê sedsala 19-an *Gustave Flaubert* bû ku me herduyan jî bi kêfxweşî dixwend. Ji bo Remzî, Flaubert tîmsala hunermendiya bedew bû. Evîna hunermendiyê, hez û coşa afirînê, têkûziya xebatê, kitekiên taswîran, mesajên însanî... ev hemû ku ji bo Remzî jî qayidên esasî bûn, li nik Flaubert hebûn. Remzî nivîskar, resam û hunermendên çeşnên din mîna endamên malbatekê didîtin. Afirandin û avakirina bedew esas bû. Li dewlemendiyên însaniyet û cîhanê berhemeke nû zêde kirin, qayidê bîngêhîn bû. Ev berhema dikarîbû bibûya romanek, tabloyek yan jî stranek. Ya girîng, jiyanêke çalak, bihîstiyar, bikêr û biber bû.

Kitêba *Gustave Flaubert "Taris Contes"* (Sê Çîrok) ku Remzî hingê diyarî min kiribû, hê li kitabxana min e. Ev sê kurte-çîrok nîşana hostehiya Flaubert in. Mesela, ji bo ku Flaubert kurte-çîroka "*Un coeur simple*" (Dilekî basîd) binivîse, ew şeş mehan li ser dixebite. Di zivistana 1876—an de, fikira nivîsîna kurte-çîrokê di serê Flaubert de dikemile û di biharê de jî ew dest bi nivîsînê dike. Lê ji bo ku ew wê binivîse, ew dere navçeyên ku kurte-çîrok ê lê derbas bibe; Pont-L'Évêxue, Trouville, Honfleur. Bi qasî şeş mehan ew li navçê



*Ma Prison (No 2)*  
(1984 - 1986)

dimîne, digere, dipeyive, dixwe, vedixwe, difikire, dixwîne û bi vî terhî kurte-çîroka xwe dinivîse. Gava ew kurte-çîroka xwe dinivîse, ew dibêje: "ez ketime nav ava bîranîn, xewn û xeyalan..." Remzî jî digot, "ma meriv heta nekeve nev çemê xewn û xeyalan, dikare berhe-meke bedew biafirîne?..."

Sohbetên me yên rojên Pêngemiyar, bi xwarina firavîne diqediya. Nêzîkî atêlyê restoraneke biçûk û xweş a fransîzî hebû. Saet 13.30, em diçûn wê derê, me bi hev re firavîn dixwar, paşê min jê xatir dixwest û vedigeriyam navende bajêr. Wî jî berê xwe dida atêlyaya xwe da ku here û bikeve nav çemê xewn û xeyalan.

\*\*\*

Tarîxa xewn û xeyalên Remzî sala 1928-

an, li ser tixûbên Suriye, Antaqiye û Turkiyê, Kirikxanê, dest pê dike. Bi gotina wî, hingê diyekê kurd, li ber lingên Çiyayê Kurmanc, lawekî tîne dinê ku navê Remzî lê dikan. Zaroktiya wî li wir, di nav malbata mezin a kurdî de derbas dibe. Ew bi adet û ûsilên eşîrî û koçerî yên kurdî mezin dibe. Ap û met, xal û xalfî, hertim li dora wî ne. Koçerên kurdan havînan hildikişin zozanan, zivistanan dadikevîna Kirikxanê û bajarên navçê. Jiyan rengîn e. Reng jiyan e. Hişnahiya der û ber, keskahiya biharê, gewrahiya gupikên çiyar, rengîniya lehîyan û berpâlên çiyar, keskesora xunava biharê, şinahiya esmanan, zerahiya çirûskên stêrkan, sorahiya tava hingurê, reşahiya kon û reşmalên kurdî zarotiya Remzî radipêçin. Reng dibe perçeyekî jiyana wî. Rengên yekta yên cil û berên keçên xama yên sergovendan,

neqşên xalîçe û kifmên kurdî dikeve bîr û heşê wî. Tabiyat dibe kaniya hûs û pejnên wî. Hê di neh saliya xwe de, ew radihêje pênuşê û dest bi xêzam dike. Dar û ber, zinar û çiya, av û çem, teyr û tûr, zom û zozan, şikêr û şiverê, heyy û stêrk, bi xêzikên wî, hêdî hêdî, diqulipin ser kaxizan û hunermendiya kurdekî dikiemilînin. Sala 1947-an, ew yekemîn pêşandina (exposition) xwe, li Kirikxan û Iskenderûnê tîne pê. Xelkê navçê gelek bi bergeh û resimên wî qayil dibin. Lê ne ew bi xwe. Jê re zanîn divê. Kemilandin û hostehî divê. Cihaneke fireh û nûjen divê. Jiyanê hunermend divê. Ew berê xwe dide Stembolê û dere, li wir, dest bi xwendina "*Güzel Sanatlar Akademisi*"yê dike. Sala 1948-an, ew pêşandaneke nû li şîşli Halkevi'yê çêdike. Bi dû re, ew dibe yek wi damozrovan û endamên grûba ressamên "*Onlar gurubu*" ku di hunermendiya Tûrkiyê de cihêkî wê yê xas heye. Lê ew xwendin, zanîn, xebat û xwepêşandin jî qîm nake. Jê re hîn bêtîr pêwîst e. Icar jî, sala 1953-an, ew berê xwe dide Parîsê, cih û warê resam û hunermendan, navend û Meke'ya ronakbûr û hunermendiyê. Li Parîsê, ew dest bi xwendegaha "*l'ecole des Beaux-Arts*" dike. Di dawiya salên 50-an de, ew celeba ressamîya xwe dibîne; peysage (bergeh) û nature-morte.

Li Parîsê bi hezaran hunermend û ressam hene. Lê kêma kes jî wan bûne navên nas û dikarin bi hunermendiya xwe bijîn û mîna hunermendekî di civatê de bilebitin. Remzî jî wan kêmkesan e. Ew navekî nas e. Hemû cihana hunermendiyê, ger li Fransê, ger li Dunyê, wî bi nave "*le peintre kurde REMZI*", yanê ressamê kurd Remzî, dinasin. (Gava jenosîda Helepçê li Kurdistanê Iraqê çêbû, bi rêberîya Remzî pêşandaneke mezin ji hunermendên kurd, turk û firansîzan, li Parîsê, çêbû.) Heta niha bi dehan pêşandanên wî li Fransa û welatên din hatine pê. Tabloyên wî li gelek galerî û muzeyên navdar ên Fransa, Yekitiya Amerîka, Swîsre û Tûrkiyê hilawestî ne. (Gava Enstîtûya Kurdî li Parîsê vebû, 1982, hingê Remzî tabloyeke mezin û xweşya nature-morte yadîgarî Enstîtuyê kir. Tabloya

wî li salona mezin a Enstîtuyê ye.]

Rengên ku Remzî di tabloyên xwe de bi kar tîne, rengên taybetî yên kurdan û jiyana kurdî ne. Lê detayên hostehî û zanîna hunermendiyê lê zêde bûne. Wî hem bingeh parastîye hem jî li gora xwe ûslîb û şeweyeke nû ava kiriye. Sala 1971-an, wî pêşandaneke navdar li *Musée de Laon* çêkir. Thérèse von Essen ji kataloga wê pêşandanê re pêşgotinek nivisiye. Li wir Remzî ji xwedîya pêşgotinê re dibêje ku hemû hunermendiya wî bingeha xwe ji zaroktiya wî ya girtî werdigire, hemû ji *Hac Güle tê*. "*Berî her tiştî, ez ressamêkî hîsî û bihîstiyar im*", ew dibêje. Eger meriv ji nêzîk ve bala xwe bide tabloyên Remzî, meriv dibîne ku *rengên tarî* desthelat in. Gava me hevûdu didît, min jê dipirsî, çima? Wî jî bersîva min bi pirsîyarek dida, "*ji bo resamekî kurd çima na?*" Ez bi xwe tu carî, di tabloyên Remzî de, vekirî û berbiçav, rastî trajediya kurdî nehatime. Jixwe ressamîya wî jî ne figurativ e. Lê *rengên trajediya kurdî* di hemû tabloyên Remzî de diyar in. Ne trajedî bi xwe, lê rengên wê. Ma trajediya kurdî jî ne perçeyekî esasî yê jiyana Kurdî ye? jiyana kurdî mezin bûye û li sirgûnê dijî, bêdeng û keserkûr, rengên trajediya kurdan, bi hêdfika, direşîne ser paletên xwe. "*Tabloyên min nakenin, tê de ken nîn e*", wî car bi car, ji min re digot. Ilhama meyweyên çelmîsî jî di vir de ye. Ronahî li pey rengên tarî, sî û reşahiya bergehên nediyar e. Meriv divê tê re derbas bibe da ku bikaribe xwe bigihîne ronahiya li pey. Di tabloya *Femme au col de fourre* de, bi rengên tarî pêçayî, pîrejînek heye. Jinek ku nakene û kesertîjî ye. Çavên wê di kûrahiyê de ne û bi kûrahî difikire. Ew li dûr dinihêre. Rû û rûçik, mîna meyweyên çilmîsî yên atêlya Remzî, pîr e. Jê re pêşeroj nîn e, paşeroj jê re bûye jiyân. Di nav tarîhiyê de pîrejînek... Lê ew tablo, ew reng, herwekî yên din, bala merivan dikişîne, merivan dihejîne, pirsîyara "çima"yê tîne bîra merivan. Loma jî ew rengên tarî dibin jîndar, pejnên xurt jê derdikevin.

Henri Van Ier ku pêşgotîneke balkêş ji ka-



*La Dame du Select*  
1959

taloga pêşandaneke Remzî re nivisiye, Remzî mîna endamekî "*l'ecole de Paris*" (mekteba Parîsê) dibîne. Ji bo ressamêkî xerîb ku paşê hatiye û li Fransê, Parîsê bi cîh bûye, ev bi-navkirin payebilindiyêke mezin e. Jiber ku hîmdarên Ekola Parîsê ressamên pir mezin, mîna Van Gogh û Cézanne, in. Henri Van Lier bi taybetî behsa tabloya Remzî *La Fournache* dike û dibêje ku şopên Van Gogh û Cézanne tê de hene. La Fournache çiyayekî li navçê la Drôme-Poât, Sigillat'ê ye. Remzî bergeha çiyê, dîsan bi rengên xwe yê taybetî, çêdike. Reng tarî ne; ewr û esman, dar û ber,

quntar û gopikên çiyê bi tonên cihê yê tarî-tiyê hatine lêkirin. "*Ev rengên tarî, bi carekê, dibin xalîçeyêke rengîn û jîndar*", Henri Van Lier dibêje. Û ew di tabloya *Le fauteuil au bouquet de jî*, digel rengên taybetî yê kurdî, rengên medeniyata Îslamê jî dibîne. Belê digel rengên kurdî, Remzî ji rengên çand û medeniyetên cîran jî destekê dibe û jê sûd werdigire. Bi vî awayî ew hunermendiyêke taybetî, rengîn, neteweyî, navneteweyî û pîralî tîne pê. Bi gotîneke din, ressamê zîz û ziravbîhîstiyar, bi hemû hêz û quweta xwe ya hunermendiyê, şahîdî li jiyaneke zîz û ziravbîhîstiyar dike û jê tabloyên bedew derdixe...

# NAV Û DABEŞKIRINA XEWNÊN HÎRO



---

Ehmet HUSEYNÎ

## RONO 1

Ji bo Nûra Şêxbekir

Hêlîna me ya ji tevna bendemanê  
Çûkê nalîne di pencên demê de!  
Porê te yê berdayî li ber bayê kovanê  
Raperîna şevê di bêhişiya gemê de!

## RONO 2

Pênc demsalên kerikî  
Di hêsrên te de dinivin...  
Pênc okyanûsên zerikî  
Di xwîna te de dilivin...  
Buhareke qehweyî ye  
Lêvên te dişo ji stêrkên tirsê...  
Buhreke kesk î tarî ye  
Çîçekên gerdena te dike pîşo  
Û guh nade pirsê  
Û buhara te tê  
Ji leylan û xweliyê  
Ji kuncî û tûtina qaçax  
Ji pîvazterkên Xursê  
Buhara te mîna ziya  
Xwe dadida gimijîna Xwedan  
Ji bêrfikirinê şîyar dike  
Termê helbestan  
Serpêhatiyên te dixwîne!  
Demsala te bi te  
Û bi şîrava xewnan dimîne!!

## RONO 3

Gula berbiro  
Ya ku her ro  
Bi pêjna te dilşad dibû  
Dilşîland,  
Û çiya bi xwe re dihejand,  
Ya ku zereki sosinî  
Bi ser hinarîkên roavahiyê de  
Dirijand,  
Ew gul...,  
Bû kul...,  
Ji hesreta hevdîna te  
Pêsrên mirinê mijand!

1991

## DAYIK

Di esra teng de  
Di esra bê reng de û  
Di beneşa demê de  
Giyana xwe spartibû  
Dara hinarê  
Li ser serê te hehecîkên  
Serdema giryanê  
-Kurê min!  
Rewrewka dîrokê em xapandin  
Axxx dayê!!  
De bi tayê xwe îşimakirî  
Kefenê roka ber êvarê bidirû!  
-Pîrka we pîr ji we hez dikir  
Bastêq û benî ji we re dianî  
Li gundikê Semo mast ji we re dimeyand  
Karwanên evînê, ferhenga birînê  
Bi gavên xwe re dikişand  
-Serxet û Binxet ne bû  
Lê belê xalê we di qîçîna tebaxê de  
Bi mayîna hatibû kuştin.  
Di esra teng de  
Dara hinarê digrî  
Hehecîk dişikî  
Serdem dibawîşkin  
Û bîranînên te  
Li hawîrdorî zaroktiyê rûdiniştin.

## AMÛDÊ

Ji bo Seîd Rêzanî

Her sibeh  
Me gulên te yên zikmakî  
Me rêçên û dilpakî  
Bi xunava bêrîkirinê diparast.  
Dergehên bi navnişanên şînê  
Di axîna te de  
Peşkên barana sersar û dîn,  
Û me xewrevîn,  
Bi bîbikên hêviya stewr dialast.  
Em çûn xwê... dara tiwê di tozê de ma,  
Em di sînga te de ji girî lal bûn  
Lê tu mayî zengil  
Û temaşevana dilrast...



## SÎPANO

Ji bo M. Effif

Şev bû...  
Bajarekî bê deng û dev bû  
Canê te bi girî re li hev bû  
Pencereyên bîranînan  
Bi bagera nermînî  
Di dilê te de vedibûn  
Lerza qonaxê di dilovaniya berfê de  
Digevizî.

Û çûkên destê sibê  
Ji çîve çîva pêûsê der dibûn.  
Te dîwarê min yê hilweşayî  
Bi xwe re dilorand.  
Te baz dida  
Te xwe dida  
Ber hilma welêt  
Te bi ewrên evînê  
Barana penaberan dicivand...  
Tu dîterikî  
Tu hildiperikî  
Tu hildiperikî salên revyayî  
Tu dibûyî qublename  
Û rivîna  
Stêrkek nûriyyayî.

Name: Ji xortekî Anitosî

# SUWARÊ HESPÊ KIMÊD

H. KILIÇ

Suwarê hespê kimêd, "klaşînkofa rûsî" bi Smilî ve, ber û pişt bi rextên fişekan ve rapêçayî, lixav di destî da li ser piştê hespî guh nade "fiit" yên şivan û gavana, dajo hespê xwe ji ser gunî û kîvaran ra dibezînc çawa ku dibêjin "lez ke bi lezînc suwaro" û her diçe teniştên hespê xwe rikêb dike, heçku dinya li ber deşt e, berê hespê xwe daye zozana, nabêje evc gir e, dol an nihâl e, dibezînc hespê xwe û guh lê nîn e ka çawa kef bi devê hespê kimêd ketiye, xûhê çawa binzînc wî ter û şil kirîye... Guh nade "firîna" hespê kimêd. Rikêb û qemçî radîbin û dikevin li ser bedena hespê kimêd... Hewayê hûnikî zozana hiş di serê suwar da nehêlaye. Ketiye nav xewn û xiyalên kûr û lêvên wî bi ahengeke folklorîk dilivin...

*"Gelîyê qewalê kûr e, narê hoy narê...  
Gelîyê qewalê kûr e sorgul jê dibarin..."*

Carna jî:

*"Zozan e xweş zozan e meşka min  
Meşka mastê nihan e, kil meşkê..."*

Berê hespê kimêd car li berjêr e ber bi Gelîyê Şine, çep dide ser pira Marûnisê, car badiye gelîyê Qewalê û hildikişê mêrgên el-kîkê... Hespê kimêd germ bûye. Suwarê li ser piştê bi nav û deng e lê êdî ew jî pê naweste... Rikêb an jî qemçî hewce nake... Kimêd hêla xwe girtîye. Wî niha jî berê xwe daye zozanên Mêrgên Sofî...

Gihîşte waran. Bi şêleke şêrane rabû ser paşiyên xwe, carekê û careke dî jî şihî û xwe da ser rîya Derîyê Berana...

Gihîşte gaziya milê û di nişkê da vecini-qi... Lê hespê kimêd xwe şaş nekir... Karwanê koçera xwe da binê rê û rê dan hespê kimêd...

Suwar ji hespê xwe'y piştrast lêvên xwe her dilivîne... Lê deng jê bilind nabe. Suwar jî siyaneta hespê xwe digre. Bezîna hespê kimêd herwekî govendeke li ber "dahol û zirnê" wisa bi "reqs"e... Dilê swar nagire bi dengê xwe'y bilbilî ser ji ahenga bezîna hespê xwe bistîne...

Hesp gihîşte hesûya Derîyê Berana... Bayê zozanên bilind, hênikiya hewa, bêhna kulîlkan û xemla dorberê suwar ji xewn û xi-

yalên wî vicinîqand û hişyar kir... Suwarî li-xav vekêşa û şidand... Hesp têgihîşt û rawesta... Suwar hate xwar. Lixav ji devê hespî vekir û xwe li ber kanîyê vezeland. Hespî serê xwe dirêjî kanîyê kir û têr ava sar vexwar, dil û hinavên xwe hûnik kirin... Suwarî çavên xwe niqandibûn. Bêhneke kurt wisa ma û rabû ser xwe... Lê nêrî ku hespê wî diçêre. Qederekê çavên xwe dane ser çêrîna hespî... Ji hespê xwe hez dikir. Hesp ronahîya çavên wî bû... Bi hespê xwe'y serbilind bû... Girnîjî û rabû ser pîya. Hespê xwe dîsa lixav kir û suwar bû... Rikêb şidandin, lixav du-sê cara vekêşa û hespê kimêd serê xwe bilind kir û hilfirî...

Xweşîya suwarîya hespê kimêd li alfeykê, zîn jî zînekî herî baş bû... Wekî Kewîs Axa gofî "Zînekî Hemedanî" bû. Dîsa wekî Kewîs Axa gofî tenê "Gopalekî Heyzeranî" ji suwarê hespê kimêd î kêm bû...

Gelîyê Berana ma li paš... Hespî niha jî berê xwe daye berjêr û ber bi mila Suwara Xelo ve dibezîne.. Nişîv, mil û hesû beza hespê kimêd sist û rîya wî jî şaş nakin. Ew heçku li ser deşteke bêser û bin dibeze herwisa... Beza wî leyiz e... Serê xwe bilind kirîye û badaye milê rastê... Devê wî bîkêf, pišta wî bixûh e... Lê ne xema wî ye... Bayê hûnikî Suwara Xelo ew hêc kirîye... Rîya xwe dizane... Çawa gihîşte serê mila suwara Xelo bêhemdî suwar xwe bada milê çepê û berjêrî gelîyê Anîtosê bû!.. Kimêd ji riyên çîya û zozanan niha ketibû ser rîya firehe makînan. Kimêd êde nedibezi... Lê rehwanî û bi şêleke esîl ber bi Anîtosê ve xwe livand... Piştî heşt vîrajên tirsbar gihîşte kanîya pišta warên Anîtosîya... Herçendî têhnî jî bû lê xwe negirt û rast çû ber konê suwarê xwe...

Berî suwar dabeze xwarê Nihari ji kon derket û lixavê hespî girt... Suwar dabezi xwarê û çû bin kon û xwe avête ser doşeka rayêxistî... Kebabîyê dewê sar hazir kiribû. Suwarî xwe bi dewê sarî wekî cemedê hûnik kir... Paşê jî xwe veşeland. Klâşînkof û rexîlê xwe ji xwe kirin û danîn ser balgehê rexê

çepê... Xwe dirêj kir û çayek ji kebanîyê xwest... Çaydanê bafonî reş wekî qîrê li ser kuçikî dikelî. Kebabîyê çay dem kir û danî ber malxwê malê...

Nihari hate jor, rûnişte ber serê babê xwe. Dayîka Nihariyê çû zîn û lixav ji hespî kirin û hesp bire ser kanîyê avda û bire dola jêrî kona tewil kir...

Suwarê hespê kimêd, ciwanê dilêr û çelengê Anîtosê Binyamê bû... Binyamê xwe livand û kete ser enîşkê û çaya xwe da ber firên kûr... Hizirî û hizirî... Hizirîneke kûr û dûr... Di vê hizirîna xwe da dîsa çû nav xewn û xiyalên berê, jîyana xortanîya xwe, gerek li salên berê kir.. Guh li westana xwe nebû... Ji nişkê ve pêjnek bi ber guhê wî ket. Xwe kom kir û berê xwe da derveyî kon. Dît ku Sebrî û Şêxmus ber bi konê wî ve tîn. Rabû û şûtika xwe girêda û xwe veşidand... Sebrî û Şêxmus gihîştin ber kon û silav kirin. Binyamî silav wergirt û ew kerem kirine jor... Doşek her rayêxistibûn. Pêşîyê Sebrî û Şêxmus, paşê jî Binyamê rûniştin. Binyamê bangî xanimê kir ku hazirîya xwarinê bike... Lê heta xwarin çêdibû kebanîyê çay dana ber wan...

Sebrî û Şêxmus ne mêhvan bûn. Digel Binyamê gundîyê hev, pismam û birababê hev bûn. Zarokî û xortanîya hersêyan bi hev ra derbaz bibû... Xweşî û nexweşîya, li şîn û şahîya, li eşq û evîna her bi hev ra û mil bi milê hev ve bûn... Dilgel firên çayê suhbeta wan jî kûr bû. Dîyar bû ku behsên berê nûve dikirin û kena wan jî digihîşte jêrî konan... Binyamê axiftin anî ser gera xwe'y îro û çerxa hespê kimêd... Desnê hespê xwe da... Binyamî î ne neheq bû. Hespê wî di wî gelîyê kûr û teng da bi nav û deng bû. Hespê rehwan wekî dikete ser rê xeml û delalî jê dibarî... Bûk li ser pišta hespê kimêd diçûn ber derîyê zava... Dawet bi leyiz û "reqsa" hespê kimêd şatir dibûn... Eve jî tişteki kêk nebû bo Binyamê. Lê belê çu kesê navê hespê kimêd beyî navê Binyamê jî medianî. Binyamê jî suwarekî bi nav û deng bû. Gava behsê hesp an suwar di hate kirin, nav navê Binyamê û hespê wî bû...

Dayika Nihariyê xwarin hazir kir, sifre danî. Helm û bêhna rûnê pez î qijirandî û sor kirî ji ser lalîka savarê bilind dibû û kam radikirin... Dayika Nihariyê goştê berindir jî di sêhlê da sor kiribû; tijî lalîkekê kir û ew jî danî ser sifre... Hersê destebira û hevalên rojên xweşî û nexweşîya digel dewê sar xwarina xwe dane ber kefçiyên bafon... Dayika Nihariyê gazî keça xwe'y delal kir ku xwarinê bidê... Nihari hat û li aliyê dî rûnişte ser xwarinê. Lê dayika Nihariyê ma li hêvîya zelama. Ew, dê paştî rabûna sifra mêra xwarinê bixwe!..

Hersê tolazên zomê têr bibûn û xwe jî sifre dane paş... Çay hazir bû. Sifra xwarinê rabû û sênîya çayê hate ber wan... sebrî berî çayê kisikê xwe yê tûtinê derxist û cigareyk jê pêça, kîsik avête ber Şêxmus. Şêxmus jî cigara xwe pêça û wî jî kîsik avêt ber Binyamê. Binyamê kîsik rakir û wî jî cigareyeke bi dilê xwe pêça û agir vêxist... Dûkela cigarên hersêya bilind bû... Digel cigarê çaya xwe jî didan ber fira. Axiftina xwe jî ne dibirîn... Paşî çay vexwarinê hersiyan axaftina xwe kirin yek ku biçine piştî gund, betena jorî nêzikî serûkanîyê ji xwe ra bigerin...

Gundhiyan giyayên xwe dirûbûn û kiribûn gurz... Gurzên giyayê heşînî bibejin li ber germa tavê zer û hişk bibûn...

Dorberê kaniyê û betena piştî gund bi rêza gurzên giya ve tijî bû... Kanî li quntara çiyayê piştî gund bû û têra gêrana şeş aşa av jê dîza... Ava ji ber kaniyê diçû wekî ava çemekê dola gund tijî dikir û ber bi Geliyê Şine ve diherikî û tevî Çemê Zê dibû... Çi av!.. Aweke zelalî sar mîna cemedî serê çiyayê Reşkoyê li hindava deşta Geverê bû. Xort û zarokên gund çawa xiyarterk davêtin nav kaniyê di deqîqa xwe da xiyar ker dibûn...

Binyamê, Sebrî û Şêxmus xwe bi rext û fişekan rapêçan, klînkofên xwe hilgirtin û bi şêleke ciwanî dabezîne jêrî kona û ber bi gund ve çûn. Car dol bi dol car jî beten û beten dipeyikîn. Xwe ji ser kûngê gunîya û komên kîvara wisa davêtin ku hûnê bêjin ew ne peya, siwarên sê hespên kehêl in... Gundiyên ji gund

berjorî zozanê dibûn jê dipirsîn ku xêr e ewqas bilezin... Binyamê li pêşîyê, qevda klaşinkofa xwe bi destê çepê girtibû û toz ji ber piya bilind dibû. Bi heyecana ciwanîyê tijî, keysê axiftinê nebû ku bersiva gundiya bide...

Ew adeta difirî... Sebrî bersiva gundiyan dida û digot ku ew diçin ser kaniyê...

Sê tolaz û egîdên zozana Anitosê... Binyamê, Sebrî û Şêxmus. Hevalên zarokî, xortî nî û ciwanîyê... Birabêrên hev. Heval û destebirayên xêr û şera, tol û nijdan... Sê ciwanên bejinzirav û bilind mîna tayê spîndarê. Bi firehîya depê sing û zendên badayî û awira çavan wekî pilingên Bîsiyê Emer bûn û agir ji çavên wan dibarî... Sê ciwanên delal ku xemla dawetên Geliyê Anitosê bûn. Dawetên Anitosê bi Binyamê, Sebrî û Şêxmus rengîn û şa bûn... Binyamê şel û şepikên kesnedîtî, Sebrî binefsî û Şêxmus jî piştpez berdikirin. Hersêyan jî lewendiyên xwe li paş zendên destê xwe girêdîdan. Eve wî şêla hersêyan bû. Girêdana şûtik û şaşika wan jî ji yê dî cûda bû. Xwezîya xort û ciwanên Anitosê ew bû ku wekî wan cilan ber bikin, li rêza govendê li milê wan bin... Zirnebêj û daholvan ev sê bizote li kîjan aliyê govendê dîtiban bi wî alî ve diçûn ku şabaşan jê werbigirin... Gava daholvan nêzikî wan dibû Binyamê destê xwe davête ber şûtika xwe, pêncî hezareke şîn derdixist û dirêjî wî dikir û êdî keyf keyfa daholvanî bû. Wî belkî bîst cara çerx dida û dengê şabaşa Binyamê û hevalên wî digihande ser û binê govendê... keça Binyamê Nihari bi vê balkêşana babê xwe gelek şa û serbilind dibû... Carina Nihariyê jî hevalên xwe didan dor xwe û diçû di rêza govendê da destê babê xwe digirt û dileyizî. Nihariyê digel hevalên xwe wekî lewendiyên rengareng berdidan, mîna ala li ser gupika stûnê pêl didan û govend dixemiland...

Binyamê, Sebrî û Şêxmus li betena piştî gund xwe badane milê çepê û bi gavên fireh berê xwe dane berjorî gund û ber bi evrazê kaniye ve lezandin... Çu leza karekî wan nebû. Ev awayê rêveçûna wan ya adetî bû... Hêj ji

zarokî û xortaniya xwe hîni rêveçûna hêl bibûn... Hêlçûn awayê jiyana wan bû... Binyamê li pêşiyê, Sebrî di dûv û Şêxmus ji li dawiyê gihîştin newala beri kaniyê. Qederekê bi newalê ve berjor çûn...

Hilketin gaza hindava deravê kaniyê û her li ser piya bêhna xwe vedan... Ji ser sekinîna wan sanîyek derbaz nebibû ku bi dengekî bilindî hişk li paş xwe zivirîn... Çi bibînin!.. Garaneke "eskeran" mîna seyên betilî, zimanê wan tevî giliz ji devên wan derketî bi newalê ve hildikişin... "Dur" hey "Dur" a wan e. Anku "rawestin"! Digel dîtina vê revda seyan, Binyamê û Sebrî hîlfirîne jêrî gazê û bi bayê bezê xwe berdane dola ku ava kaniyê pêda diherikî... Hêj negihîştine deravê avê xwe avêtin pişt kevîreki mezin û ketine çeper beramberî eskeran...

Şêxmus di wê hereşê da, bi milê dî ye gazê da bazda û piştî qederek bezîne kete nav çembera esl era... Hêj keyse teqandina klaşinkofa xwe nedîtî kete nav destên wan. Eskeran bi kulm û quntaxên sîleha Şêxmus her di wê bêhnê da bêhiş kirin û bi erdê ra rakêşan... Revdeke dî ya eskera belavî dorberê bûn û ser û binê dole girtin... G3 û M5-ên eskera axiftin, agir li ser serê Binyamê û Sebrî barandin. Binyamê û Sebrî keysek peyda kir û klaşinkofên xwe dirêjî wan kirin û çeperên eskera reşandin... Gurmîna klaşinkof û G3-an deng li gelîyê Anîtosê veda... Binyamê û Sebrî çeper li dûv çeperî vediguhestin û jarjor vala û tijî dikirin. Vê herxwedanê qederek ajot. Esker bi van şeremêra nedwestîyan, kelex li ser kelex zêde dikirin...

Efserên wan zanîn ku pê nawestin, neçar bi bêsîmê pişt xwestin ji xwe ra... Dengê helikoptera cengî Gelîyê Anîtosê tijî kir û ber bi xuntara çiyayê Anîtosê ve xwe bada û hate hindava dola kaniyê û çerixand... Eskeran jî reşandina xwe didomand... Sekinîna Binyamê û Sebrî jî nebû. Lê mîrata rextên egîdan her bi xilasbûnê bûn... Lûliya Kilaşinkofa germ bibû û çembera li dor wan jî her diçû teng dibû... Helikopterê çeperê van herdu egîda keşif kir û

da ber bomba... Dola ku herdu tê da çeper ketî bibû nîşangeha bombên helikopterê... Digel bomba, reşandina G3-an keys nedida ku Binyamê û Sebrî êdî ji cihê xwe bilivin... Lê belê derdê eskera ne ew bû ku wan bi saxî bigrin. Dixwestin bikujin û tola kuştîyên xwe hilbigrin... Çembera agirê bomba û fişeka, Binyamê û Sebrî bi timamî tengav kirin... Lê belê, Binyamê û Sebrî sond xwarin ku bi saxî nekevin destê wan... Jarjora dawîyê jî li ser serê vê revda seyan vala kirin... Hêj jarjora dawîyê xilas nebûy bomba helikoptera malxirab toz û agir ji çeperê Binyamê rakir...

Deng jê nehat. Dengê vî şeremêrî hatibû birîn... Yek.. yeke dî lê fişekên Sebrî jî xilas bûn... Deng ji çeperê wî jî nehat... M5-a xafî leşê Sebrî kiribû serad... Revda eskera gihîşte ser cendekên sar. Lê bitirs... Li erdê G3-ên xwe li ser leşên wan dîsa vala kirin... Ji alîyekê ve jî gurzên giya kom kirin û li ser cendekên Binyamê û Sebrî lod çêkirin û agir berdane...

Agirê giya gur nebû. Dûkeleke tarî jê bilind bû... Helikopterê bersiva xwe girt, çerxek li gelî da, ji ser zozana Anîtosîya bilindî mila Suwara Xelo bû û xwe bada ser esmanê çiyayê Kato û ji ber çavan berze bû, çû...

Şer û qiyameta gelî deng li zozanê vedabû lê ma Anîtosîya dikarî çî bikin!

Agir bi giya neket her dûkel bilind bû. Gurzên bi destên Binyamê û Sebrî hatine çêkirin jî bixem bûn. Agirê xwe gur nekirin... Li wan jî şîn bû... Wekî cilên reş û tarî li xwe kirî wan jî tenê dûkeleke reş û tarî ji xwe bilind kir!..

Eskerên mayî Şêxmusê bêhiş bi dûv xwe ra rakîşandin heta ser rîya gund... Qederekê li wê derê man. Dengê cemsên eskerî deng li gelî veda û ber bi Anîtosê ve hilkişîyan... Gihîştin cihê eskera û derîyên xwe vekirin. Komando yek bi yek dabezîn ji cems û dorberê gund girtin... Li alîyê dî jî eskera kuştîyên xwe tijî cems kirin...

Şêxmus jî avêtin nav kuştîyên xwe. Bêhna

wî dihat diçû... Lê î bêhiş bû... Cemse ber bi Geliyê Şine ve bi rê ketin... Bi dengê cemsê Geliyê Anîtosê dîsa deng veda û dilê bi kul û keser yê Şêxmus bi tamamî sekinî...

Girîn û girîn... Geliyê Anîtosê bi girîn û nalîna deng veda vê carê... Li zomê li ber kuçikê Binyamê, Sebrî û Şêxmus agirên gur veketin... Lê mixabin, qazan û beroş germ nebûn xwarin nekelfî, çayê dem negirt... Şîn bû... Nihari digirî... Dayîka Nihariyê ax û xwelî li serê xwe dikir... Girîneke dilsoj... Agir bi dilê gundiyan ketibû... Hemû bixem û şîn bûn...

Mêr ref ref daketin gund... Belavî betenên gund bûn li cendekên xweşmêrên xwe gerîyan.. Ber bi betena kanîyê ve çûn.. Li piştê kevirê mezîna rasî gola xwûnê hatin. Bêhna egîdan jê diçû. Gundî, dil bixem li dor xwe dizivirîn... Li wêdatir piyek dîtîn.. Piyek ji ber çok qetyayî... Hêj jî xwûn jê diçû... Kurê Binyamê Hacı, çawa çav bi gora nexşîna bask dirêj ketin ew pê nas kir û bi qerîn xwe avête ser... Ew pê, piyê babê wî bû... Gundiyan pê rakirin bi cemedaniyekê pêçan û berjorî kanîyê bûn...

Li dola jêrî kanîyê dûkela gurzên giya êdî kêr bibû... Bêhneke têvel bi ker kepê gundiyan ket... Gundî hindî nêzîkî dûkelê bûn bêhn girantir bû.. Hatin li dor xwelîya giyayê sofî kom bûn... Ji ber bêhna goşt û hesîyên sofî nikarî nêzîkî xwelîye bibin... Baş têgihîştin ku sê egîdên wan neku tenê hatine kuştin, wisa jî hatine sotin... bi meşk û sîtilan av kêşan bi girê xwelîya giya da rijandin û li aliyê dî jî bi mer, şene û milhêba xwelî vedane alî... Çi bibînin!.. Du cendekên mirova bûne girê rejûyê... Li yê sêyemîn geryan.. Nedîtîn... Cihê agir bi avê baş şuştin, cendek rakêşan derxistin û birin danîn ser fêrşên rexê kanîyê... Dîsa av bi cendeka da kirin, şuştin veşuştin û li darbesta kirin û birin danîn hewşa mizgefta gund...

Gundiya zanîn ku yek ji mirîya Binyamê ye. Ji ber ku piyê wî jî ber bomba helikopterê jê bibû û eskera ew jî bîr kiribûn ku bisojin...

Lê yê duyemîn gelo Sebrî ye an Şêxmus e... Gundî dudil bûn... Bi derengî ve cab hat ku mirîyê Şêxmus jî avêtine deriyê nexweşxana Hekariyê... Hate zanîn ku Sebrî jî digel Binyamê hatîye sotin... Refa jin û zaroka jî ji zoma binê mila Suwara Xelo ber bi gund ve bi rê ketibû... Girîna wan li geliyê Anîtosê deng vedida... Şîna Anîtosîya gelî tîj kiribû...

Nihariya Binyamê çend qalikên fişeka ji xwe ra kom kirin... Bi lewendîya milê çepê pêçan û digel dayîka xwe ber bi goristanê ve çûn.. Gundîya gor hazir kiribûn... Darbesta şehîdên xwe anîn.. Piyê binyamê li ser fêrşê hewşa mizgeftê şuştibûn û danîbûn ser cendekê û kefen kiribûn.. Lê kîjan cendekî, nedizani... Ma dê ji kû zanîban... Piyekî nesofî lê du mirovên sofî û bûyne girê rejûyê. Ne serî, ne pê, ne jî dest xûya ye... Tiştî xûyayî piyê Binyamê bû...

Piyê Binyamê an li ser xwedîyê xwe an jî li ser sinê Sebrî binax bû.. Merek rabû yek ket. Girê axê li ser piyê nesofîyê Binyamê û li ser singê du egîdên sofî zêde bû, bilind bû, bû deh û bîst bihûst... Li ser û binê gorên şehîdan du kêl vedan...

Gundî ref ref ber bi gund û paşê jî ber bi evrazê zomê ve bi rê ketin.. Nihari ma li dawîyê... Qederekê ma li ser herdu goran... Lê nedizani kîjan gor ya babê wê ye. Paşê gavek ber bi milê çepê ve hat û li ser gora ku "pê" tê da hatîye veşartin sekinî. Li dora xwe nêrî.. Kevirkekî piçûkî sor dît, hilgirt anî û danî ser gora babê xwe Berê xwe da ber bi kanîyê ve. Gora babê wê li milê çepê bû... Nihariyê nişana xwe danî: Ber bi kanîyê ve li milê çepê û kevirkekî sor li ser!.. Ev nişan têra dike ku seredanîya gora babê xwe bike. xwe êdî şaş nake. Çend bête ser gora babê xwe; dê berê xwe bide kanîyê; li milê çepê û kevirkekî sor li ser. Ev e gora babê wê... Nihariya bixem, kul û keser niha şa bû. Gora babê xwe nas kir... Bezî, gihişte dayîka xwe, destê wê girt û givaşt... Gundî pêk ve ber bi zomê ve hilkişîyan.. Bixem bûn. Ne axiftin, ne deng... Ker û kip.. Gihiştin konên xwe. Herwisa bêdeng verevîn

malên xwe... Agirên kuçika vêketin, gur bûn lê belê tişteke li ser ne kelî, germ nebû... Nihari rûnişte ber agirê kuçikî û hizirî... Car digirî, carina jî di dilê xwe da şa dibû. Gora babê xwe nas kiribû. Nîşanên wê li bîra wê bûn. Ji bîr ne dikirin...

Pişti van hizirîna Nihariyê lewendîya xwe vekir. Qalikên fişekan yên komkirî hilgirtin destê xwe. Vî alî, lê nêrî û paşê jî pateyek ji dayîka xwe xwest û ew tê de pêçan û veşartin.. Kelegirî bû û paşê jî ji nişkê ve girnijî, rûkenî bû... Dîsa kete nav hizirîneke kûr. Lê di dilê xwe da dîsa şa bû: Hem gora babê xwe hem jî yên ku babê wê kuştî nas kiribûn.. Sond xwar ku bi van bîr û hizra mezin bibe... Nihari li ber agirê kuçikî bi xew ket, dayîka wê ew bir û li cihê wê nivand...

Bû spêde.. Nihari rabû... Qederckê ma di nav nivînan da... Paşê rabû û çû hespê kimêd ji tewlê anî ber kon û girêda... Çû zîn û lixav anîn. Lê belê nikari hespî veşidîne. Hesp rabû ser paşiyên xwe, hefsarê xwe veqedand, sê cara şihî û ber bi evrazê mila Suwara Xelo ve bezî... Gihîşte milê û bada ber bi çiyayê Kato ve û xwe da ser rîya Deriyê Berana... Hate ser

kaniya Deriyê Berana, çerxek li xwe da têt av vexwar, sê cara şihî û wekî birûskê berjêrî zozanên Mêrgên Sofî bû, dakete baskê Meydan Zengilê, berjêrî mêrg û zozanên Elkikê bû û xwe livande gelfiyê Qewalê, hate ser pira Marûnisê û kete ser rîya makinê, serê xwe bilind kir û bi şêleke esîl û bezeke rehwanî berjorî gelfiyê Anîtosê bû...

Gelî bi gelî, dol bi dol û hate ser kaniya gund, serê xwe çemande kaniyê xwe têt av kir û ber bi goristana gund ve bezî.. Hate ser gora Binyamê, rabû ser paşiyên xwe, bi destan erd vekola, careke dî rabû ser paşiyên xwe û dîsa sê cara şihî.. Kef bi devî ketibû, xûh pê da dirijîya.. Çerxek li dora goristanê da û ber bi zozanê ve bezî... Hat û li ber konê Binyamê sekinî.. Nihari çûbû digel hevalên xwe dileyizî... Hesp qederckê ma li ber kon, Paşê dayîka Nihariyê ew bire jêrî kona û tewil kir...

Nihari hem gora babê xwe hem jî yên ku babê wê kuştine nas dîke.. Nihari bi van bîr û hizra mezin dibe.

Tîrmeh 1989

# ÇÎROKA SÊZDEH ŞEV Û SÊZDEH ROJAN

---

Arjen ARÎ

Di binê lingan de êşa behran  
Di binê lingan de  
Agirê hêtûnan...

Janê  
Dida kezebê,  
Diqîçiqîçî,  
û laş  
Çar alî  
Diricifî...

êş  
di binê lingan de...

Êş di nava destan de  
Êş,  
Darekî berû,  
Sor-sor  
Bi girêk...

Sor-sor  
Bi girêk  
Destbivirek  
Li binê lingan diket...

Da jan  
Bide kezebê

jan,  
di kezebê de êş.



Du lep koçanîk  
Wek du lep ji heriya nahletê  
Hişk  
Bi bîna xwêdanê stirayî,  
Du lep koçanîk  
Li ber herdu çavan.

Û çav  
Di reşayê de,  
Laş bi çavan re di odeyekê de  
Ji reşayê xerîbtir  
çav  
di odeyekê de girtî.

Çend roj çûn,  
Çend şev?  
Çend roj û şev  
Bi wî halfî;  
Çav girtî  
Dest girêdayî.

Çend roj çûn  
Çend şev,  
Di nava dafan de  
Bi xeber  
Û kufîrî...  
laş  
di nava daran de.

Ew çi lerizîn bû?  
Ew çi rebenî?  
Di nav destên asaqdarên de  
Ew çi hal bû?  
laş  
bi beştan ve daliqandî.

Goşt û dar  
Tişteki nabêjin ji hev re  
Li ser wê betona sar,  
Di wê reşayê de,  
Lingê teqiyayî  
Destên werimî,  
Dece....  
De gidî...

goşt  
di binê daran de.

Li ber xwe da  
Ne ser da  
Ne jî sir.

Li ber xwe da  
Sêzdeh şevû  
Û sêzdeh roja  
şev  
di binê rojan de...

Li ber tiştêkî nakevim  
Ne lingên teqiyayî tên bîra min,  
Ne jî destên werimî.  
Lê,  
Dikin zingînî di gruhên min de  
Ew xeber  
Ew galgalên bê rê...  
U sor-sor  
darê berû...

Tu ji kîjan dara xayin  
Ji kîjan çiyayî  
Tu gihîşt vir  
Kîjan êzingkerê ehmaq  
Tu kire destbivir,  
Û tu ket wan destan?  
dar  
di destên asaqdaran de.

Bîna çilo  
Êdi bi min nexweş e,  
Û tahma berûwa  
Bi min jahr e  
Piştî wan derbên bê îzbat  
Ji ku em li hevdu tên!  
Girê Mîra  
Gundek bû.

1982 - 83  
Nisêbînê

# TEYRIKÊ ÇEMÊ XERZAN

## Firat CEWERÎ

**B**i fikira ku wê dema zarokî û xortaniya Mahmûd Baksî ji bo xwendevanên me balkêş be, ez dixwazim em gotûbêja xwe ji wê demê vekin.

- Ez heya heft saliya xwe li gundekî Xerzan dimam. Weke pîr zarokan, min jî ji heywanan hez dikir, nemaze ji cewrikan... Şeş heft cewrikên min hebûn. Min ji her tiştî bêtir ji wan hez dikir. Hema bêje, min bi wan re dixwar, ez bi wan re radizam. Di zaroktiya xwe de, gorî ku mezin dibêjin, ez zarokekî şûm bûm. Ez ne zarokekî mulahîm bûm. Pîr caran min û zarokên gundiyan li hev dixist, me serê hevdu dişikand. Ji ber ku kalikê min axayê gund bû, gelek caran zarokan newêribûn bela xwe dimin bidana. Zarokên mezin ji tirsan xwe di bin min de davêtin erdê. Wan karîbûn li min xistana, lê li min nedixistin. Qaweta wan hebû, lê qaweta wan nedigihîste min. Di heft saliya min de me gundê xwe terk kir, bavê min berê me da bajarê Bismilê. Bavê min nedixwest em jî wek xalê xwe, kalikê xwe, bapîrê xwe feodal bimînin, di bin teşîra dîn de bimînin. Min di sala 1952'an de li Bismilê dest bi dibistanê kir. Cara pêşî, wê çaxê ez têgihîştim, ku zimanekî min yê taybetî heye. Li dibistanê Kurdî qedexe bû. Rojên pêşî ez di sinifê de şaş û ecêbmayî mabûm, min şok derbaskiribû. Ne mamosta min ji min fêhm dikir, ne min ji wê

fêhm dikir. Loma jî wê bi xetkêş û şîmagan li min dixist. Min hezkirina xwe ya zimanê Kurdî ji zulma wê girt. Min fêhm kiribû ku ez ne yek ji wan im. Paşê dîsan me bar kir, em çûne Bîtlîsê. Min li wir dibistana destpêk xelas kir. Piştî wê ez çûme Ergeniyê, dibistana mamos-tetiyê. Di salên 63'an êdî ez xortekî nûgihîştî, 18-19 salî bûm. Min çavên xwe ne tenê li pirtûk û rojnameyan, lê her weha min çavên xwe li keçikan jî digerland. Kêfa min gelekî ji Diyarbekirê û ji keçikên Diyarbekirê re dihat. Bîranînen Diyarbekirê li ba min zahf in. Di gel wê germa Diyarbekirê a dijwar, gava mirov li kuçe û kolanên bajêr çav li keçikekê diket û li hev dinihêrî, ew germa Diyarbekirê bi carekê ve sar dibû, dilê mirov hênik dibû.

Di salên 63-65'an ne bi xêr û ni bi ahlen, me çû ji Tirkan re eskerî kir, li wir jî me têr lêdana xwe xwar. An wê bigotana, zimanê te ne baş e, an wê bigotana tîpa te ne wek tîpa me ye... Bi kurtebirî ez bi ku de biçûma, bela min bi min re bû. Bela min jî zimanê min bû, zimanê min jî kurmanciya min bû... Piştî ku min eskerî xelas kir, di sala 1966'an de li Batmanê rojnameyek derdiket. Ew rojname ji heftê carekê bi navê "Batman Gazetesi" derdiket. Cara pêşî min di quncika wê rojnameyê de nivîsand. Wê çaxê, bayê sosyafîzmê jî li ba me pêl dibû, min jî xwe jê nehişt û bûme sosyafîst. Êdî li der û dora me çiqas axa, beg û



*M. Baksî û F. Cewerî*

şêx hebûna, min ê tep û rep li dijî wan binivîsanda. Ew jî li gorî wê demê tişteki mantiqî bû. Ger min wê demê li dijî pepûkên karkeran binivîsanda, wê kesî ji min re negota, eferim. Min bela xwe di yên herî qerase dida. Sala 1968'an ez li Batmanê bûm serokê TÎP ê. Di eynî salê de jî ez bûm kandîdatê reîsê belediyê.

Lê ji ber ku emrê min biçûk bû wan destûr nedan ku ez bibim reîsê belediyê. Paşê min berê xwe da Stenbolê. Cara pêşî di sala 69'an de romana min ya bi navê "Mezra Botan" li Stenbolê derket. Roman bi Tirkî bû lê li ser rewşa Kurdan bû. Di salên 70'ê de jî pirtûkeke min a din derket. Ew pirtûka min li ser rewşên bîrekî Tirk, bi navê "Şadî Alkılıç Davası" derket. Gava ew herdu pirtûkên min derketin, di derheqa min jî 141-142 mehkeme vebû. Ji ber hevpeyvîna min a bi Mihri Belfî re jî dîsan mehkeme vebû. Min di pîrr konfernas û ci-

vînên xwe de jî doza kurdîyetiyê dikir. Danûstandiyên min bi DDKO re pîrr xurt bû. Di navbera 68-70 ê de ez di DISK'ê de sendîkacî bûm. Ji ber ku ez bi karkerên endamên DISK'ê re bi Kurdî dipeyvîm, Kemal Türkler îfada min stend û ez ji kar avêtim. Ji aliyekî wan ez ji kar avêtim, ji aliyekî jî rîsk-kek mezin hebû ku wan ez tewqîf bikirama. 26'ê Tebaxa 1970 min xwe bi paseporteke sixte, bi otomobîla hevalekî avête Almanya. Ez yanzdeh mehên gurover li Almanya mam û ez di 25'ê Gulana 71'ê hatime Swêdê. Ew roj eee, ev roj e ew keçika delal ya li Diyarbekir, ku min pîrr jê hez dikir, li wir, di bin germa Diyarbekirê de ma, ez jî li vir ketime binê sifirê, yanî di bin serma Swêdê de mame.

- Gelo ji derketina derveyî welêt wêdetir tu riyên din tune bûn? Te nikarî bû nivîskariya xwe li welêt bidomanda?

- Ji xwe ez hê di salên 68'an de ji welatê

xwe hatibûm bi dûrxistin. Ez li Stembolê bi cih bûbûm. Stembol ne welatê min e. Li ba min ferqa Stembol û Atîna, ferqa Stembol û Stockholmê tune ye. Yanî îmkanên min ku ez bi karîbûma vegeriya Batmanê, Sêrtê an jî Diyarbekirê bimama, bijiyama tunebû. Baş bîne bîra xwe, ez di 68'an de serokê TIP'ê me, min xwe sosyalîst îlan kiriye xelkê wê çaxê bi ayet û quranan newêrbûn xwe nêzîkî van mirovan bikirana, a din jî çiqas Kurdperestên wê çaxê hebûn, danûstandina min bi wan hemûyan re hebû. Ji ber wê yekê jî çavên MIT'ê jî her tim li min bûn û dixwestin min winda bikin. A din jî romana min, "Mezra Botan" erê bi Tirkî bû, lê hemû li ser Kurdistan bû. Vê yekê jî gelek bala MIT'ê (Istixbarata Tirkiyê di kîşanda). Sê rê hebûn; an ez ê bihatama girtin, di hepsan de biriziyama, an ez ê ji aliyê MIT'ê ve bihatama kuştin, an jî min ê welatê xwe terk bikira. Min ev rîya sisiya ji xwe re hilbijart û ez derketim derveyî welêt, ez hatim Ewrûpa. Ji aliyekî jî derketina min

ya Ewrûpa gelekî baş bû. Bi rastî hewcedariya Kurdistan bi dîplomasi û naskirina Ewrûpa heye.

- Xuya ye ew roj ev roj e tu venegeriyayî welêt.

- Erê, ew roj ev roj e ez venegeriya me Kurdistanê.

- Di civîn û civatan de, di şahî û dîlanan de, di sohbetan de, gava behsa welêt, behsa zozan û çiyayên welêt, behsa xweşiya welêt dibê, tu axînen kûr ji dil dikişîn; di awirên te yên melûl de mirov hesret û hezkirina salan dibîne. Gelo tu çima riyekê nabînî û naçî vî welatê ku tu evqas jê hez dikî?

- Min digot ez ê di jiyana xwe de keçika Diyarbekirî, ya Fatîh Paşayê ji bîr nekim. Min digot, ger ez bi wê keçikê re nezewicim û ez rojekê wê winda bikim, ez ê xwe bikujim. Ne mumkun e, ku ez bê wê bikaribim bijîm. Lê mixabin, piştî salekê du salan min ew keçik ji



*M. Baksî û F. Cewerî*



*M. Baksî û F. Cewerî*

bîr kir. Ez wilo bawer im, ku wê jî niha ez jî bîr kirime. Piştî wê, min digot, xwedê neke bavê min bimire, diya min bimire, êdî jiyana ji min re namîne, ew ê jiyana li min bibe zîndan. Ne mumkun e, ku ez bikaribim bê dê û bavê xwe jiyaneke bidomînim. Dê, lo! Nexasim dê! Ew dayika ku mirov mezin kiriye. Ew dayika ku mirov di her şerd û şurûdan, di her perîşanî û belengaziyê de, di ber pêşîra xwe de mezin kiriye. Di sala 1986'an de bav çû, di 88'an de jî dê çû. Lê helbet mirov dê û bavê xwe ji bîr nake, ew tiştêkî din e, lê ez gihîştîme wê qe-neetê, ku evîna welêt di ser hemû evînan re ye. Ji ber vê yekê jî gava behsa Kurdistanê dibê, ez axînen kûr dikişînim. Ji ber ku ev bîst û du sal in, ku ez nikarim herim welatê xwe. Lê ez dikarim vê bibêjim, ku ez rojekê jî Kurdistanê ji bîr nakim. Ez bawer nakim, ku ew însanên Kurdistanê ên dilpak, ew zozan û çiyayên wê jî min ji bîr bikin. Yanî sax, an jî mirî, muheqeq ez ê rojekê vegerim wan diya-

ran.

- Ev demek dirêj e, ku tu li xerîbiyê yî, tu ji welatê xwe dûr e. Jiyana xerîbiyê carinan mirov dike dilê hin tiştan, hin adetên kevin yên mirov bi mirov dide ji bîr kirin û mirov hînî hin tiştên nû dike. Gelo tu di van salên xwe yên xerîbiyê de hînî çî bû û te çiyê xwe ji bîr kir?

- Berî her tiştî hurmet û hîsên însanî li ba min kêm bûn, qels bûn. Min li Kurdistanê jî însanan gelek hez dikir. Ew hîsên min li vir hebekî qels bûn, zeyif bûn. Ya dudan, ji bo ku ez aşimîle nebim, wînda nebim, ji bo ku tu car Kurdistan jî serê min û ji dilê min dernekeve, heta ji min hatiye ez weke kurmancekî jiya me. Pîraniya Ewrûpiyan û hevalên min dibêjin: "malxerabo, ev bîst û du salên te ne ku tu li Ewrûpa yî, hîna jî mirov dibêje, qey tu a niha ji çayxaneyêke Batmanê derketiye û hatiye". Ji ber ku ez ji jiyana xwe ya Kurdî

hez dikim. Ez ne bi wê niyeta ku ez bibim Swêdî ez hatime Swêdê. Na, ez bi wê niyetê hatime, ku ez rojekê zûtir şerdên Kurdistanê bidime guhertin, bila para min jî tê de hebe û ez paşê vegerim welatê xwe. Lê vê yeka ha dirêj ajot, dîsan jî ez ê her vegerim. Hê stiranên min, çîrokên min, romanên min ji bo keç û xortên Kurdan hene.

- Wek hin xwendavên me jî pê dizanin û weke ku te jî niha behs kir, nivîskariya te digihîje dîrokek kevin. Te di salên xwe yên xortaniyê de romanek bi Tirkî, lê li ser Kurdan nivîsand. Bîska din te hezkirina xwe ya makzimanî anî ziman. Gelo ji bo çi te romana xwe bi zimanê dayika xwe, bi Kurdî nenivîsand? Sedeme çi bû?

- Yek, sedem ew bû ku min nikarîbû biniwîsanda, ne ku min nikarîbû, min nizanîbû... Dido di şerdên 68'an de ez bawer im ku min binivîsanda jî wê tu çapxaneyan nexwestina çap bikin. Sisê, min alfabe Kurdî nizanîbû. Bê alfabe û bê gramafîk jî bi rastî zehmet e, ku mirov romanekê binivîsîne. Lê ez bi Kurdî fikirî me û min ew bi Tirkî nivîsandiye.

- Weke tê dîtin ev salên te yê li biyanîstanê gelek bi ber û aktîv buhurî ne. Nivîskariya te li Swêd xurttir û geştir bû, tu zû ket nav civata Swêdiyan, te welatê wan zû nas kir, te welatê xwe bi wan da naskirin te di kovar û rojnameyên wan de dinivîsand, te bi zimanê wan pirtûk derxistin, nivîsên te di dibistanên wan de bûn dersên şagirtên wan. Çawa dibe, ku Kurdek ji civatek ewqas pašmedayî were civateke weke Swêd, ku yek ji civatên cihanê ya herî pêşketî ye, û di vê civata han de ewqas bilind bibe?

- Ez bawer im ev merseleke baweriyê ye. Pirtûk hene tînan van welatên Ewropaya, dixine serê xwe, dibêjin, em ê bibin milyoner, bibin jî... Henek hene, tînan dibêjin, em ê bibin muhendîz, dibin jî... Henek hene, dibêjin em ê bibin dokto, dibin jî. Ê min jî gava ez hatim Swêd, min got, çi dibe bila bibe, ez ê nivîskariya xwe bidomînim. Gava bi zimanê Swêdiyan pirtûkên min derketin, di antolo-

jiyên wan de nivîsên min derketin, min di rojnameyên wan de nivîsand, min tu caran eslê xwe înkâr nekir. Min tu caran jî wan re negotiye, va ez êdî bûme Swêdî, ez ne Kurd im, min weke Swêdî xebûl bikin. Ez vê jî bo çi dibêjim, li Kurdistana Tirkiyê, mixabin hin nivîskarên Kurd jî ber ku bi Tirkî nivîsandine û di nav civata Tirkan de hatine naskirin, ew eslê xwe winda dikin. Ê min, min ev bêşerefiya ha li Swêd nekir. Ez heya niha li Swêdê weke Kurdekî xebitî me û min weke Kurdekî xwe bi vê civata Swêdê daye xebûl kirin. Ji xwe Swêdî jî ne weke Tirkan bûn, wan ez bi nasnameya min ya Kurdî qebûl kirim. Min li vê civata Swêdiyan bi azadî nivîsandiye.

- Mahmûd Baksî carinan bi pîrhêliya xwe Hasse Alfredssonê Swêdî tîne bîra mirov. Tu ne tenê nivîskar, tu herweha rejîsor, komediyên û stiranbêj e jî. Gav tu di şevên Kurdan û Swêdiyan de spîkeriyê dikî, tu guhdar û temaşevanan jî ken lal dikî. Herweha tu bi stiranên xwe û bi dengê xwe yê zîz jî mirov dajo kûraniya hesret û evîne. Niha jî tu haziriya li darxistina radyoyeke Kurdî dîke. Ji bo çi tu pêwîstiya vê pîrhêliyê dibînî?

- A rastî ger spîkerê me hebûna, min ê spîkerî nekira. Rejîsorê me hebûna, min ê rejîsorî nekira. Stiranbêjê me yê baş hebûna, min ê stiranbêjî nekira. Lê ez çi bikim, ez dixwazim binivîsinim, aliyê din vala dimîne. Ez xwe davêjim yê din, ê din nivco dimîne. Gava ez van karan hemûyan bi hev re dikim, hemû jî nivco dimînin. Romannivîskariya min nivco dimîne, stiranbêjiya min nivco dimîne, ez jî birayê xwe re bêjim, gava ez derdikevim spîkeriyê dikim, henehan dikim, erê ez xelkê dikenînim, lê dilê min bi xwe ne şa ye. Ev karên ha divê hemû bi profesyonelî bêne kirin. Ê me jî ger dewleteke me hebûna, wê di van şaxan de mirovên me derketina û karên xwe bi jîrî bibirana serî. A din jî ev karakterên ku te behs kirin, hemû jî di gelê Kurd de hene. Kurd jî stiranên hez dikin, ji ken û qerfan hez dikin. Ji tinazan hez dikin. Jiyana gelê Kurd bi xwe tiyatroye. Yanî bala xwe bidiyê, kîjan Kurd di-

be bila bime, xwarina wî, vexwarina wî, son-  
da wî, rabûn û rûniştina wî, çûyin û hatina wî  
bi xwe tiyatroye. Ev yeka ha jî weke hemû  
Kurdan ji bo min jî tabî ye. Lê bi xêr ku Kur-  
distan çê bibe, wê çaxê kesek pênc-şeş karan  
bi hev re nake.

- Wek pîrraniya xwendevanên me jî pê di-  
zanin, ku tu bi sê zimanan dinivîsinî. Gava tu  
li Tirkîyê bû, te bi Tirkî dinivîsand, piştî ku tu  
hafî Swêd jî te dest bi nivîsandina Swêdî û  
Kurdî kir. Gelo te kîjan salê dest bi nivîsandî-  
na Kurdî kir?

- Gava ez di sala 1970'ê de hatime Berlînê,  
cara pêşî min pirtûkên Kurdî dîtin, min alfa-  
beya Kurdî dît, min makaleyên ku bi zimanê  
Kurdî hatibûne nivîsandin dîtin. Wê yeka han  
tavilê tesîr li min kir. Lê mixabin, ji bo ku ez  
hînî Kurdî bibûma, wext girt. Ya dudan, min  
nikarîbû mersela Kurdan bi Kurdî bi  
Swêdiyan bidim naskirin. Min xistibû serê  
xwe, min gotibû, ez ê pêşî du sê pirtûkan bi  
Swêdî binivîsim, ji bo ku ez xwe bi Swêdiyan  
bidim qebûlkin, paşê jî ez ê dest pê bikim û  
bi zimanê xwe binivîsim, da ku ew alîkariya  
çapkirina pirtûkên min bikin. Wisan jî bû. Di  
77'an de gava min pirtûka xwe ya bi navê "Ih-  
sans Barn" bi Swêdî nivîsand, rojekê wezaret  
kulturfî telefonî min kir, got, te ji bo zarokan  
"Ihsans Barn" nivîsandîye, pirtûkek gelek baş  
e, gelo tu nikarî ji bo zarokên Kurdan jî bi  
Kurdî binivîsinî? Di dibistanên me de zarokên  
Kudan hene, lê bê pirtûk in. Ji aliyekî ve ge-  
lek kêfa min hat, ji aliyekî ve jî ez hebekî tîr-  
siyam. Ji ber ku heta wê çaxê min tu tişt bi  
Kurdî nenivîsandibû. Ez hebekî fikirîm, paşê  
min ji wan re telefon kir, min got, baş e, ez ê  
binivîsim. Camêra heqê nivîsandina wê jî  
dane min. Ez jî rûniştim û min ew nivîsand.  
Min paşê ew nîşanî hin zimanzanên Kurdan  
da, Xwedê ji wan razî be, alîkariya min kirin,  
zimanê min rast kirin. Ez serê te neêşînim,  
pirtûka min a pêşî bi Kurdî "Zarokên Ihsan" û  
a dudan jî "Keça Kurd Zozan" pêşî bi Swêdî û  
dû re jî bi Kurdî derket. Di 83'an de min ro-  
manek bi navê "Hêlin" ji bo xortan nivîsand.  
Ew romana min jî pêşî bi Swêdî derket, paşê

jî di 84'an de bi Kurdî derket. Û wek tu zane,  
di 89'an de jî romana man "Gundikê Don" bi  
Kurdî derket. Heta niha çar pirtûkên min bi  
Kurdî derketine.

- Pirtûkên te yên pêşî ku bi Kurdî derketin  
li ser zarokan bûn. Ji bo çî te hewcedariya ni-  
vîsandina li ser zarokan dît?

- Du sebeb hebûn. Yek jê pirtûkên zarokan  
li Swêd dihatin xwendin, a dudan jî min  
xwest, ez jiyana zarokên Kurdan bi Swêdiyan  
bidime naskirin. Sisê jî, ji bo ku zarokên Kur-  
dan di dibistanên Swêdiyan de stûxwar nemî-  
nin, ew jî bibin xwedî pirtûk...

- Pirtûka te ya dawî jî romaneke bi navê  
"Gundikê Dono" ye. Di Gundikê Dono de mi-  
rov sosya ekonomiya Kurdistanê dibîne. Mi-  
rov hem gelek bermayên feodalîzmê, hem jî  
têkiliyên kapîtalîzmê dibîne. Lê bi gotina te,  
te ev roman li ser kalikê xwe nivîsandîye. Ge-  
lo mirov kare bêje, ku ev romana te perçeyek  
ji rewşa Kurdistanê ya aborî û siyasî ye?

- Erê, rast e, Gundikê Dono gundek e, li  
ber qiraxa çemê Xerzan hatiye avakirin. Ew  
gundekî kevin e. Gundikê Dono niha jî bi  
mulkuyeta xwe yê mala kalikê min Hecî  
Husên e. Min xwest ez di şexsiyeta Hecî  
Husên de axa û gundiye Kurdîstanê bînim  
ziman. Ji aliyekî mirov kare bêje, ku Gundikê  
Dono stirana Çemê Xerzan e. Çemê Xerzan  
şahîdê dîroka Kurdistanê ye. Ji aliyê din ve jî  
min xwest ez nîşan bidim, ku mirov kare ro-  
manê bi zimanê Kurdî binivîsîne. Zimanê  
Kurdî zimanekî xweş e, lîrik e. Lê mixabin,  
neyarên gelê Kurd nehiştine, ku em bi vî zi-  
manê xwe yê xweş û delal binivîsinin, wî vejî-  
nin...

- Wek pirtûkên te yên berê, Gudikê Dono  
jî li derveyî welêt derket, ew li derveyî welêt  
belav bû. Tu di hemû pirtûkên xwe de rewşa  
Kurdistanê, rewşa Kurdan a siyasî û civakî fi-  
ne ziman, tu ji bo çareserkirin problemên wan  
li riyekê digêrî. Lê mixabin, gelê Kurd, xwen-  
devanên Kurd li Kurdistanê ji xwendina van  
pirtûkên te bêpar in. Gelo tu niyeta ku tu van  
pirtûkên xwe li welatê xwe çap bikî û wan di



nav gelê xwe de belav bikî, tune ye?

- Weke tu dizane, heya niha ne mumkun bû, ku ez bikaribim van pirtûkên xwe li welêt bidim çap kirin. Ji ber ku naverokên pirtûkên min hemû welatparêzî ne, ew Kurd û Kurdistanê tînin ziman. Lê ez dixwazim tiştekî bibêjim, ku bi rastî ez ji Gundikê Dono hesidîm. Gundikê Dono ji min mêrxastir derket, ew berî min çû welêt, ew niha li welêt çap di-be.

- Ez bawar im, wê Gundikê Dono te jî bikişîne welêt, tu jî niha haziriya xwe û vegeerê dikî. Piştî evqas salên dirêj li derveyî welêt, tu duxwazî biçî awayî vegeerî?

- Vêga programeke min ya ewqas berfireh tune ye.

- Berî niha bi kurtedemekê pîlanên te yên li darxistina radyoyeke Kurdî li Diyarbekirê hebû. Gelo tu hê jî li tiştekî wilo difikirî?

- Niha şerdên wê hemû hatine cih, makîne hatine kirîn, pere hatine dîtin. Roja ku firsenda danîna radyoyê li Diyarbakirê têkeve destên min, ez ê tavilê radyoya xwe deynim.

- Tu di derheqa pêşeroja edebiyata Kurdî de çi difikirî?

- Ez bawer im, ku edebiyata Kurdî êdî kefenê xwe çirandiyê. Ji ber ku ev heftê sal in, ku Tirk bi Şûr û mertalên xwe, bi derew û fesadiyên xwe, bi her îmkanên xwe êrîş anîne ser zimanê Kurdî, da ku zimanê Kurdî bikujin, lê qeweta wan negihîştîyê. Îro em dibînin, ku Mehmed Uzun (M. Uzun di sohbeta me de weke guhdar amade bû) çar pirtûk nivîsandine, te çar pirtûk nivîsandine, min nivîsandine. Êdî zimanê Kurdî hew dimire.

- Wek çawan ku te jî behs kir, nivîskariya te ya bi Kurdî li derveyî welêt dest pê kir. Herweha edebiyata Kurdî bi tevayî li derveyî welêt û bi taybetî jî li Swêdê geş bû. Ev salek du sal in, ku hin îmkanên nivîsandina Kurdî li welêt peyda bû ye. Bi a te berpîrsiyarên nivîskarên me yên derveyî welêt çi ne? Divê ew vegeerî welatê xwe, di nav gelê xwe de rûnên binivîsîn, an jî ew her jiyana xwe ya biya-

nîstanê berdewam bikin?

- Rast e, me li derveyî welêt nivîsandina Kurdî geş kir, lê ger em bixwazin çîrok û romanên nemir biafirînin, divê em rojekê berî rojekê berê xwe bidin welêt. Em li welatê xwe, di nav gelê xwe de rûnên û binivîsîn. Bi a min divê nivîskarên Kurd bi Kurdî binivîsîn. Dido, divê diyalogek xurt di navbera wan de hebe. Sisê, divê ew pirtûkên hevdu bixwînin. Çar, her gya ku nivîskarekî Kurd pirtûkekê binivîsîne, divê berî ku ew çap bike, ew nîşanî çend nivîskarên Kurd yên din bide. Em xwe nexapînin, ji ber ku ev heftê salên zimanê me ye, nehatiye xebitandin, loma zimanê me li paş maye. Ji ber vê yekê divê em ji xwe re nekin kompleks, her yek nebêje, ez ji yê din zanetir im.

Ez dixwazim vê jî bêjim, divê em nivîskarên Kurd rahêjin qelem û defterên xwe û em berê xwe bidin Kurdistanê xwe. Êdî dem hatiye, divê em vegeerin...

- Em ê pîrsa xwe ya dawî bi programa Mahmûd Baksî ya pêşerojê ve girê bidin. Gelo programa M. Baksî ya pêşerojê çi ye?

- Di bîst û du salan de şanzdeh pirtûkên min derketin. Êdî bi serê dê û bava di tûrikê min de du rêz jî nema ne. Divê ez herim Kurdistanê dîsan tûrikê xwe tije bikim. Ez herim li ba Zibêrê Emhê rûnê, li ba Perîxanê rûnê, herim ba Aso, herim ba yên din, neh deh tûrikan bi dev re tije bikim û rûnê binivîsînim. Heta ez neçim Kurdistanê, ez wan nebînim, ez bawer nakim ku ez bikaribim tiştekî binivîsînim. Lê di programa min de ev heye; ger ez herim Kurdistanê, ez dixwazim çend salan rûnê û li ser mala Eliyê Ünîs romanekê binivîsînim.

Ez dixwazim vê jî bêjim; derketina NÛDEM çîrûskek hêviyê da me, Tirêjên hêviyê bera nav civata me ya tarî da. Lê dil dixwest, ku ew bi hejmara xwe ya pêşî ve li welêt, li nav gelê xwe derketa. Ji ber ku mirov li nav gelê xwe bi rûmettir e, mirov bêtir bi qîmet e. NÛDEM valahiyek dîrokî dagirt, ez ji NÛDEMê re ji dil pêşerojek rohnî daxwaz dikim û ew li gelê me pîroz be!

# PAYÎZ



Şahînê B. Soreklî

## Şahînê Bekirê SOREKLÎ

**P**ayîza îsal li vî welatî ne çî payîz e. Geh ro li ezmên germahiyê wek havînên Kurdistanê li ser erdê belav dike, geh jî baraneke wek ya destpêka nîsanên Kurdistanê di bin tav û brûskan de xwe bi lez digihîne ser erdê û germahiyê ji holê radike. Xidirê 63 salin di odeya paşin de rûniştiye û di pencerê re li baranê dinihêrêye. Xanî yê wî ye, lê kurê wî Osman, Jina wî Ayşe û çar zaroyên wan di odeyên xênî yên din de dimînin. Ji bo Xidir odeya paşin hatiye dayîn.

Xidir di sala 1967an de, bi umrê 39 salin gihîşt Australyayê. Ji bo çar-pênc salan hat, lê Brîsbin ew berneda û sal li dû hev bûn xelekên zincîrê, zincîr drêj bû û wî hew dît payîza umrê wî hatiye. Berî du salan jina wî Fatme çû heqîya xwe. Çawa bûya berî mirina wê herdem kesek li hember wî dihat dîtin, kesek ku bidil, yan bêdil, guhdare gotinên wî dikir, li pirsên wî vedigerand, daxwazên wî yên hundir malê bi cih dikirin. Fatmê bi mirina xwe av di rehên dara jiyana wî de rawestand û darê dest pê kir roj li dû ya din hişk bibe.

Heger li gundekî Kurdan, yan bi kêmasî li bajarekî Rohilata Navîn bûya, me ê peyva

"Apê" dabûya pêş navê Xidir, me ê bi navê "Apê Xidir" behsa wê bikira, lê li Brîsbin em ê bi navê Xidir behsa wî bikin, em mafê binavkirina wî wek "Xalê xidir" jî nadin xwe.

Wek me li jor diyar kir, Xidir di odeya paşin de li paş pencerê rûniştiye û li baranê mêze dikêye. Dilê wî cixareyê dixwaze, lê tixtor kişandina cixareyê ji bo wî qedexa kiriye. Heger bi serê xwe bûya, wî ê guh nedabûya gotina tixtor, lê ew ji kur û bûka xwe bi tirs e. Ew kişandina cixareyê li wî dikin serhevde, ne tenê ji ber ku tixtor cixare ji bo wî ne baş daye xuya kirine, lê herweha ji ber ku bêhna dîyê cixareyê ji bo torinekî wî bi zirar e. Torinê wî yê biçûk nexweşiya "asma" bi wî re heye, dîyê cixareyê alarciyê (hesasiyetê) di pozê wî de vedijîne û ew dest pê dike bibênije, çavên wî sor dibin, dikuxe...

Baran vedike, ro car din derdikeve, germahî dîsa şûna honikiyê digire. Kurê Xidir van rojan kar nake, li gel jina xwe di odeya pêşin de rûniştiye. Ayşe ji şirketeke çêkirina kincan re dirûnê dikêye. Ev kar ji bo Ayşe xirab niye, ji ber ku karekî "reş" e. Ne dayîna bacê pêwîst e, ne jî pereyên bêkariyê ji hêla

hukûmetê de têyên birrîn. Helbet karekî wisa ji bo şirketa çekirina kincan hê baştir e. Jineke muhacir karê du karkiran bi pereyên karkirekî dike. Şirket li jinên muhacir yên karên wisa dikin zexeliyan dike, jinên muhacir li hukmatê.

Drêj nake sehneya li paş pencerê ji dest Xidir diçe. Her çar zaroyên kurê wî, tev qirecira xwe û ya çar zaroyên cînanan, li paş pencereya Xidir dicivin û dest bi lîzika "krîkit" dikin. Germahiya li dû baranê, qirecira zarokan, denê lêxistina goga hişk û ramanine tevlihev, yên ne xweş, bêhna Xidir teng dikin. Ew bêhemdê xwe destekî davêje şebqeyê xwe, yê din davêje gopêl, ji hundir derdikeve û berî dide sûke.

Li meydana Xaniyê Belediyê şeş ixtiyarên muhaci rûniştine. Xidir yê karawafî di nav wan de nas dike û diçe li teniştê wî rûdine. Herdu dest pê dikin bi Îngiliziyê şikestî li gel hev biaxifin. Ber çend mehan axiftina wan bêtir li ser Kurdan bû, lê îroj yê karawafî rê nade Xidir, her li ser bûyerên li Karawatistanê cîh girtibûn diaxife. Xidir her dike nirçenerîç û serê xwe dihejîne. Çel, yan pence, deqe derbas dibin. Yê karawafî xwe ji şorê vala dike. Meraqa xidir û kirina şorê jî nemaye. Dest li ser gopalên wan, herdu jî li xelkê li pêş wan diçin û tene dinihêrin. Ji nişkan ve kalê karawafî radibe ser xwe, xatir dixwaze û diçe. Xidir hêze xwe dike, da rabe biçê mal, lê dil naxwaze.

Êdî esrî teng e. Germahiya royê biçekî kêmtir bûye, hejmara yên di wir re derbas dibin nizim dibêye. Li pêş Xidir neh-deh kevokên mor dicivin û çavên Xidir di wan de qiq dibin. Yek ji kevokan ber bi wî tê û li wî dinihêre. Xidir li pêş çavên xwe, li şûna kevokê, xortekî dibîne, dibişire û dibêje:

- Merheba, Birazê. Tu ji kuderê yî

- Merheba ji te re jî. Apo. Ez xelkê gundekî Cizîrê me.

Xidir piçekî bi ser xwe de difikire, car din li xort dinihêre û dibêje :

- Tu li Stembolê çi dikiye, Birazê?

- Ez hatime li kar bigerim.

- Li Cizîrê jî payîz e?

- Li Cizîrê bihar e. Demsalên welatê me û ev welatî li dij hev in. Apo. Dem li vir payîz be, li wir bihar e, wek demên rojê. A nuha li Cizîrê sibe ye.

Xidir ji ber xwe ve şerm dike, ji ber ku gotina xort rast e. Li milê din, ev Brîsbin e, ne Stembol.

Ji hêla rawesteka trêne de du zaroyên dehduwanzde salin bi pisiklêtên xwe ve ber bi Xidir tên û xwe li nav kevokan diqelibînin. Kevok bi lez ber bi çep û rast difirin. Xidir vediciniqe, dûvre di ber xwe de dike nirçenerîç û dibêje:

- Bênamûsên cendirman!

Kevok diçin li şûneke din vedinişin.

Li vir divêt em bi Kurtî, hema piçekî, behsa paşerojên Xidir bikin. Heye ku xwendevan gazincan bike û bixwaze bêtir li ser paşerojên wî bizanibe. Xidoyê (navê kutûgê xidir Reşatoglu) li gundekî bi navê Mezra Jorîn (navê qeydê: Küçük Mazra) çavên xwe li cihanê vekirine, pênc salan di xwendegeha gund de xwendiyê û jiyana wî, kêm-zêde, wek ya piraniya zaroyên gundî derbas bûye, ta ku ew di hejdesaliya xwe de bûye Leşkerê dewletê. Li dû eskeriya xwe ew li gundê vegehiyaye. Bavê wî Fatme, dotmama wî, jê re xweziyê. Herdu zaroyên wan yên yekem, yek ber çelrokiya xwe, yek ber heftmehiya xwe mirine. Xidir li dû mirina zaroyê duyem çûye Stembolê, du salan bi tenê maye û li dû mirina apê xwe, bavê Fatmeyê, jina xwe jî haniye cem xwe. Wek me berê jî diyar kir, ew di 67an de wek muhacir çûye Australyayê û li bajarê Brîsbinê bi cîh bûye.

Bêguman, hindêk xwendevan ê bixwazibin li ser kurdariya Xidir jî agahdar bibin. Ne ji mafê nivîskêr e, ku Xidir wek kurdperwerekî bide nasîn, ji ber ku bi rastî jî ew ne

kurdperwer bûye. Camêr her kurd maye, lê nebûye kurdperwer. Li Stembolê wî bêtir bi tirkî şor dikir. Tenê dema wî ji sedî sed bizanibûya, ku kesekî dengê wan ê nebihîsta, wî û Fatmê bi kurdî li gel hev diaxiftin. Li dû gihîştina Australyayê Xidir bi tirkî re "watan-daş" bû, bi kurdan re kurd bû, lê axiftin herdem bi tirkî bû, ji ber ku Xidir xwe bajarîn dinasî. Ber derketina wî ji Tirkîyê tenê yên gundî bi kurdî diaxiftin. Li milê din, wî şerm dikir bi kurdî biaxîfê, bi taybetî li ber hevalên xwe yên tirk. Di salên heftêyî de Xidir endamêkî "cemiyeteke" olîn bû. Di destpêka salên heftêyî de Xidir endamêkî "dernegeke devrimci" bû. Di dawiya salên heftêyî de Xidir car din bû endamê "cemiyeteke" olîn, lê li dû mirina Fatmê nema dixwezt biçe civînan. Çi pirtûkên bi zimanê kurdî di mala Xidir de nedihatin dîtin. Kasêteke Şivan carekê li Almanya bi deh markan kirîbû (Dil 83an de Xidir çûbû Almanyayê, ji bo dîtina brayekî xwe. Rêxistineke kurdî ew bi otobûsan biribûn şeva Newrozê. Li wir Xidir neçar mabû kasêteke Şivên bikire. Erê, wî navê Şivan bihîstibû û dixwezt kasêtekê wî bikire, Lê bi dîtina wî xwestina deh markan ji bo kasetekê pîr bûl). Di mala Xidir de herweha kasêteke Feqiyê Teyra hebû. Xidir wek "qasêta Nîzametîn Ariç" behsa wê dikir. Kasêteke Emekçî jî hebû di mala wî de, bi stranên tirkî-kurdî. Herdu kasê hevalekî wî ji Saydney jê re hanîbûn. Li Australyayê Xidir bêtir ber bi kurdîtiya xwe ve çû û ji dawiya nîsana 91'ê û şûnve Xidir xwe li herderê û li pêş herkesî kurd da nasîn. Heye ku sedema vê yekê têlvîzyon be, ji ber ku di nîsana 91ê de têlvîzyon tiji Kurd bû bû. Tevî perîşantiya wan jî, pesna wan dihat kirin. Xidir bi dilekî xemgîn û bêvilên şewîfîn serbilind dibû bi kurdbûna xwe.

Bêguman gellek mafên xwendevên hene, lê ne ji mafê xwendevanekî, yan xwendevanekê, ye ku Xidir wek kevnepereş, yan nezana, yan kukum, yan bextreş... bi nav bike, lê heger bike jî, dê nivîskar çî dikare bike?! Ji dest Kurdekî wek Xidir nayê der, da xwe li gor daxwaza me têxe qalibekî. Boriya jiyana

Xidir ew wisa gîhandiye vê qonaxê.

Nuha em car din li beşekî bajarê Brîsbin vegerin û xwe bigihînin Xidir.

Ji pêş Xaniyê Belediyê Xidir ber bi rawesteka trêne diçe û ber bigihê wir, xwe ber bi çepê badide, dikeve taxeke bi mixaze û dukan. Ji vir û pê ve Xidir xwe bi carekê ve wenda dike, yan belkî xwe ji nû ve dibîne. Ev taxa Brîsbin li pêş çavên wî dibe gundê wî. Di destpêkê de Xidir wisa dizane ku ew li gund vegeriyaye, lê wek em ê dûvre tê bigihên, li dawiyê Xidir dibe Xidirê heşt salîn. De em pêşbiriya li bûyeran negirin, em berê guhdar bikin, ka Xidir di vê taxa Brîsbin de çî dibêjê:

"Ez hatim! Ez hatim! Merheba ji we re, gundîno! Hûn min nas dikin? Ez Xidir im. Ez Xidirê Reşid im. Ha ji we re zêr (li vir Xidir pereyên hûr ji bêriya xwe derdixe, çep û rast davêje). Min zêr û zîv ji we re hanîn. Çima hûn ji min re li çepikan naxin?! Zêr û zîvê min ber çavên we bigirin. Lawo, tu ne kurê Mihemedê Çolaq î (bi destê peyakî digire)? Lawo, ez bavê te dinasim. Hey bêbext! Tu çima pozê xwe wek sîpeyên biharê radikiye? Min zêr û zîv tev xwe hanîne. Ez ê bibim zengîne vî gundî. De hûn bikenin, bêbextino, de hûn bikenin, ez li we vegeriyam, bêbavino. Min digot hûnê bi dahol û zirneyê werin pêrgîna min. Hey wax, çî heyf! Gundîyan ez ji bîr kirime. Ev mixaze ya kê ye (derbas hundir mixazeyekê dibe)? Ya Mudris Axa ye Ez ê jê bikirim. Ji vir pê ve ez axayê we me. Hele wa, hele wa! Ev çî qîzîk mîzik in bûne duncanîye? Ez ê te ji xwe ra bixwazim (dest ber bi keçekê drêj dike). Ez ê bi graniya te zêr û zîv bidim kopekê bavê te, qîzê. Hat, hat (diqîre), Xidirê hat,..."

Di romaneke Albert Camus de, bawer im ya bi navê L'Etranger, ronahî û germahiya royê bandoreke weqa li bokeyê romanê yê frensî dike, ku ew bi dabenceya xwe Erebeke Cezayirê dike. Pêkan e ku roya payîzê ya Australyayê jî bandoreke wisa li bokeyê çiro-

ka me kiribe, lê "bêmentiqiya" Xidir ya nuha (bêguman xwedevan ji dizanin) ne tenê ji germahî û ronahiya royê zaye, ew bêtir ji bandora payîzê hatiye holê. Mebest bi payîzê ne tenê saldema payîzê ye, lê payîza jiyana wî ye, payîza jiyaneke li dervayê welêt. Payîza karkir û muhacirên kurd li dervayê welêt hên neketiye navîna xwe. Ya Xidir destpêk e.

Erê, mafê we heye, ku hûn ji nivîskêr dawîya kurteçîrokê bixwazin, lê kêfxweş jî mebin. Em Xidir li pêş Çavên we rezil û riswanakin. Welhasil, polîs tîlefone ambûlansê (trimbêla nexweşan) dikin. Xidir nuha di nexweşxaneyêke Brîsbinê de, di beşê "Nexweşiyên Nefsîn" de ye. Ber em dawiyê bidin çîrokê, em têkevin odeyê nexweşxaneyê, odeya Dr. Albert Hope. Pêwîste e were diyarkirin, ku di vê rewşa nefsîn de mêjiyê wî tenê li zimanê wî yê heşt salên destpêka jiyana wî xwedî derdikevêye. Ji ber ku wî neh salin dest bi xwendegehê kiribû, ew dikare tenê bi kurdî fêhm bike û bersivê bide. Heye ku xwendevanek bibêje, ma ji vê çêtir?! Na, na, hele hespê xwe ragirin. Rewş bi rastî jî yeke xirab e. Brîsbin ne Stockholm e. Li Brîsbin wergêrên zimanê kurdî tunene. Kurê Xidir bi kurdî nizane. Erê, çend kes ê li Brîsbin werin dîtin, ku

kêm-zêde bi kurdî diaxifin, lê Kurê Xidir naxwaze kes bizanibe, ku bavê wî "dîn" bûye. Li milê din, ê li hesabê wî were, heger bavê wî nema vegere mal. Jina wî her roj dibêje, bi tirkî dibêje helbet, "xwedê" jî bavê te êdî tehmûl nake. Ka şansê feqîr heye, ber têkeve ber destan bimire!" Lê em xwe li ser xelkê nekin dadmend. Werin em çîrokê di odeya Dr. Hope de bi serî bikin, tevî ku çîrokên wisa bêyî serî ne jî:

Dr. Hope: Ask your father, what can he remember best?

Kurê Xidir: Baba, ne haturliyorsîn?

Xidir: Ev dolên qûndan ji min çî dixwazin? (Kurê Xidir tişteki fêhm nake).

Dr. Hope: Ask him, what is his name?

Kurê Xidir: Baba, adin ne?

Xidir: Na, ez naçim Adenê. Ez diçim berberxên xwe. Payîz e, payîz. Zivistan li pêş e.

Xidir dema "zivistan" dibêje, dranên wî diçirsin û bedena wî ji kokê ve dilerize.

(sydney, 1/92)

# YÊN RAKETÎ

---

Husên HEBEŞ

Raketine  
Bi zom zomî,  
Bi tenyayî.  
Raketine  
Bi hevhemêzkî,  
Ji hevcudayî.  
Raketine  
Rût û tazî,  
Bê dest û ling,  
Li her derê  
Raketine  
Li nav zinar û gelîyan,  
Li nav çirav û lélavan,  
Li nav bapeşk û barovan.  
Raketine  
Li ser bistî û kendalan,  
Li ser bomban,  
Li ser rê û rêkorkên bajar û gundan.  
Raketine  
Di bin sîvlekên xanfyên  
koçkirî de,  
Di bin gulfyên berfê de,  
Di bin esmanê tirsê de.  
Raketine  
Li ber deryên  
peristgehên zerdeştîyan,  
Li nav senger û şikeftan,  
Li nav mizgeft û kilîsan.  
Raketine  
Li her derê,


Li kuderê  
Dikeve û nakeve bîr  
û xeyalan.  
Kurdên me û  
aşorîyên hevvelat,  
Raketine  
Û bi ser de  
di vê xîşm û bêtarê de!!!  
Qundaxên serbazên tirkan  
serê jin û pîr û kalên  
me dişkînin,  
Û kînen xwe  
bi ser me de dirrjînin.  
Raketine  
Bagerr  
Bûyîna zarokên me yên  
nû  
pîroz dike,  
Her bi wê rîtwalê jî  
binax dike.  
Raketine  
Şîr - seqem e.  
Birçîti - dêwekî xedar û sawîr e,  
bi nav qelfên revîyan ketî,  
wan dihêrre.  
Hêvî - ew e,  
eger mirin bilezîne.  
Û serketin -  
Eger çiqas dereng bê jî,  
Wê rojekê  
Li me lwis bê,  
Eger  
Qurbanîyên  
Rakîfîyan,  
Bîrîndaran  
Birçîvanan,  
Û şehîdan  
li bajarên  
Bexdayê, Ankarayê, Şamê û Tehranê  
neyên firotan.

02.06.1991.

Bonn

# MELE EHMEDÊ CIZÎRÎ

1570 - 1640



Z. Zinar

## Zeynelabîdîn ZÎNAR

em û dewr diguhurin, zeman berepêş diçe, ji dola mirovan nişên nû diafirin û ew niş li ser ruyê dinyayê li jiyana xwe didomînin. Ew jiyan jî çi bi rindî û xweşî be, çi jî bi xirabî û bi bindestî be, tê domandin. Lê jiyana nişên nûhatî çi dibe û bi çi awayî dibe bila bibe, tevger û tevdira wan bi çi rengî dibe bila bibe, divê ku ew xwe nas bikin û ji koka xwe dûr nebin. Eger kîjan nişê ku ji kok û binyata xwe dûr bibe, dê ew zû bihele û navê bav û bapîrên xwe wenda bike; herweha nav û nişana xwe jî wenda dike û di nav der û cîranên xwe yên biyanî de tê veşartin.

Çaxê ku mirov çav dide dîroka mîletan, tê de gelek tişt têne xuyakirin. Hingê îcar mirov dikare li wê gorê her mîletêkî bipîve û biha bidê. Lewra çi hindik çi jî pir, dîroka wan mîletan hatiye nivîsandin û tê derewneqa wan tê xuyakirin. Lê sed mixabin û tê derewneqa wan tê xuyakirin. Lê sed mixabin ku dîroka Kurd û Kurdistanê ne wisa ne û di nav ya dinyayê de bi nivîskî kêm e û bi ruhniyeke melûl diîse.


Bêguman ew kêmasî ne ji ber nebûn û kêmbûna nivîskarên Kurd çêbûye; ji ber vegirtina Kurdistanê û dabeşkirina wê çêbûye. Her-

waha ji 1639'an ve ye ku heta îro, ji kuştin û cihêlkirina Kurdan zêdetir, ew hovîfî û xwixwariya dijminan li çand, dîrok, ziman û torreya kurdî jî bêhempa hatine kirin. Lewra çiqas nivîsên kurdî hebûne bi temamî hatine mihûkirin û talan bûne; ji 1925'an ve ye jî, ku dewleta Tirk zimanê kurdî qedexe kiriye û ziman û lêvên wan qefle kirine.

Îcar eger li hemberê hewqas zordestî û hîvîtiyan, ku ne ev zimanê bibingeh bûna, ger ne ev mîletê kevnare bûna, belkî niha kurdek tenê jî bi zimanê xwe nedipeyivî. Her çiqasî heta niha ku gelek siqûmatên mezin bi ser zimanê kurdî ve hatine, dîsa jî em serbilind in ku niha bi cildan û bi hezaran pirtûkên bi zimanê kurdî hene û refên pirtûkxaneyên dewletan, xasma yên Ewrûpayê dagirtê ne. Her ku rewş ev e, dîsanê em deyndar in ji Melayê Cizîrî û gelek rewşenbîrên mîna wî yên din re, ku ji me re gelek berhemên pîroz diyarî hiştine.

Navê Melayê Cizîrî Şêx Ehmed e, navê bavê wî Şêx Mihemed e û ew ji eşîra Bextîyan e. Lê belê hinekan gotiye, ku navê Melê bixwe "Şêx Mihemed" e. Lê wî di Dîwana xwe de (Beş: 35, malika paşî) navê xwe bi





*Wêneya temsîlî yê Melayê Cizîrî*

"Ehmed" nivîsiye û di çend deverên din de jî wisa nivîsiye. Îcar ege navê wî çî be jî, ew di nav xelkê de bi "Mele Ehmedê Cizîrî" hatiye naskirin.

Mele Ehmedê Cizîrî di 1570'yî de li Cizîra Botan hatiye dinê. Pêşî wî li cem bavê xwe xwendiyê, piştê ew çûye Diyarbekir û li gundekî bi navê "Sitrabas" li cem Mele Taha xwendiyê û jê destûrnameya xwendinê wergitiye. Mela piştê jî wir çûye û li gundekî bi navê "Sirba" yê Diyarbekir meletî kiriye. Piştî demekê jî wir çûye, di Xwendegeha Heskîfê de ders daye feqîyan. Îcar piştê wî Mela jî wir çûye Cizîrê û di Mizgevta Sor de dersdarî kiriye, heta ku di 1640'î de çûye dilovaniya

xwe.

Niha gora Melê ya pîroz, li Cizîrê di binê Mizgevta Sor de ye û pîrozgeha Kurdan e.

Bêguman Kur hemû ji nêz ve Melê Cizîrî dinasin. Çaxê ku bêjeya "mele" tê bihîztin, berî her kesî ew tê bîra mirov.

Li Kurdistanê cihekî taybetî yê Melayê Cizîrî heye. Her çend gelek kesên rewşenbîr jî nav Kurdan rabûne jî, lê giranbihatiya wî cihekî taybetî girtiye. Cizîrî di ilmê olî, tesewuf, dîrok, felsefe, edebiyat, cografya, astronomî û gelek şaxên zanistiyê yên din, herweha di têgihîştina rewşa qata serdet û ya bindest de zanayekî dagitî û alemekî deryaderî bûye.

Pirtûka Melayê Cizîrî ya herî menşûr, Dîwan e. Belam her beşeke wê bi serê xwe zanistiyek e; ji tarîxê bigir hetanî felsefê, ji barbariya Cengiz û Tîmûrleng hetanî teoriya Iqlîdes û Istoqusê Yûnanî, ji astronomiyê hetanî tevgera dinyayê û ji hwd, behs dike. Erê di warê zimanê kurdî de jî, gencîneyeke pir dewlemend e. Wî gelek jî behsa êrîşên Tirk û Farisan kiriye, ku hatine ser Kurdan û hovîtîya dijminan eşkere kiriye. Du heb ji wan helbestan ev in:

*Turkên xwînrêz û xumarî, me bi yek xemzeyekê*

*Zuhdê çilsale li min zêr û zeber kir ji esas*

.....

*Geh dil û geh can dibin Turkên te tîn*

*Nakirin yexma û talanê xelet!*

Melayê Cizîrî di zanin û tîgihîştîya zanistiyê de gelekî kûr û hûr bûye û pir jî hosta û xweşzan bûye. Ji ber wê yekê di dema wî de pêplûka nivîskaran bi zimanekî hişk û sergirtî dihate bihalêkirin. Lewra wî jî hin helbestên xwe gelekî hişk, bi peyvên kin û bi manene kûr rastine. Ha yek ji wan ev e:

*Me cewher 'unsurek xas im numa îro di tali'da*

*Di vê teqwîmê însanî li tali'bûne fal ebrû.*

Herweha di warê şîret û lixwehaydariyê de jî, Melê weha gotiye:

*Belkû dîwarî bi guh bin, bi Xwedê kî bi Xwedê*

*Bi tu rengî negerî eşkere esrarê hudûs.*

Mixabin heta niha tarîxa jidayikbûna Melayê Cizîrî rind nehatiye zanîn. Her çiqasî hin nivîskar û rewşenbîr lê geriyane, lê bi kêm û zêde çend tarîxên cihê-cihê deranîne pêş û bi newekhevî nivîsîne. Wek vê, tarîxa wefata wî jî rind nehatiye zanîn. Lê helbesteke Feqiyê Teyran nîşan daye, ku Melayê Cizîrî kengê çûye dilovaniya xwe. Û Dr. Kemal Fuad wê malikê li gor hesabê Ebcedê pişkastiye, ku Melê Cizîrî di 1050'î (1640) de wefat kiriye.

Di 1986'an de çaxê min (bi alîkariya E.N.) Dîwana Melayê Cizîrî ji tîpên erebî wergerand de tîpên latînî, em li malika dozdeyan ya di beşa destpêka wê de ketin gumanê, ku Melê tê de tarîxa jidayikbûna xwe nivîsiye. Malik ev e:

*Ji herfan mah û salê ma, nehat der şiklê xalî ma*

*Kuca danendê halê ma, sibikbaranê sahil ha.*

Me vê malika li jor, li gor hesabê Ebcedê pişkasti. Lê ji ber ku Dîwan gelek caran hatiye çapkirin, bêguman di bêjeyan de jî hin guhartin çêbûne. Îcar ev "şiklê xalî" di hinek çapan de bi "şiklê falê" hatiye nivîsandin. Lê di Çapa Dîwana Baxdadê de, bi "şiklê xalî" hatiye nivîsandin. Ew çap jî, ya Mihemed Elî Ewnî ye. Îcar me xwe bi wê çapê piştrast kir û tarîxa jidayikbûna Melê ji bêjeya "herfan" û "xalî"yê derxist holê, ku dike 980. Lê eger ev tarîx ya Hicrî be û dîtina me jî rast be, li hember ya Mîladî dike 1570. Belam ji ber ku ew malik di beşa destpêka Diwanê de ye jî, çêtir mirov dehf dide bi bal rastiya wê ve.

**Dîwana** Melayê Cizîrî ya asasî, ew e ku ya bi navê "Çapa Cizîrê" hatiye binavkirin. Ew Çap ji 115 beşan saz kirî ye. Lê hinekan guman kirine, ku beşa 115'an ne ji eslê "Çapa Cizîrê" ye. Herweha mîna hinek helbestên Melê hene, ku piştê ew ketine nava Dîwanê.

Îcar eger em beşa 114'an ji Dîwanê re ya paşî bihesibînin, di malika sisîyan a wê beşê de jî tarîxeke din heye, ku mirov jê gumana tarîxa kutakirina Dîwanê dike. Malik ev e:

*Lew elif tîn me di herfên falan*

*Ku li şiklê reqemê sersalan.*

Me bêjeya "şikil", "reqem" û ya "sersal" an jî, li gor hesabê Ebcedê pişkasti. Ji wan tarîxa 1041 derket, ku li beramberê ya Mîladî dike 1631. Îcar nivîsandina Dîwana xwe di 1041'ê de kuta kiriye. Û ji bêjeya ku Melê gotiye "elif ten me tê zanîn, ku "elif" didu ne û herduyên ku di bêjeya "falan" de ne. Amaca

Melê ji bêjeya "herf"an, roj in. Çewa ku Ehmedê Xanî jî di paşiya NÛBARa xwe de, bêjeya "herf"an roj dane kifşkirin. Ha li gor van derdu elîfan ku dibin reqemên serê salan, tarîxa kutakirina Dîwana Cizîrî dibe 1.1.1041.

Nexwe ji van tarîxan hate zanîn, ku Melayê Cizîrî di 1570'yî de ji diya xwe re çêbûye, di çilsaliya xwe de dest bi nivîsandina Dîwanê kiriye, (Di 1621'ê de bi Feqiyê Teyran re helbesta daneberhevê ristiye), di 1631'ê de nivîsandina vê Dîwana xwe kuta kiriye û di 1640'î de jî çûye dilovaniya xwe.

Ha li vê gorê, Cizîrî 70 salan li dinyayê jiyaye. Lê hinekan gotiye ku ew 73, hinekan jî gotiye 75 salan temen kiriye.

Ev çapan Dîwanê ya ku me wergerande tîpên latênî, ji 123 beşan û 1810 malikan hatîye avakirin. Hinek malik beyt in, hinek çarîne ne, hinek şeşok in, hinek heştok in, hinek, dehrêz, dozderêz, şazderêz û bîstusêrêz in. Di malikên pîrrêz de qafîye di rêzên paşî de ne.

Belam ew 114 beşên çapa asafî ya Dîwana Melê, hemû rewan in û gelek xweşkêşan in, qafîyeyên wan jî li gor rêza alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî ne, ku di wê demê de Kurdan jî xwe re bi kar dianîn. Ew tîpên alfabe yê ku di qafîyeyan de hene 28 in. Afaalbeya qafîyeyên Melê ev e:

A=elîf, B=bê, P=pê, T=tê, S=sê, C=cîm,

H=hê, X=xê, D=dal, R=rê, Z=zeyn,

S=sîn, Ş=şîn, 'S=sad, 'D=dad, 'T=ttê,

'Z=zzê, F=fê, Q=qaf, K=kaf, G=ge,

L=lam, M=mîm, N=nûn, H=hê,

W=waw, L=la, Y=yê.

Çawa ku me li pêş jî got, Dîwana Cizîrî bi serê xwe xizneyeke bêhempa ye û ji zimanê kurdî re gencîneyeke bê dawî ye. Îcar her çiqasî me nikaribû di derbareya wê de bi awayekî fireh agahdarî bida, lê me ji xwendevanên kovara NÛDEM re vê beşa 142 malik ya bi navê "Felsefa Melê" wek nimûne li jêr nivîsî.

## FELSEFA MELÊ

Ellah sehergaha ezel  
Yelmûmê 'îşqê şu'le da  
Nûra cemala Lemyezel  
Zatê tecellaya xwe da

Zatî tecella bû li zat  
Bê îsm û asar û sîfat  
Sirra hurûfên 'alîyat  
Xef bû di sitr û perde da

Zatî muqeddes bû wucûd  
Coşîş nedabû behrê cûd  
Wesf û îzafat û quyûd  
Yek ji tecellayê neda

Husn û cemalê xwest evîn  
Vêkra di yek zatî civîn  
Nûra qedîm bû 'îşq û vîn  
Wan li êk naz û 'îşwe da

'Îşqa ji nûra Layezal  
Husn û cemala bêmîsal  
Îsandin yelmûm û şemal  
Dîsa xwe lê perwane da

Husn û mehebbet her hebû  
Heq aşîqê zatê xwe bû  
Muhtacê husnek dî nebû  
Neql û rîwayet pê weh da

Burhanê 'eql ew kir qiyas  
Îsm û kemalatên di xas  
Ewel elîfê pê bina  
Vê nûrê ew pertew veda

Ew nûre dayî şewq û tav  
Alem xweyabû ma di nav  
Berqên xwe avêtin belav  
reng-rengî berq û lem'e da

Subhan ji remza Xaliqî  
Nûra sipîde sadiqî  
Avête qelbê aşiqî  
Lerzîn û ta û cezbe da

Me'nayê'işqê bê m çî ye;  
Lew min bi çeşmê dil diye  
'Eksa cemalek safî ye  
Lami' di mîr'ata me da

Husnû mehebbet zatek in  
Me'sûq û'aşiq latek in  
Lê sûret û mîr'atek in  
Her yek di me'nayê xwe da

Ger dîlber û wer aşiq in  
Arif di vê da sadiq in  
Ayîneyê nûra Heq in  
Cih-cih di wan da cîlwe da

Aşiq ew e, dîlber ew e  
Zahir ew e, mezher ew e  
Rûh û beden gewher ew e  
Her şahidek durdane da

Her şahidek da dê m ji durr  
Rûhek di beş ba remz û sur  
Xetê xubarî nuqte pur  
Katib ji bala nusxe da

Herfên kişandî katibî  
Nûra di rûh û qalibî  
Yek-yek bi îsmê wahibî  
Îrab û cezm û nuqte da

Nûr in ji ser heta qedem  
Neqqaşê ser meşqê qidem  
Pê zeyyinand lewhê edem  
Her yek bi yek dî çeşne da

Ev şikl û sûret, çeşne yin  
Esl in, li bala terhe yin  
Nisbet bi wan em saye yin  
Tertibê xellaqî weh da

Aleb bi alem ew neseq  
Bû ayine esmaê Heq  
Nûra tecellaya teteq  
'Eks û xeyalek sade da

Her heyeta lê rûh û cîsm  
Gelkê ku lê danî tilism  
Her yek ji yek rabûne îsm  
Lew herfî herf endaze da

em têk hewiyyat in yeqîn  
Îsm in ji mesder muşteq in  
Mewhûm û laşey mutleq in  
'Eks in di nêv ayîne da

Pertew ji 'eynî nûrekê  
Tê n-tên tecalla tûrekê  
Ew ser didit yek fûrekê  
Lew çendî leb-leb qetre da

Ew şahidên bê rî ji 'eyb  
Her cîlwe lê dayî di keyb  
Vê alemê ew tîne ceyb  
Dîsa li ha ew cîlwe da

Reng, rengê husna sûretan  
Neqş û nîgarên destxetan  
Bala û bejn û qametan  
Şêrî nleban pur xende da

Şêrî nlebên qedneyşeker  
Sîmînberên nazikbeşer  
Zulfan sitar bû roj di ber  
Biskan li miskê te'ne da

Guldesteyên nûrîncodem  
Destan ji enguştan qelem  
Ew laleyê Baxê Îrem  
Mawer li belgan jale da

Hin esmer in, hin dêmzerf  
Mehpeyker in, surmuştêrf  
Wîldan û hor û ew perî  
Hatî lîbasê came da

Çendî bi xeml û rewneq in  
Tezyfîn ji husna mutleq in  
Têk cîlweyê nûra Heq in  
'Îşqa ezel pê şîwe da

Husna munezzeh bênişan  
Wê lê nivîsî zerkeşan  
Xal û xetên 'enberfeşan  
Her kes bi wan dil yexme da

Darûyê husna dîlberan  
Bi xeml û lîbas û zîweran  
Bête şihûda beseran  
Bînahiya her dîde da

Binmêt-i husnê rengê-reng  
Nay û def û qanûn û çeng  
Ew 'îşqevan tînit bi deng  
Lew wan bi husnê nexme da

Sira kelimê eqdesî  
Dem-dem di lîbsê enfesî  
Têtin tenezzul bêhisî  
Ne b'guft goyê qisse da

Weh di vê ku 'uşşaqin hebin  
Dildar û muştâqin hebin  
Wê şemsê afaqin hebin  
Da kifş bibit d'îspîde da

Da kifş bibin kewkeb di çerx  
Rabin hezar Me'rûf ji Kerx  
Şiblî û Se'dî, alî Ferx  
'Îşqê di wan keşfa xwe da

Da husn û hub din mezheran  
Kifş kin li her erd û deran  
Aşiq bixwînin defteran  
Dîlber mehebbet name da

Husn û cemal û 'îşqe ye  
Aram bi perdê da neye  
Mehbûbê lew heta heye  
Nabit di perde û xelwe da

Mehbûb û xwûb û dilberan  
Bigrî li wan heftê deran  
Dê xwe ji şîbak û penceran  
Zahir bikin di her erde da

Ew laleyên ji gul tazeter  
Fesla buharê bête ser  
Cih-cih bi hev ra têne der  
Xweş-xwek di erdê xare da

Remzek xerîb û fatirî  
Peyda bibit nîv xatirî  
Qewet te nînin ragirî  
Xef kî di nêv qelbê xwe da

Mefhûm ku bû me'lûm di dil  
Zîwer bidî tê sed 'emil  
Bînit lîbasik pur xemil  
Hindî ku se'y û cehde da

Lefz û 'îbarat came ye  
Mehbûb-i me'na bi xwe ye  
Lê xemlî husnek zêde ye  
Lewra bi husnê zîbe da

Min ev mîsal lew bo te best  
Zoran bi zulfan dil vebest  
Herçî te dî sûreperest  
Durrê yetîm bê feyde da

Pîs û xirab û zişt û ar  
Ma ew bi xemlê têne kar?  
Ê di qeydê lebsî nedye yar  
Hubbê bi xwe davê neda

Çarê hilîn, yarê bibîn  
Ne d'perdeya tarî bibîn  
Sed carî er karî bibîn  
Gul wê di nîva buxçe da

Ew bû murada kirdîgar  
Lew kir îrade û ixtîyar  
Vê buxçeyê her lê buhar  
Gulgeş di baxê xwunçe da

Bayê evîne ku livî  
Ew qîşt û zulfê ser çevî  
Her dem hezar dil dakevî  
Xal lew di damê dane da

Behra wucûdê coşî hat  
Nûrek tenezzul bû ji zat  
Hatî te'eyyun têk sîfat  
Eşya zuhûr 'ilmîye da

eşya di 'ilmê bûn zuhûr  
Îsman ji feyza îsmê nûr  
Teqwîmê bestin bê qusûr  
Hukm-i sîfatê seb'e da

Vê Alemê teqwîmê best  
Her îsmekî fi'la xwe xwest  
Hukm û teserruf da bi dest  
Her wî di milk û qebze da

E'raz û'eyn û cewheran  
Wahid ji esl û mezheran  
Tesîrî bexşî mezheran  
Sed rengî herf û sixe da

Feyza hurûfên 'aliyat  
Behsa sutûrên safilat  
Ayat û wesfên muhkemat  
Tertîbê 'uşr û sûre da

Katib nivîsîn ew hurûf  
Her talibê pê bû wuqûf  
Hatî ji dil sed ah û of  
Serxet li Lewhê sade da

Ew destxetên katib semed  
Wahid li ser lewha ehed  
Neqşek reşandî bê'eded  
Ce'da cemalê şane da

Esmâ tekamul rast kirin  
Bala fewa'il rast kirin  
Cih-cih qewabil rast kirin  
Jê'illetek sûriye da

Esmâ muqabil bûne zewc  
Lê cumle jê bûn fewcefewc  
Behra wucûdê hate mewc  
Mewcan di behrê luced da

Coşîş ku da deryayê Cûd  
D'ayineya îsmê Wedûd  
Carek tecella bû wucûd  
Fûrek ji nûrê jê veda

Fûrek ji nûrê wî vekir  
Genca zuhûrê pê vekir  
Kenza xwe qufl û mifte kir  
Hêj wê di qufl û mifte da

Husnek munezzeh sewirand  
Nûra hebîb jê afirand  
Alem di KUN hê heyirand  
Rûh-ul Qudus can nefxe da

'Erş û cîhat lê bû heyat  
Ew şahidê qudsîsîfat  
Ji bo yeqîna nûrê zat  
Sîwan û şewq û hale da

Husna ji 'îşqê sewirê  
Xaret kirin hor û perî  
Herçî di KUN hê fikirî  
Ew ma di'iciz û hîre da

Ew sûretê mîr'atê husn  
Jê bû zuhûr ayatê husn  
Lê bû tecella zatê husn  
Vê husnê ew serçeşme da

Serçeşmeya husnê ew e  
Xurşîd û alem pertew e  
Ger bedr e wer mahê newe  
Wer Muşterî yan Zuhre da

Wîldan û hor û ger perî  
Şêrn û mehbûbên berî  
Hemyan ji husna xawerî  
Nûrê di wan yek zerre da

Nûra ji nûra Ehmedî  
Sirra sîfatên sermedî  
D'ayineya zatê xwe dî  
Keşfa kemalatê xwe da

Ew bû qelem, ew bû'eqil  
Lew pê hedîsê da neqil  
Deryayê'ilm ew bû şeql  
Tefsîlê 'ilmê cumle da

Ew bû di cumle rabîte  
Mîzan û îsm û basîte  
Feyza heq ew bû wasîte  
Çeşmê wucûdê surme da

Yek bû elif, yek nuqte kir  
Çend şiklê dî lê zêde kir  
Her dem peyapey sifre kir  
Bala bi bala rutbe da

Wahid ji nûra wê durê  
Peyman e ew cama surê  
Mey rihtê anî ber firê  
hem cam û hem peymanê da

Xeyb û mîsal in herdu silk  
Peyweste anîn mîmê milk  
Ew katibê elmasî kilk  
J'wê xameyê ev reşhe da

Nûra tecella hate 'erş  
Esmâ hemî lê bûne neqş  
Şewqa di wan çû ta bi fers  
Îsman bi zatê secde da

Katib qelem dîsa gerand  
Îsmek ji îsman sewirand  
Kursî ji nûrê afirand  
Cennatê xula û Sîdre da

Serçeşmeya nûra sexî  
Behra cemed dabû rexî  
Feyzê ji ber da berzexî  
Dagirt û geh-geh fûre da

Ew berzexa rengayine  
Hingî ku eşya dayine  
Wan tê şemal îsayine  
Jê sûretek 'eksiye da

Wesf û kemalatên subûh  
Herfên kîtaba 'eql û rûh  
Îsmek divê lê bin wudûh  
Lew Lewh û kilik û xame da

Ew nusxeya alî îsim  
Lewhek divê jê ra cisim  
Da herfî lê bin murtesim  
Herfan şikil nûrfîye da

Nuqtê ku me'nayek divê  
Terkîbê îmlayek divê  
Sûret heyûlayek divê  
Rûhan, di nefesê cuse da

Ma têne dîtin husn û sur  
Bê bejn û balayên ji dur?  
Katib ji van herfên di pur  
Nûnek xeyalî besme da

Durdaneyên xawermîsal  
Ayîneyên tê da şemal  
Nurêk munezzeh ew cemal  
Mey kir di nîva şîşe da

Rûhaniyên qudsîmîsal  
Dê bên lîbasê xet û xal  
Saqî meya gulgûn û xal  
Tînit di fîncana me da

Mey ku di camê bite noş  
Bêdeng û sewt her têtê goş  
Jê têtê di herdem siroş  
Lew ev şerab alûde da

Ev reng tecela kir subûh  
saqî ji şehkasa futûh  
Mey rihte cama eql û rûh  
Roj bû di qewsê qubbe da

Roj bû di nîva neynikê  
Katib ji herfê 'eynikê  
Nîvgoşeya qewseynekê  
Tuxra bi îsmek taxe da

Tey kir di neêv tuxarayê îsm  
Teksîrê kir herfên tilism  
Husna muqeddes bû du qism  
Hukmê tecellayê we da

Yek 'eql û rûhê e'zem e  
Mîsbah û nûra alem e  
Hawa û, neqşê Adem e  
Bê mudet û bêmade da

Ê dî ku nefsa kullîye  
Husnek muqeddes alî ye  
Ew jî bi rûh ra eslî ye  
Wan herdu hev ra saye da

Ayîneya zatê yek in  
Lew dîlber û latê yek in  
Vêk ra di mîr'atê yek in  
Hem taze-taze 'îşwe da

Ew tên bi cem'ê fer' û esl  
Mafl dibin vêk ra bi wesl  
Nabin ji yek ew ferq û fesi  
Hukmê wîsalê pê we da

Vêkra ku bune wesl û cem'  
Barî ji mabeynê du lem'  
Îsa ji erwahan du şem'  
Şem'a nufûsan şûle da

Îsa ji erwahan qebes  
Pur şûle tên nûrîn qefes  
Nefsan bi 'îşqê da nefes  
Qelban bi hubbê lehce da



Ew latê husn û'eynê nûr  
Sûret bi sûret tên zuhûr  
Îns û perî, wîldan û hûr  
Cî-cî di wan da cîlwe da

Her yek ji feyza îsmekê  
Tên sûreta tilismekê  
Lew me'neya her cîsmekê  
Pertew ji nûrê lê veda

Dê sirrê tewlîdê bibêm  
Ne b'wehm û teqlîdê bibêm  
Me'na ji tewhîdê bîbêm  
Dil vê edayê şehde da

Me'şûq û aşiq herdu lat  
Meczûbî dê yek bin sîfat  
Hîna ku bû yek îltîfat  
Be'zek sîfatan hisse da

Hay û hoya subbûhiyan  
Reqs û semaya quddûsiyan  
Teşbîhê coqa sofîyan  
Feryad û zîkr û lerze da

Westa ne şaxis sef-sef in  
Batin di'eynê da xef in  
Teşbîhê berqa qatîf in  
Lami' di çerxê tîs'e da

Bi zaz û cama badeyê  
Yar têtin nîva helqeyê  
Medhûş û mestê wê meyê  
Şak û kulah aşufte da

Remza di cama şerbetê  
Xef têtê nîva suhbetê  
Herçî ku fincanê detê  
Wîcan bi nezr û sidqe da

Şem'a wîsalê her geş e  
Şewqa şemalê atêş e  
Xemra peyalê bê xeş e  
Saqî'ecêb reng bade da

Saqê 'eceb reng bade rêt  
Aşiq ji me'şûq ev divêt  
Fîncan bi fincan da û mêt  
Kama dilê bêçare da

Eşya li pey hev welidîn  
Yek-yek ji weslê bedidîn  
Hem mesder in, hem mewrid in  
Vê qulzumê ev reşe da

Ew reşe da wê qulzemê  
Mey hate tasa alemê  
Cama cîhanbîn da Cem-ê  
B'Eskenderî ayîne da

'Eksa ji husna meyfiroş  
Avête fîncanên bi poş  
Nageh di caman hate coş  
Fûrî di nîva kuze da

Saqî ji dengê bulbul e  
Avête çerxê xulxule  
Rûhan li dorê silsil e  
Govend û reqs û helqe da

Mehbûb xwe nîşan da sefê  
Carek di cama qerqefê  
Hatî bi awazê defê  
Tenbûr û çengê nexme da

'Eynê tebî'et cismê kul  
Bişkift di wî baxî du gul  
Îşqê gerandî camê mul  
Husnê di wan da pence da

Berzex bi berzex bûne rast  
Nînin di nêv da kêm û kast  
Menzil bi menzil hilguhast  
Heta ku dur çû huqe da

Avête durdana xwe dur  
Îsand ji mîsbaha xwe sur  
Dolabê necminehse kurr  
Mîhra sitêra Se'de da

Çewkanê bayê Lamekan  
Fulka felek qaîm sukan  
Teşbîhê goy da ber şekan  
Her bê sukûn û sukne da

Ew kamilê bê'eyb û neqs  
Çerxên bi her yek nem'û şexs  
Wê yek bi yek anîne reqs  
Tê seb'eyê seyyare da

Her neh bi vê cehd û lezê  
Çerxîn li dora merkezê  
Behra du alem lê kezê  
Tê ev hebab sergeşte da

Behra du alem lê zebed  
Mewc û hebab in, hin cemed  
Peyweste têtin cezr û med  
Seywan li sehayê veda

Ew xêveta kewkebmîsal  
Geh bedr e têtin, geh hîlal  
Sê deh, duwazde mah û sal  
Çerx in di seyra tis'e da

Mîn dil ji fehmê qasir e  
J'wî sûretî çar bagir e  
Pê kir tamam ew daîre  
Neqşek ji wê terwende da

Yek-yek ji teqwîma qedîm  
Lê bû neseq hukmê hekîm  
Avête wê lewhê Hekîm  
Têk alemê pê şûle da

Hingî ku xet û nuqte ne  
Ewda'û eşkal tê hene  
Her yek bi miqdarê xwe ne  
Esla tesewwur rê neda

Mîqdar û şiklê hendesî  
Kê-m-zêde yek pê naheşî  
Teswîr dikir Iqlîdesî  
Heta bi sethê sufle da

Mersef di nav van meş'elan  
Qet'a mesafa merhelan  
Sirra birûc û menzilan  
Resma silûkê cade da

Ew yek bi yek xalî nihin  
Bê hîkmetek alî nihin  
Ger van surek halî nihin  
Ew reqs çira mestane da?

Mestane govendê dikin  
Reqsê li dor findê dikin  
Qesta şekerxendê dikin  
Le'lan ji gewher xende da

Tên bayê çerx û lewleban  
Tedwîr û seyra kewkeban  
Şe'se'aniya rûz û şeban  
Dolabî her tê jê seda

Sûret bi sûret lê kişand  
Lewhê Heyûla neqîşand  
Zêrav ji nûrê lê reşand  
Teqwîm û şikl û xane da

Katib di çerxê cedwelê  
Xweş neqşek avêtê welê  
Kir haşiya heft heykelê  
Nêv kulliyatê xemse da

Danîn di pergaran esil  
Bestin muqabil da fesil  
Vêk ra dewaîr bûn wesil  
Berzex bi berzex hisse da

Çar'unsur in, çar teb'et in  
Vêkra bi mîzan vêkketin  
Hevra muxalif sîret in  
Der sûretê şexsîye da

Hetta bi mîzan çar esil  
Bi hev ra nebin cem'û esil  
Cisman ji hev nabin fesil  
Bazû ji bazû şeq neda

Çar ummehat in, sê benat  
Her bê qerar in, bê tebat  
Pur'işq û meyl in iltîfat  
Vê tazedeyrê kuhne da

Hin suflewî bazî dikin  
Hin meylê evrazî dikin  
Xweş reqşek şebazî dikin  
Sergeşte ne d'halê xwe da

Her heyet û her cîsmekî  
Her ferd û new'û qîsmekî  
Rûh wê di destê îsmekî  
Mayî di qebze û pence da

Kulab bi destê wahib e  
Yan rakide, yan cazib e  
Yan xafide, yan nasib e  
Yan ref'e û yan cezme da

Ew cezme dayî merkezan  
Ê dil ji ber şewq û lezan  
Hikmet bi qanûnê bizan  
Ehlê dil ev jê gufte da

Remzên nûcum û heyetê  
'Eqlê mucerred nare tê  
Bê nûr û 'ilmê wehdetê  
Ew ma di şek û şubhe da

Feyyazê 'ilmê "Mîn ledun"  
Pey-pey ji behra "Kan" û "Kun"  
Geh-geh bi ustadê sexun  
Wê gewherek nasufte da

Feyza 'ulûmê felsefe  
Pur kifş e, lê sitr û xef e  
Mîn dî di camek qerqef e  
Fîncan bi can min cur'e da

Her neh felek lê kaxik in  
Dûr diraz wek axik in  
Tê dar in, ew jî şaxik in  
Vê terhê însan meywe da

Însan ber e, alem dirext  
Sultan ji xelwet hate text  
Pê zeyinîn îqbal û bext  
Dewlet ji bala tale da

Sultan ji bala hate xwar  
Lahût bi nasûtê veşar  
Peyweste bû nuqta medar  
Dora 'urûcê gerr weh da

Dewran gerandin her teref  
Aşiq gerandin sef bi sef  
Mehbûb bi fîncana sedef  
Durdaneyaya seyale da

Saqî ku da min ew sûlaf  
Feza meya gulgûn û saf  
Zail kirin şubhe û xîlaf  
Tîmek ji bejnê ruq'e da

Tîmek numa dil pê numûc  
Qelbê bi 'îşqê kit 'urûc  
Dê tey bikit çerx û burûc  
Şehper li dara Sîdre da

Dolab û çerxê neh felek  
Pêş destê Kursî bûn helek  
Sergeşte hatin ew gelek  
D'wê nuqteya mewhûme da

Ehsen ji vê nezmê letîf  
Çendî sebuk hatî xeffîf  
Mebûb bi destê xwey şerîf  
Nexdê me muhr û sikke da

Ehsen ji vê wesfa refî'  
Eskal û ewda 'ên bedî'  
Têtin ji nûrê wek reqî'  
Bê'eyb û neqş û rexne da

Ehsen ji vê wed'ê Mela  
Eşkal û ewsafên hela  
Lew dil bi wan bû muhtela  
Cezbe w celale d'sîne da.

# MIRINA MIRIŞKA SPÎ \*



---

Dr. Cemşîd BENDER

**L**i biyanîstanê jiyin, mirov dike hêsrê hênetiyên cuda. Bi xwestina, ji bo ku tiştekî ji bîr bikin, hûn bi dû mijûliyekê de diçin, mina keştiyekê ku li ser avê diherike. Hîseke neserketîne ku hûn sedema wê nizanin an xemgîniyên ku şaşiyekê afirandine we dike nava lepê xwe. Hûn xelasiyê bi **yekbûna** xwezayê re dibînin. Ji xwe li welatekî biyanî, ji famîlya we pê ve kesekî din, ku hûn bikaribin pê re deng bikin li hawirdora we tunebe an kesek qimetekî nede we, an jî we nas nekê wê gavê rewşa we xirab e, wê demê ji bo we xweza maneyekê gelek cuda dide û cihêkî girîng digre. Tu dibê qey zarokî, jiyana xwendegêhê, ya Leşkerî û pêdaketinên we yê hûnermendî, li paş dîwarên qalind dimînin û, weke ku ev macerayên yekî din bin, biyanî dibin. Bîreweriyên kevn ku we bextiyar dikin mîna çûçikên kewçîrkan belav dibin. Çi bîreweriyên we yê dijwar; nexoş hebin, ew jî bi poşmanî û neserketînen we re yek dibin û bi hev re derdikevin pêşberî we. Hûn tu dibê qey êdî dibin mîna mirovekî ku li serê çiyayan û li nav daristanan tobe dike.

Gundê ku em lê dijiyan li xewlecihe.î bû mehên havînê hênîk dibuhurîn, heftêya pêşin ya meha çiriya paşîn hawirdora me bi berfê tijî dibû. Ev berfa ku şêş mehan ji cihê xwe qe ne dilivîya û ne jî dihilîya, berfa ku nû dibarî re girên mezin ji berfen diafirandin. Ji bo ku hawirdorê mala ku em lê dijiyan vekim, min her sibe du saetan berf davêt. Dema bi qasî ku mirov bikaribê tê da bimeşe min rê vedikir, ez gelekî kêfxweş dibûm. Lê ber bi nîvro ve dîsan berf û bahozê dest pê dikir. Hemî xebata min bertelef diçû. Mala me li nava daristên bû. Darên çaman yê dirêj kuser şaxên wan tijî berf dibûn, nûnerîya dunyayêke bêdeng, ku ji tarîfyê zû nependî dibû, dikir. Dema ku tarîfyên hêj nava rojê bi ser we de digirt, we yê bigota "roj qediya" û we yê fikra roja dahatû bikira.

Mala me li kêleka daristanê bû. Xezal û pezkovîyên ku tevaya zivistanê zehmetî dikişandin da tiştekî xwarinê bi dest bixînin, bi kerîyan dadiketî bexçeyê me. Eger we tiffin-ga xwe ber bi wan ve bikira, wê gavê, bi der-

bekê re we yê dudo ji wan bigevizandina, bigurandina, perçe bilciranana û di sarinca xwe de bi cî bikirina. Lê me bela xwe qet li van heywanan ne dida; giyayê ku mehên havînî me dabû Ser hev û hişk kiri bû me dida wan, dema ku dixwarin min ew temaşe dikirin. Min bi wan re dostaniyek ku berf û sermayê pêşkêşî min kiribû, danî bû. Dema ku hemî berf diheliya û dunya dibû bihar, wê gavê jî ev dostaniya me diqediya. Êdî pezkovî û xezalên min dikişiyana ber qiraxa gola paqij ku li wê derê çike çika çivikan bû, ewan jî li wir bazdidandireviyan. Bo ku em jî tama biharê derînin me li ser çiyana û girikan baz didan. Kirgoyên berrî li dora me diçûn û dihatin, siorriyan xozên çaman dikeritandin, ordek û qazên bejî di ser serên me re difirriyan. Mîna ku hemî gundiyan dikir me jî, bo teyr û çivikên macir hêlinên jî text amade kiribûn. Me evana li ser darên mav daristên de bi cî kiribûn. Gelo ew kiragirê ku em li hêviyê bûn hate. Vê mala çivikan? Me kontrol dikir ku em bibînin, da çivika mê li ser hêkên xwe raketîye. Di wexteka kurt de ev hêlin tijî dibûn. Ev çivikên ku ber bi zivistanê ve dê di ser Îtalya'yê re, bifirriyana Afrikayê renga reng û celeb celebî bûn, periyên wan zer, hêşîn, sor û mina çivika malê gir bûn. Rojekê, li hêlina çivikê ku nêzîktirî mala me bû bûyere ku kesekî ne dipa qewimî. Pisikeke bejî dilê xwe li wê hêlinê xera kiribû. Pisika bejî çend carî hewl dida ku çivik û çûçikên di wê hêlinê de bixwe. Çend carî min kevir avêtibûnê, xwestibû wê bitirsîne. Lê wêya guh nedidayê û tenê xwe ji ber kevirên min dida alî. Wexta jî bo ku bitirsînim ez bi ser de diçûm, wê laşê xwe dirêj dikir, vediziland û dixwest min bitirsîne. Lê li ba min jî mirîşka min ya Spî ku qet ji min nediqetiya, biçûma ku bi min re bû, hebû. Bi wê re min gelekî hevaltiyeke xweş danî bû. Dema ez di kilûba xwe de ku li teniş mala me bû, li ser daktiloya xwe rûdiniştim û min dinivîsand, ew di derfîyê vekirî re dihat li ba min radiwestiya. Dema min nivîsên xwe, jî bo ku rêkim dibirin, davêtin qutîya postê, ew

jî li gel min dihat. Em li gel hevûdin, li ser hêlinên çivikan digeriyan. Heywan li mirovên ku tevaya rojê bi tenê serê xwe kar dikin re nêzikayê raber didin. Anuha ev bûyera ku dê li vir kad bikim, di nav bêna wê mirîşkê û pisika bejî de derbas bû bû.

Rojekê, wexta li mal rûniştibûm, li derva min hengameyek bihîst. Wê gavê bi lez derketim der. Pisika bejî bi darê ve hîlkîşiyabû, hêlina çivikan xistibû erdê û hewl dida ku çûçikan bixwe. Mirîşka min ya sîpi jî bo ku van çûçikên çivikan xelas bike êrîş biribû ser pisika bejî. Mirîşk û pisik serobinî hevedin dibûn û şerekî bêhawe di nawbêna wan de dest pê kiribû. Ji ber çavên pisikê xwîn diherikî û bi boça mirîşkê ve jî perî nema bûn Min kevir avêtin pisikê û bi zor ew jî wir qewitand. Min rahişt hêlinê û lê nêrî, du çûçik wenda bûn. Heta ku mirîşka sîpi pê ve gihîştî bû. Pisikê dudo ji çûçikan xwaribûn. Lê qe nebe wêya sisê ji wan xilas kiribûn. Bo mirîşka sîpi ev jî serketinek bû. Belê, ev bûyera bû ku weke birewriyêkî biharê di mejiyê min de mabû.

Hezkirina min bo mirîşka sîpi zêde bû bû, min dostaniya xwe pê re xurttir kiribû. Min giyayê hêşîn jêdikir û bo wê Pêşkêş dikir. Kêfa wê piri jî ji mewîjan re dihat. Dostaniya me tevaya havînê domand.

Lewra rojên me yên ku em dê vegeriyan welêt nêzik bûbûn. Dema min kilûbeya xwe vala dikir ji nişka ve mirîşka sîpi ku li cem min bû, hate bîra min. Baş bû, em dê bi rê biketana, lê dê çî bi mirîşka me ya sîpi behata?

Min mesele ji keça xwe Sîbelê re vekir. Xweşdosteke heywanan bû. Li navçeyê beşdarî musabeqeya xweşikbûna Keroşkan bûbû, bi keroşkên ku mezin kiribûn ve, hercar yekemin derdiket. Ew li gel hevala xwe ya xwendegêhê Tonê, beşdarî wan musabeqeyan dibûn. Tonê afikariya wê dikir. Xelatên ku qezen dikirin mina hev li hevedin parve dikirin. Çewlîkek (çiftlik) mezin yama la Tonê hebû.

Çewlik nêzî gundê ku em lê diman, li ser çiyayê Hoftûn bû. Li çewlikê xaltiya Tonê dima. Ji bo ku em mirîşka Sipî lê bihêlin ji vir cihekî baştirîn dê neba. Sîbel û Tonê mirîşka Spî xistin hundirê qutîyek ji qertonê û hêdî hêdî bi çiyê ve ber bi çewlikê ve hilkişyan.

Rêwîtiya wan du saetan domandiye. Dema ku gihîştine Çewlikê, xaltiya Tonê gelekî baş

bergirtiya wan kiriye. Keça min jî kenîya ye û gatiye: "Me destek ku bavê min gelekî jê hez dike, ji te re aniye", û qutî vekirine. Lê çi bibînin? Mirîşka sipî ji bêhewabûnê fetîsiye. Zarokan bi bazdanê xwe di çiyêre berdan û hatin. Herdu jî digirîyan mîna ku me hemîyan mirovekî xwe wînda kiribe wusa em xemgîn bûn.

---

\* *Mirza C. Bender ev çiroka xwe ji mere bi tirkî şandibû, me ej jî bo xwendevanan NUMERE wergerandê kurd.*

---

# ŞEVÊN SPÎ

DOSTOYEVSKÎ

Wergêr: Firat CEWERÎ

*Qet nebe, ew ji bo kurtedemekê be jî, ma gelo*

*Ew ji bo ku nêzîkî dilê te be hatiye afirandin?..*

*Ivan Turgenyev*

## ŞEVA PÊŞÎ

Xwendevanê min yê delal, ew şeveke wilo xweş bû, ku mirov ancax şevên wilo di xortaniya xwe de dikare bibîne! Mirov li asmanê rohnî, li stêrkên bi şewq dinihêre û ji xwe re difikire, ku çawan "Di bin asmanekî wilo de mirov dikarin hêrs bibin û biqheherin". Lê ev fikir jî ji bo xortan e, xwede vanê delal, hem jî ji bo xortên pîr ciwan.. Ez hêvîdar im ku wê dilê we jî demek dirêj ciwan bimîne.

Ji ber ku peyv ji mirovên bêhnteng û zirvêbûye, ne di destê min de ye, ku ez biaqiliya xwe ya wê rojê bi bîr neynim. Destê sibehê, acizbûnek ecêb, bêhntengiyek mezin dilê min dagirtibû. Di dilê min de hîsek ku her kes dev ji min berdidin û min bi tenê dihêlin, hebû. Bi gotina "Herkes" heqê we heye ku hûn bipir-

sin. Ji ber ku ev nêzîkî heşt salên min in, ku ez li Petersburgê dijîm, lê min hê jî ji xwe nas nekirîye. Lê ma ez ê çi bikim ji nasan? Ji xwe ez Petersburgê ji serî heta binî nas dikim. Ji ber vê yekê, gava hemû rûniştvanên Petersburgê çûne havîngehên xwe, ez wilo fikirîm, ku wan dev ji min berdan û ez bi tenê hiştim. Gava ez bi tena serê xwe jî mam, tirsek mezin ket dilê min, sê rojan weke dêhnan li min hatibû, ez her li kuçê û kolanên bajêr geriyam. Ez çûm kuçeya Neva, ez çûm Parkê, ez çûme ber perrê behrê, ez bi ku de çûm jî, min ew mirovên ku min ew di hundirê salekê de li eynî cihê didîtin, min vê carê yek ji wan jî nedît. Ew min nas nakin, lê ez wan hemûyan nas dikim, hem jî ez wan ji nêzîk de nas dikim. Rûyên hemûyan jî niha li ber çavên min in. Dilşahiya wan dilşahiya min, xemgîniya wan xemgîniya min e. Her rojên Xwedê ez li Fontankayê li kalokêkî hûrik ras dihatim. Hema hema wextî ez bi wî kalokî re bibûma dost. Kalo bi kincên xwe yê spehî û bi rêk û pêk, hertim destê xwe yê çepê li ba dikir û hêdî hêdî di ber xwe de dipeyivî. Di destê kalo yê rastê de jî gopalekî destik zêr û girêk girêkî heye. Mêrik êdî





*Dostoyevski*

hebûna min ferq dike, her cara ku ew min dibîne, ew dixwaze xwe nêzikî min bike.

Ez karim bi şert bilîzim, ku her carê ew min li Fontanka nebîne, kêfa wî li wî dişkê. Ji ber vê yekê, her cara ku ez û ew pêrgî hev tîn, ger kêfa me li cih be, em herdu jî dikevin hewayek ku em ê silavê ji hev re bidin. Wî çendê berê, me du rojan hevdu nedît, roja sîsiya gava em rastî hev hatin, tu nemabû ku me herduyan jî destê xwe biavêta şewqên xwe û silav bidaya nev, lê baş bû, tam di wê demê de aqilê me hat serê me û me herduyan jî destê xwe bera ber xwe da û bi tenê me wek berê li hevdu nihêrî û em di ber hevdu re derbas bûn.

Navbera min bi xaniyan re jî xweş e. Gava ez ji xwe re digirim, ew yek bi yek bi pence-reyên xwe ve derdikevin pêşiya min, li min dinihêrin, hin ji wan jî ji min re dibêjin: "Merheba, tu çawa yî?" Eh, ê min şukur ji Xwedê ez baş im, di meha gulanê de ew ê qatekî din jî li ser min lê bibe". Hinek ji wan jî "Ê tu çawayî lo" ê min ew ê sibehê min tamîr bikin", dibêjin. Hinek jî "Do hindik mabû ez bişewitiyama, ez wilo tirsîya ku" û hwd. dibêjin. Ez ji hinan ji wan hez dikim, ez hinan ji wan jî ji nêzik de nas dikim, yek ji wan wê xwe havîna pêşiya me nişanî mîmarekî bide. Gava tamîr bibe, Xwedê wî bisitirîne. Ji bo ku tiştek bi serê wî de neyê ez ê her ro herim wir. Hela ez qet çîroka xaniyekî xweş û pembe ji bîr nakim.

Xaniyekî kevirî, biçûk, delal û xweşik bû; gava li cîranên xwe yên hepelorî dinihêrî, xwe dinepixand gava li min jî dinihêrî rû bi ken bû. Ji ber vê yekê xwîna min jî dikeliya ser wî û ez pê dilgerm dibûm. Hefteya çûyî gava ez di ber re derbas bûm û min serê xwe bilind kir, min denegekî şewat "Ez bi biyoxa zer boyax kirim" bihîst. Û ez çî bibînim, hey haydûtno, barbarno, ne stûn hiştibûn, ne jî banîje... Hemû jî bi renegekî zpîzer boyax kiribûn. Ez hêrs bûm, xwîna min kişîya mêjiyê min. Ji ber ku wan dostê min yê belengaz di rengê împaratoriya Çînê de boyax kiribûn û

kirêt kiribûn; ew roj ev roj eez naçim wê taxê.

Erê, xwendevanê min, tu dibînî bê ez çiqasî Petersburgê ji nêzik de nas dikim.

Ji bo derxistina sedema wê, min li jor behsa aciziya ku ew sê roj in hundirê min perçe kiriye, kir. Ez li kuçê aciz dibûm. "Ev tune, ew tune, ê din kî zane bê çûye kîjan cehe-nemê" min digot û min di hundirê xwe de xwe dixwar. Tam du şevan li ser hev "Ma çiyê min kême, ji bo çî ez li vir rehet nakim" min got û ez kirî di odeya xwe de dêhn bibûma. Min bi ecêbmayî li dîwarê rengkesk, yên ku ji hundir de reş bûbûn, û li tevnepîrikên ku bi jêhatîbûna Matiryona di zikê xênî de hatibû çêkirin, nihêrî. Min got: "Ma gelo hemû aciziya min ji van e" û min ew kursiyên wir jî di çav re derbas kirin.

(Ji ber ku te divê bila bi tenê kursiyek be jî, wek min ew êvarî hiştibe, ez nebînim, ez hêrs dibim). Min çavên xwe li pencereyê gerandin; lê hemû jî vala... Min qet nîkarîbû bêhna xwe berda û xwe rehet bikira. Heta min bang Matiryona kir, ji bo tevnepîrik û bêkêriya wê bê ku ez zêde dilê wê bihêlim, min erza wê şikand. Pişfî ku jimikê bi ecêbmayî li min nihêrî, derket û çû. Tevnepîrik hê jî spîsax li cihên xwe sekinî ne.

Dawî dawî, wê sibehê min rastiya çîrokê fêhm kir. A rast, her kesî dev ji min berdidan û diçûn havîngehên xwe. (Li min bibûrin, ku ez di vir de uslûbekî sivik bikartînim, ji ber ku niha ne wextê uslûba bilind e). Ji ber ku hemû rûniştevanên Peterburgê an çûbûn havîngehên xwe, an jî diçûnê. Her kesên ku ez li wan rast dihatim, xwe dinepixandin, diketin hewayek ecêb û digotin: "Em hema seriyekî hatin vir, lê pişfî du saetên din em ê vegehin havîngehê". Ger keçîkek xweşik, bi tilîkên xwe yên weke berfê spî li pencerê bikira teqeteq û ji gulfiroşekê gurzek gul birikiya, ew ne ji bo ku bêhna gulan û buharâ têxe xaniyên bajêr yên bê hilm; lê ez difikirim, ku ew ê wan gulan jî bi xwe re bibin havîngehan. Ez bi vê jî nedihatim ser, lê bi vê dîtina xwe ya nuh min tiştên qenc bi destên xwe xistin. Di awira

pêşî de min fêhm dikir, bê ew di çî celeb havîngêhê de diman. Yên ku li taxa Kamennî, giravên Aptekarskî, an jî li kolana Peterhovê diman, bi tenikî, bi kincên xwe yên sivik, bi otomobîlên xwe yên spehî, yên ku ew ji havîngehan tanîn bajêr li ber çavên min diketin. Yên ku li Pargolovo û hûn jî jê wêdetir rûdiniştin, bi awira pêşî, ew ji mirov re wek kesên bîaqil dihatin. Yên ku ji bo derbaskirina havîna xwe dihatin girava Krestovskiyê jî bi kêf û bi tevgerên xwe bilkêş bûn.

Bi alavên malê yên wek çîyan, bi maseyan, kursiyan, bi dîwan û gelek hûr mûrên din ve, di ser wan de jî, pîrrê caran jinên navmalî yên ji hevdeketî, li erebeyên bi bar, yên li dû hev, siwar dibûn û ew firaxên maldarên xwe weke bibikên çavê xwe diparastin. Ger ez qeyikek bi bar, di Neva re, di ser Fotanka re, di çemê Çiyornî re, ku heya girava diçe, bibînim, ew li ber çavên min pîrr dibin. Bi min wilo dihat ku her kes rabûne pê, dû re ketine tevgerê û bi koçmalî ber bi havîngehan ve diçûn. Mirov digot, qey wê hemû Petersburg vala bibe û di şûna wê de çolek bê deng bimîne. Gava min ew rewş wilo didît, ez bi xwe hêrs dibûm, min fedî dikir û ez li ber xwe diketim. Yê min ne tu havîngêha min hebû, ne jî ji bo ku ez biçûma cihekî wilo tu sedem hebû. Hûn ya rastî bixwazin, ji bo ku ez bi her erebeyek bi bar û bi her maldarekî ku faytonek kirê dikir, re biçûma, min can davêt.

Lê mixabin, yekî ji wan jî, erê, yekî ji wan jî bang min nedikir. Te digot qey ez di quncika xwe de hatibûm ji bîr kirin. Bi rastî jî ez ji bo herkesî biyanî bûm.

Ev e, jî ber vê ez wilo pîrr geriyam. Dawî, weke her car min xwe ji bîr kir, ku ez li ku me û hew min lê nihêrî, ez li ber deriyê derveyî bajêr im. Di wê demê de kêfekê di dilê min de pê da, ez bi gavên xurt meşiyam û ez derbasî aliyê bajêr yê der ve bûm. Ez ber bi erdên çandî û mêrgan ve çûm. Êdî min tu westandin hîs nedikir û weke ku barekî giran ji ser milê min rabûbe, ez sivik bûbûm. Rûyên kesên ku di ber min re diçûn û dihatin, bi ken bûn, he-

ma hema wextî xwe daqûl bikirana û silav bidana min; her kes bi tişteki dîlşa dibûn û puf-pufa wan bû cigarê xwe dikişandin. Ez jî pîrr bi kêf bûm, ez heya niha wilo kêfxweş nebûbûm. Ji nişkê ve weke ku ez li Italyayê bim û mîna bajariyekî bi nîvruhê nexweş di nav komên kevîran de gêjbûyî, min bi heyranî li mêrgan temaşe dikir.

Bi hatina buharê re, ew diyariya ku ji aliyê Xwedê ve tê, ku pê hemû cih û deverên mêrgên Petersburgê xweş dibin û dixemilin, tiştin tesîrê li mirov dike, lê mirov bi xwe bi wan tiştan nahese. Mêrgên Petersburgê carinan jê weke keçikek jar û nexweş, carinan jê jî ji nişkê ve dibe weke keçikek ciwan û bê hawe xweşik. Helbet hûn li hember vê keçikê ecêbmayî mane û we xwe winda kiriyê.

Bê ku di destên we de be, hûn dibêjin: "Kîjan hêzê ronahî daye wan çavên ûfbûyî û bifikirî?". Kê ev hînbûyin daye xetên nerm yê vî rûyî? Ev sîngên nû ji bo çî evqas hildikîşin û dadikevin? A ku bi carekê ve vê şêrîntiyê, spehîtiyê, jîndariye dide vê keçîka rûçilmisî çî ye? Kê ev ken daniye ser rûyê wê? Ev kenê jîndar yê bi pîqe-pîq kê daye vê keçîkê?" hûn ê ji xwe bipirsin. Hûn ê çavên xwe li dora xwe li hinan bigerînin û hûn ê ji nişkê ve fêrî her tiştî bibin. Lê wê ew kurtedem zû derbas bibe. Dibe ku dotira rojê hûn dîsan eynî wê bi wan awirên melûl, bi rûyê çilmisî, bi tevgerên reben, bi ûfbûyîn, bi poşmaniya wê ya jiyana berê, bi belengaziya wê, hûn ê rastî wê werin. Hûn li vê spehîtiya ku bi carekê ve tê û diçe, difikirin û ev yeka ha dilê we disoje. Ji ber ku berî ku hûn bigihêjin ji vê spehîtiya xapînok û bê kêr hez bikin, ew bi niyeta ku hew vegere, winda dibe. Hûn gelekî li ber dikevin û ji ber wê dil û cegerê we dişewitin...

Şeva wê rojê ji roja wê xweştir derbas bû. Ez ji çolê gelekî dereng vegeyriyabûm bajêr, saet li dor dehan min nêzikî li mal kiribû. Riya mala min di ber çem re derbas dibû.

Di vê saeta dereng de li vir cin û pîrhebok bi gogê dileyizin. Ez çî derewa bikim, ez li taxek dûrî bajêr rûdinim. Gava ez dimeşiyam jî

min ji xwe re stiranek digot.

Her gava ku ez dilşa bim, ez wilo ji xwe re stiranekê dibêjim. Her kesên bê dost û heval, gava dilşa bin û nikaribin dilşabûna xwe bi hin-din din re par ve bikin, ma ne wilo dikin?

Ji nişkê ve tişteki ku ez qet ne li bendî bûm derket hemberî min. Jinêkê xwe spartibû hesinê pirê, li ser pirê li hemberî min bû. Wê enîşkên xwe danîbûn ser hesinê pirê û li ava çem ya girrikî temaşe dikir. Mantoyekî res mîna yê xanimqehpikan lê bû û şewqeyekî xweşik jî li serê wê bû. Min di dilê xwe de got: "Ji sedî sed ew keçik esmer e". Wê dengê lingên min nebihîstibû. Di gel ku min bêhna xwe girtibû û gumguma dilê min bû jî, dîsan wê li min nenihêrî. Berî ku ez bêjim "Ecêb, ew çiqas li avê xayiz bû ye" dengê îskîna giriyê wê hate min û ez di cihê xwe de sar mam. Erê, ez ne şaş bûm, keçik digiriya. Ew her bi îskîn digiriya. Mîna tu bizotek agir deyne ser dilê min, dilê min bi wê şewitî. Min got: "Ooy Xwedêyo!" Ez her çiqas li hember jinan bi tirs bûm jî lê ev yeka han rewşeke pirr cihê bû. Hema ez nêzikî wê bûm ku bibêjim "Xanima hêja" lê hat bîra min, ku bi hezaran car ev gotin di romanên ku behsa sosyeteya Rûsan ya bilind dike de heye, loma min tişt negot û ez bêdeng mam. Di wê navê de ez li gotina ku min ê ji wê re bigota, digeriyam. Bêhna keçikê jî hebekî fireh dibû, wê li der û dora xwe mêze kir, serê xwe xist ber xwe, di ber min re derbas bû û çû. Hema min jî da dû wê. Ez bawer im, dê wê ew yeka ha ferq kiribe, loma ew derbasî aliyê rê yê din bû. Hûn ya rafî bixwazin, ez qet nifikirîbûm ku ez derbasî aliyê rê yê din bibim. Dilê min ji heyecanê weke dilê çivîkeke girtî lêdixist. Lê di wê navê de bûyerek derbasbûyî hate alikariya min. Li aliyê rê ê din, li dû jinikê, mêrikêki bi kincên xweşik û pak xuya bû. Lê rêveçûna mêrik qet ne bi rêk û pêk bû; wî carê xwe disparte dîwêr, dihejîya û bi dû jinikê de dimeşîya. Wek hemû jinên ku bi şeva ji mêrên nenas, yên ku dest davêjin jinikan ditirsîn, ew jî bi wê tirsê, wek tîra ku ji kevên bê berdan ji ber mêrik direviya. Ger şansê min alikariya min

nekira jî mêrikê serxweş û cangiran, hin hereketên xurt nekira, ez qet nedigihîstîm keçikê. Keçik weke bahozê diçû. Mêrikê ku bi zorê li ser lingên xwe radiwestiya, nedixwest dev ji keçikê berde. Wî nêzikî li keçikê kiribû, tu nema bû ku bigihîstayê, keçikê kire qîrîn. Xwedê kir gava ez derketibûm, min gopalê xwe yê girêk girêki bi xwe re anîbû. Hew min dît ku ez li ha wan im; wê mêrikê belaxwaz ferq kiribe ku wê çî bi serê wî de were, loma bê ku gotinekê jî bibêje, bela xwe ji keçikê vekir û li dû me ma. Piştî ku em hebekî meşîyan, mêrik li dû me gotinin ne xweş û ne li rê gotin, lê em ji hev bi dûr ketibûn, dengê wî baş nedihat me.

Min ji jinikê re got:

- Têkeve milê min, êdî ew hew dikare bi aliyê me de were.

Wê, milê xwe yê ku ji tirs û heyecanê diricifî dirêjî min kir. Hoo mêrikê belaxwaz, min di wê deqîqê de çiqasî ji te re dia bikira dîsan jî hindik bû. Min wa hêdî li keçikê mêze kir, min dît ku ew esmerek xweşik e. Nizanim gelo, ne ji ber tîrsa berî niha bi kêlikekê bû, ne jî ji ber li berketina wê ya berê bû, hê jî hêsirên wê li ser bijankên wê yên reş dibiriqand. Lê kenek li ser lêvên wê belav dibû. Wê jî awirek avêt min, lê dû re şerm kir û serê xwe bera ber xwe da.

- Te bîska din guh neda min, te dît bê çî bi serê te de hat? Ger ez bîska din li ba te bûma, ev tiştên ha bi serê te de nedihatîn.

- Lê ez te nas nakim ku... Min got belkî tu jî yek ji wan î.

- Baş e, ma tu niha min nas dikî?

- Hindikî... Çik, tu diricifî, ma ji bo çî?

Di gel xweşikbûna keçikê, bîaqiliya wê jî kêfa min anîbû.

- Wilo ha, te bi awira pêşî ferq kiribû? Erê, te niha fêhm kir, bê tu li ba kê yî? Ez li hemberî jinan şermokî me, bi heyecan im û bi qasî tu ji wî peyayî tirsîyayî ez jî ji jinan ditir-

sim. Hê jî şerma min neçûye. Tu dibêjî qey ez di xewnekê de me. Ger ez di xewna xwe de jî bibînim ku ez bi jinekê re dipeyivim ez ê dîsan bawer nekim.

- Çawa, tu çi dibêjî?..

- Erê, wilo ye. Sedema ricifahdina destê min ew e, ku heya niha destekî mîna destê te xweşik û biçûçik neketiyê. Ez ji jinan baş bi dîr ketibûm. Tu a rastî bixwazî, ez qet hîni jinan nebûme. Ez peyayekî bi tenê me... Ez nizanîm bê mirov çilo bi we jinan re dipeyive? Ez niha jî nizanîm. Hêvîdar im ez niha bi te re weke ehmaqan napeyivim. Ger wilo be venekişê, bibêje. Metirse, ez ji te naxeyidim...

- Na, ez di peyva te de tu tewşiyar nabînim; berevajiyê wê, tu gelekî xweş dipeyivî. Tu a rastî bixwazî, jin ji mîrên hebekî fediyokî bêtir hez dikin. Ez dixwazim û destûra te didim, ku tu bi min re were heya ber mala min.

Ji kêfa kirî bêhna min biçikiya:

- Tiştê ku tê fêhm kirin tu ê bi vî awayî misqala tirsê bi min re nehêlî. Wê çaxê jî ez ê xêtir ji hemû çareyên xwe bixwazim.

- Çareyên te? Çi çare? A ev yeka ha pîr xerab e!

- Bibûre, ji devê min derket. Lê niha tu ê çawa daxwaza tiştêkî ku ez naxwazim bikî?

- Daxwaza ecibandîne?

- Erê, wilo ha.. Hewl bide, min fêhm bike, ka bê ez mirovekî çilo me. Tu nema ye ku ez têkevim bîst û şeş saliya xwe, lê hê jî ez neke-time nava mirovan. Gava rewş wilo be, ez ê çawa bikaribim xweş bipeyivim û gotinên xwe di cih de bikar bînim.

A baş ew e, mirov her tiştî weke ku heye bibêje. Gava dilê min bipeyive, ez nikarim bê deng bimînim... Guh mediyê, ne girîng e... Tu bawer dikî ku ez hê bi jinekê re nebûme dost. Erê, ne bi jinekê re jî... Ez her tim xeyala ku ez ê rojekê jinekê nas bikim di serê xwe de çê dikim. Ma tu zane bê ez çend caran bi vî awa-

yî dildar bûme?

- Çawa wilo çê dibe, dilê te dikeve kê?

- Dilê min nakeve kesî... Dilê min dikeve wê jina ku di bîra min de ye û rûyê wê yê ku di xeyala min de ye. Ez di xeyalên xwe de romanên diafirînim. Ax, tu min nas nakî! Niha tu dibêje, ku ev jinan nas neke çê nabe, lê tu nizane bê ez çi celeb jinan nas dikim. Hemû jinên ez nas dikim çend kevaniyên malan in. Hem jî ez li hinin wilo rast hatime ku.. Ger ez tiştêkî ji te re bibêjim tu ê bi min bikene. Çend caran min dil kir ku ez li kuçê bi xanim-jinekê re bipeyivim. Ew peyva min ya bi wê re ew ê sade, bi şermokî, bi giramgirî û bi hundursotî bibûya. Min ê jê re bigota, ez ji tenêtiyê pîr aciz bûme. Min ê jê re bigota ku ez heya niha bi jinekê re jî nebûme heval. Ji ber vê yekê jî min ê jê rice bikira, ku gava ez pê re dipeyivim, ew min neqewirîne. Û min ê jê re bigota, bi paşdevegerandîna xwesteka mirovekî nola min, bi xatûnek mîna wê nakeve. Hemû daxwaza min ji wê wê ew be, ku ew tenê wek xwişkekê du gotinên xêş ji min re bike. Erê, bi tenê du gotinên xweş... Min ê jê bixwesta ku gava ez devê xwe vekim, ew min neqewirîne, bi bawerî li gotinên min guhdarî bike, ger ew bixwaze dikare bi gotinên min bikene jî. Lê tenê ew bersiva min bide, tenê du gotinan ji min re bike, bi tenê du gotinan û jê pê ve jî min ê jê re bigota, êdf em ê hew hevdu bibînin. Binêr, tu dikene...

Ji xwe ez jî ji bo vê yekê ji te re behs dikim...

- Ji min mexeyide, lê ji bo ku tu dijminê xwe yî ez dikenim. Ger te biceribanda te ê bikarîba li kuçê bi jinekê re bibûya dost. Jin ji sadebûnê hez dikin. Ger ne jinî ehmeq bin û ji tiştinan gelekî aciz nebûbin, her jin wê bixwaze bi kêfxweşî bi te re çend gotinan bipeyive. Dîsan jî tu guh mede gotinên min. Kî zane, belkî ew dikarin bêjin tu dêhne jî. Min bîska din ji te re fikra xwe gotibû. Ji ber ku ez bi jiyana mirovan dizanim, min pîr tişt dîtine, pîr tişt bi serê min de hatine...

- Oo, gelek spas! Tu nizanî bê te niha ji bo min çi qencî kir...

- Baş e, wê çaxê bêje, ê min... Ez çilo bêjim, te ji ku fêhm kir, ku ez keçîkek hêjayî dostaniyê û qîmet im? Ji bo çi te biryar da ku tu nêzikî min bibî?

- Ji bo çi? Ji ber ku tu bi tenê bûyî, ew mêrikê ha jî rehet nedisekinî, çavsofî bûbû û şev bû. Vê yeka ha wek wezîfeyekê qebûl bike.

- Lê na, berê, li aliyê rê yê din... Hê li wir te xwestibû tu xwe nêzikî min bike, ma ne wilo?

- Ma li wir, li hember? Bi rastî ez nizanîm, ez ê çilo bersiv bidim. Ez ditirsîm. .. Ma tu zane ku ez îro pîr dilşa me. Ez qet nesekinîm, ez her geriyam, min ji xwe re stiran gotin. Ez derketim derveyî bajêr, çûm nav erdan. Bi qasî ku ez van deqîqeyan dilşa me, ez tu caran dilşa nebûme. Tu... Lê dibe ku ji min re wilo hat.. Bibûre ku ez di bîra te de fînim, lê weke ku min dengê giriyekî bihîstibû. Heçê ez im... Min debar nekir... Dilê min êşiya... Ay, Xwedêyo! Gelo ma min nêzikahiyek li hemberî te hîs nekiribe? Gelo min sûcek kir, ku dilê min weke yê birayekî te bi te şewitî be? Bibûre, ku ez dibêjim, dilê min bi te şewitî... Neyse, ji bo ku ne di destê min de bû ez nêzikî te bibim, ma gelo te dilê xwe ji min girt?

Keçîka ciwan çavên xwe bera erdê dan û destê min şidand.

- Bes e êdî, dev ji van tiştan berde, got. Ji bo ku min peyv anî ser vê mijarê ez sûcdar im, lê ji ber ku ez di derheqa te de şaş nefikirî me, ez xwe serbilind hîs dikim...

Eh, va em gihîştin mal. Ez ê di vir de têkevim vê kuçeya tengik. Mala min li vê nêzikê ye... Di xweşiyê de bimîne. Spas dikim...

- Ma êdî em ê hew hevdu bibînin? Ma wê her tişt wilo dawî were?

keçîk kenîya:

- Tu dibînî, te pêşî du gotin dixwest, tu niha jî... Jê pê ez hew tişteki debêjim. Dibe ku em carek din jî hevdu bibînin.

- Ez ê sibehê werim vir. Bibûre ku ez vê ji te dixwazim.

- Tu pîr bê sebir î. Di ser re jî tu wextî emir bikî...

Min peyva wê birrî:

- Deqîqeyekê raweste, li min bibûre, dibe ku ez dîsan tişteki ecêb ji devê xwe birevînim... Tiştê ez dixwazim bêjim ev e, ez sibehê neyem vir ez îdare nakim. Ez xeyalperestek im. Di jiyana min de bûyerên ku dibin wilo hindik in, ku ev deqîqeyên me bi hev re derbas kirin pîr kêmbi serê min de tîn. Loma ez bûyerên wilo gelek caran di xeyala xwe de didim jiyandin. Ez ê sibehê werim vir. Ez ê te hemû şevê, hefteyekê, salekê xeyal bikim. Ez ê sibehê werim vir. Ez ê sibehê tam di vê saetê de werim. Gava ez hevduûtina me ya îro bi bîr bînim, ez ê xwe dilşa hîs bikim. Du-sê cihên min yên wilo li Petersburgê hene. Carekê, min rojên xwe yên buhurî bi bîr anîbû û ez jî weke te giriyabûm. Kî zane, dibe ku tu jî berî niha bi deh deqîqeyan ji ber bîranînek wilo digirîya yî... bibûre, min dîsan xwe ji bîr kir. Dibe ku jî tu li vir demekê deqîqene dilşa jiya be.

- Baş e, belkî ez sibehê saet di dehan de werim. Ez çi bikim, ji destê min nayê ku ez te bişikînim. Divê ez sibehê li vir bim. Nebe nebe, tu nefikire, ku min ji bo hevduûtinê wext daye te. Hatina vir ji bo şexsê min pêwîst e. Wê çaxê ez dikarim bêjim, ku di hatina te de jî tu nelirêfî tune ye. Dibe ku sibe jî bûyerek ne xweş wek ya îro çê bibe, neyse, tu wê hesab neke... Xwestina min ev e; ji bo ku ez çend gotinan bi te re bipeyivim, ez dixwazim te bibînim. Lê ez hêvîdar im, tu di derheqa min de tişteki xerab nefikirî. Vê jî bizanibe, ez wilo bi her kesî re hevdu nabînim... Min bi te re jî wext venediqetand, ger... neyse, ez vê sira xwe eşkere nakim! Tenê şerdeki min he-

ye.

Ez bi kêf qîriyam:

- Te got, şerdeki te heye! Ez bi hemûyi, bi hemûyi razî me. Ez amade me, ku her tiştê ku tu bixwazî bikim. Ez ji te re soz didim ku ez ê li hemberî te bi hurmet bim, her tiştê ku tu bixwazî ez ê bikim...

Êdî tu min nas dikî.

Keçik dikeniya.

- Ev e, ji ber ku ez te nas dikim, ez ê sibehê te biezimînim vir. Ez te pirr baş nas dikim. Ez dîsan di bîra te de tînim, tu şerdê min ji bîr neke. Çi dibe, tu niha tiştê ku ez dixwazim bike, ez ji dil dibêjim; dil nekeve min. Bawer bike ev ne mumkun e. Lê ez ji dostaniyê re hazir im, va ez destê xwe dirêjî te dikim. Lê hezkirin nabe, qet nabe!

Min bi destê keçikê ê biçûk girt.

- Ez sonda dixwim!

- Tu ne hewceyî ku sond bixwî. Ez zanim tu ê weke barûdê biteqî. Ji bo ku min ev gotin, tu li qusûra min nehîhêre. Ax, ku te zanîbûya bê ez çiqasî bi tenê me. Ne kesekî min ê ez du gotinan pê re bipeyivim heye, ne jî kesekî ku ez pê bişewirim... Ez nikarim li kuçeyan jî ji xwe re li hevalan bigerim. Lê tu cihê yî, tu dibêje qey ev bîst sal in em hevalên hevdu ne... Tu ê li ser soza xwe bimînî, ne wilo?

- Tu ê bibîne. Lê ez ê çawa dawiya vê zircêba rojê bînim!

- Xweş binive, û vê jî zanibe ku ez baweriya xwe bi te tînim. Şev baş! Kêfa min gelekî ji peyva te ya gava din re hat: Mirov ne hewce

ye ku hesabê her daxwazê xwe bide.

Tu zane, gava te ev gotin, ez tavilê têgihîştim, ku ez karim baweriya xwe bi te bînim...

- Ji kîjan alî ve? Çi dibe, bibêje!

-De, di xweşiyê de bimîne. Bila ev mijar niha veşirtî bimîne. Wilo ji bo te çêtir e, dişibe romanê... Dibe ku ez wê yeka han sibehê bêjim, dibe ku jî ez êşkere nekim. Ez pêşî dixwazim bi te re bipeyivim, ez te baş nas bikim.

- Ez ê sibehê ji te re behsa xwe bikim. Çi ecêb e! Wek ez di hundirê mucîzeyekê de me.. Xwedêyo, ez nizanîm bê ez li ku me. Ji ber ku te wek jinên din nekir û ez ji ba xwe neqewirandim, ma gelo tu ji xwe hêrs dibî? Ji min re rastiye bibêje! Te ez di du deqîqeyan de kirime mirovekî dilşa. Erê, mirovekî ku heya li jiyane be dilşa be. Belkî te kir ku ez bi xwe re li hev bêm. Te hemû şikên min rohnî kirin. Demên min ên wilo çêbûne ku... Neyse, guh mediyê, ez ê ji te re sibehê behs bikim. Tu ê sibehê tiştêkî nû bibihîzî.

- Baş e, min qebûl e, tu ê berê dest pê bike.

- Di xweşiyê de bimîne!

- Oxir be!

Em ji hevdu veqetiyên. Ez hemû şevê geriyam. Min qet nikarîbû biryara çûyina malê bida. Ez pirr dilşa bûm. Ox, me ê sibe hevdu bidîta...

*Dewama wê heye.*

---

*Şevên Spî di nêzik de bi wergera Firat Cewerî derdikeve.*

# AHMED ARIF

1927 - 1991

---

## Şêrîn BOZARSLAN

Ahmed Arif sala 1927 an li Diyarbekir hatiye dinê. Salên 1948-51 an da helbestên wî yên pêşin di çend kovaran da derçûne. Di helbestên xwe da zimanê xelkê bi kar haniye û babetên helbestên wî gundîne şoreşgerin, girtîne... bi kutayi xelke, û kifşe ku li ser xelkê kurd nivîsiye. Hin kesên kurd, wî wek helbestvanekî kurd dibînin, lê wî bi zimanê tirkî nivîsiye.

Sala 1970 yî hevpeyvînek bi Ahmed Arif ji aliyê Veysel Öngören ve hatiye kirin. Di vê hevpeyvîne da helbestkar dida zanîn, ku sebebê pêşveçûna wî û hezkirina ji helbestên wî ewe, ku zimanê gel bi kar haniye û her tim li ser gelê şerqê nivîsiye. Ji vê yekê gelêk serbilinde û hez kirina xwe ya gelê kurd weha tîne ziman:

"..... Hin helbestên min pîr berê ku pirtûka min çap bibe, bo kurmancî û zazakî hatin wergeradin, di destan da geriyên û heta gundan belav bûn. Bi vi hawayî wan mîrxasên ku ji ber hin sebebên di çîyan da bi qaçaxî diman, di nav tişt û eşyên wan da helbestên "sî û sê gule" û 'loriya Adiloş bebe' jî hebûn û vî tiştî min pîr dilxweş dikir."

Bi gotina wî, ilham ji helbestvanên din ên tirkî negirtiye û tewawî ziman û rewşa gel ji



Ahmed Arif, Foto ji K. press hatiye girtin

helbestên wî ra bûne çavzanî. Ji helbestên hin helbestvanên mezin, wek N. Hikmet û A. Kadîr gelêk hez kiriye, lê di bin tesîra wan da nemaye. Hurmeta xwe ji Nazîm ra weha dibêje:

"... li hember boba hîdrojenê

Xeçera kurd kare çî bike".

Di vir de dixwaze meznatiya Nazîm wek helbestvanekî bîne ber çav, lê di eynî wextê da ji dide zanîn ku kaniya helbestên wî bi xwe xelkê kurde.

Helbestên Ahmed Arif di pirtûka "hasretinden prangalar eskittim" da hatiye berhev kirin û ev pirtûk gelek caran çap bûye.

Ahmed Arif sala 1991 an da wefat kir.



## Min zinciran kevn kir ji hesreta te

Te, qal kirina te,  
Ji minalên çak ra, ji qehremanan ra.  
Te, qal kirina te,  
Ji ê bê narius ra, bê fêma  
Direwa qehpe ra.

Li pey hev  
Gur radza, çûk radiza, zindan radiza.  
Li derve dinêkî gurr e gurr...  
Her ez ranezam,  
Çend leylê bihar,  
Min zinciran kevn kir ji hesreta te.  
Gulên xwine li porê te xim  
Ge vi ali,  
Ge wi ali...

Te, karibim te biqirim,  
Ji birên bê binî ra,  
Ji istêra ku diherikê ra,  
Heta ji dasiya kivrîtê ra,  
Dasiya kivrîtê ra ku ketiye  
Dûrtirin gêlên oqyanosê.

Sêhrên xwe winda kirine hez kirinên te yên pêşîn,  
Maçên xwe winda kime,  
Bê parin ji şeva ku ji nişka ve tê.  
Qedehêk, cixarêk, ê ku di biraninan da winda dibe,

Te, karibim te qal bikim...  
Nebûna te, navê din ê cehennemê ye  
Çavên xwe meqre, bi min sare...

# SÎ Û SÊ GULE

Ahmet Arîf

---

Werger: Hafîce AL

Ev çiya çiyayê Megenê ye  
Bebanga wî li Wanê lêda  
Ev çiya zaroka Nemrûdê ye  
Bebanga wî li hember Nemrûdê lêda  
Li aliyekî berf digire hember Kafkasan  
Aliyekî secade malê Farisan  
Guşiyê cemedê li bilindahiyên  
Kevokên revok li ser avan  
Keriyên xezalan  
refên kewan...

Bila mêrxasî neyê înkarkirin  
Di şerê yek û yek de winda nekirin  
Ji hezar salan vir de peyayên vir  
Ma em haya we ji ku bigihîninê  
Ev ne refên qulungan e  
Ne koma stêran e li ezman  
Ev dilê bi sî û sê gule ye  
Sî û sê kaniyên xwînê ye ev  
Naherike,  
Bûye gol li vî çayiyî...

Ji binê serkêş kîroşkek rabû  
Kîroşkek çiyayî

Piştbelek  
Zikspî  
Reben afis bû  
Dil di dev de wilo reben  
Mirov bi tobekirin dida  
Bêdeng bû, demek xalî bû  
Berbangek çak û bê kêmasî bû  
Nihêrî ji sî û sê gulan yekê  
Bi zikê vala û birçî  
Por û rih bostek  
Di stûkurê de spî  
Mêrxasekî bêtirs  
Nihêrî bi milê birîndar  
Carekê li kêroşkê  
Carekê li paş xwe

Filînta wî ya delalî hate bîra wî,  
Ya ku di bin behlîfê de xeyidî,  
Caniya ku ji deşta Herranê anîbû hat bîra wî  
Caniyê ku tûşik bi morîkên hêşin  
Enîbeş  
Û sê sim spî  
Caniyê bezok  
Reqsok û serserî  
Çawa firiyabûn li ber Xozatê  
Niha wilo bêçare û girêdayî  
Ger lûleke sar  
Nehatiba dîtin li piştê  
Karîbû hilkişiya bilindahiyê  
Ev çiya dost in, qedrê wî dizanin  
Ev dest destên mêrxasan in  
Mêran fedîkar dernaxin.  
Xweliya cigara vêketî  
Zimanê marê kor  
Ku li bin tava rojê diçûrise  
Û ev destê hoste  
Bi carekê ve lédixe...

Ev çava tu caran nehatin xapandin  
Ev çavên ku bi bêbextiya şaxuran dizanîbûn  
Û zanîbûn ku newal bi cemed in  
Kaşên nerm bi berf in  
Bê çare bû  
Ew ê bihata kuştin  
Fermana wî wilo bû

Êdi bila marzerîkên kor çavên wî  
û teyrên belatan dilê wî bixwin.

3

Birîndar im  
Li cihekî xalî, li çîyan  
Di dema nimêja sibê de  
Ketime  
Di nav xwîne de dirêj bûme  
Birîndar im  
Xewna min ji şevan tarîtir  
Ruhê min distînin bê dem  
Ev tişt di pirtûkan de hilnayê  
Ji bêxwedîtî li min dan  
Bê pirs  
Ev e fermana paşayekî

Kirvî, rewşa min wilo binivîsne  
Dibe ku rîwayet bê dîtin  
Ev ne pêsrên gulîni ne  
Ev guleyên domdomê ne  
Di devê min yê perçekirî de

4

Fermana kiştinê anîn cih  
Mijê çiyayê hêşin  
Bayê hişyar û hênik  
Di nava xwîne de gerandin  
Dûre tîfingên xwe spartin wir  
Û li me gerîyan  
Li bin çengên me  
Li nav doxînen me  
Piştî min a sor ji min standin  
Malê Kermansahê bû  
Dûre tesbîh û qutiya min  
Ji min standin  
Hemû jî diyariyên Ecemîstanê bûn.

Em kirvî in, mirovên hev in, ji xwînekê ne  
Me bi gund û koçerên hember re  
Jin dane hev bi sed salan  
Em cîranên hev in  
Mirîşkên me tev hev dibin

Ne ji nezaniyê ye  
Ji xizaniyê ye ev.  
Dilê me li paseportan germ nebûye  
Ev e sedema kuştina me  
Ji bo vê ye navê me bi nebaşî dertê  
Bi qaçaxçîtî  
Bi rêbirî  
Bi bêbextî...

Kirvî, rewşa min wilo binivîsîne  
Dibe ku rîwayet bê dîtin  
Ev ne pêşîrên gulînî ne  
Ev guleyên domdomê ne  
Di devê min yê perçekirî de...

## 5

Li min xin lawo,  
Li min xin,  
ez nayê kuştin bi hêsanî  
Di kuçik de bizotên min ên bi xwef  
Û di zikê min de peyvên min hene  
Ji we, ji zanan re  
Bavê min çavên xwe da li ber Ruhayê  
Sê heb ji birayên xwe  
Sê birayên ku hîn têr nebûbûn ji jînê,  
Ji giran, ji minaran.  
Gava kirvî, pîsman û zarokên eşîrê  
Li hember firansizan şer dikirin  
Simbêlê wan hê nû derketibû.  
Xalê min ê biçûk, Nazîf  
Çeleng  
Sivik  
Siwarekî baş  
Gotiyê "Lêxin bira  
Roja namûsê ye".  
Û hespê xwe rakiriyê piya.

Kirvî, rewşa min wilo binivîsîne  
Dibe ku rîwayet bê dîtin  
Ev ne pêşîrên gulînî ne  
Ev guleyên domdomê ne  
Di devê min ê perçekirî de...

# DARA HINARÊ A LI SER GIRIK

Yaşar KEMAL

Wergêr: Dr. POLOÇO

**J**ina Mehemed li berriya bê ser û bin li ser lîngan rawestiyabû. Dû re ew daqûl bû û bi destan erd veda. Piştî demekê, çend tov dîtî. Wê ew tov di nav destên xwe de bir û anî. Paşê xist nav diranên xwe û dawiyê xiste bêrfika xwe.

Wê dû re bi xwe xwe got:

- Wey li min be, wey li belengaziya min be. Hemû jî riziyan e. Wey li min be.


Ew dîsan bi destan li nav axê geriya. Çend tovên din jî dîtî. Ew jî xistin nava diranên xwe. Paşê bi hêrs tif kir, avêt û got:

- Wey, weey keda min.

Di nava erd de tu hêşnayî tunebû. Ji serî heya binî erdekî beyar dihate xuyakirin.

- Em ê bimirin, wê got. Em ê îsal bimirin... Wey, weey li serê min ê bi derd be.

Dû re ew rûnişt û bû qomik. Li wê deşta bê dawî dinihêrî, li wî erdê mirî dinihêrî. Ji



Yaşar Kemal

êşê serê wê kirî biteqiya. Carê di nav re jî di-

got:

- Axx, ax keda min.

Ew heta bi berê êvarê nîkarîbû ji cihê ku rûniştibû rabûya ser xwe. Di cihê xwe de sar mabû. Wê wilo li ber xwe dida, ku te digot wextî ruhê wê bê stendin. Dû re ew rabû ser xwe û kete rê. Roj çûbû ava. Ew hate malê, bê kêf û bi dîlkulî li ber kuçik rûnişt.

Mehemed:

- Keçê, got. Ne sibe, lê dusibe em ê herin. Çer ku ez bigihîjim wir, ez ê ji te re peran ji çûkûrovayê- bi riya postexanê bişnim. Piştî çûyina min bi deh rojan tu here dîkana Cemal Efendî. Ez ê peran li ser navê wî bişnim.

Jinik bê deng ma.

Mehemed:

- Keçê, got, Çi bû ye?

Jina wî bi hêrs, bi carekê ve xwe vala kir:

- Here, got. Here Çûkûrova. Tovên ku me avêtine hemû rizayane. Em ê heya deh rojan çi bixwin? zad hemû riziyane. Xwê nemaye. Em ji arvên buhurîn xwê nemaye.

Di nava xênî de du kehrikan bi hev re dileyistin. Çar zarokên bi kincên pertal pertalî li hev civiyabûn, beyî ku bipeyivîn ew wilo li ser lîngan rawestiyabûn. Tenê yê herî biçûk, bi kirasê xwe yê qetiyayî bi fişê fiş lîka xwe dikişand.

Mehemed:

- Em ê bizina belek bifiroşin, emê pê ji xwe re kêsek genim bikin û dawiya maye jî em ê ji xwe re pê xwê bikin.

Jinik:

- Bifiroşe, got. Bifiroşe. Bifiroşe da em ji wî pariyê qêtx jî bibin.

Mehemed:

- Gava ez ji Çûkûrovayê ve gerim ez ê du

heban bikirim, ez ê çar heban bikirim.

Jinik:

- bifiroşe, got. Bifiroşe! Bifiroşe da em hişk bibin.

Mehemed hêrs bû:

- Ez ê bifiroşim! got. Hem jî ez ê bi xweşikahî bifiroşim.

Jinik:

- Bifiroşe, got. Bifiroşe! Bifiroşe da em bimirin.

Dotira rojê Mehemed bizin firote Dûre Efendî yê li gundê hember.

Weke ku mirî ji malê derketibe. Jinik ji bo bizina belek di ber xwe de bi îskînî digiriya. Mehemed jî nîkarîbû bihata malê. Wî nîkarîbû li rûyê jina xwe binîhêriya. Ji ber vê yekê ew her li der ve digeriya.

Bayekî sivik zibilên bizinan ber bi dîwaran ve dibir. Ji wê de Mehemed hat. Dû re jî Husik. Li ber dîwarê xaniyekî rûniştin. Li ser Çûkûrovayê peyivîn. Ew ê sibehê zû têketina rê û biçûna.

Husik:

- Derewa dikin, got. çawa kar li çûûrovayê tune ye? Ew Çûkûrovaya mezin!

Mehemed:

- Derew, bi hêrs got. Derew. Ew karkeran nabînin, ji bêkarkerî dimirin li çûkûrovayê. Derew, derew... Tenê ku mirov bigihîje Çûkûrovayê. Niha li Çûkûrovayê weke segan li ber mirov digerin.

Piştî kurtedemekê Ûsiv hat.

Herdiwan bi hev re:

- Hat, gotin.

Ûsiv berî ku rûnê:

- Min bihîst, got. Min bihîst kuro hûn di-

harin Çûkûrovayê. Min bihîst ku...

Husik:

- Em diharin, got. Ez, Mehemed û Aşik Alî diharin.

Ûsiv:

- Tuh, got. Aqilê we. Hûn diharin mirinê, hûn diharin nexweşiyê. Hûn diharin tayê, hûn diharin ziqûmê. Aqilê we. Ev Çûkûrova ye! Hûn Çûkûrovayê ji min bipirsin. Derd û kulên Çûkûrovayê ji min bipirsin. Ez bi Çûkûrovayê dizanim. Dêhnino! Ji birçîna bimirin û dîsan jî neçin! Ji xortaniya we re heyf e. Bira Mehemed, yê te çar zarokên wek çar gulan li dû te hene. Vê yeka han meke. Yê ku diharin vena-gerin, ku vedigerin jî weke min bi nexweşî ve-digerin.

Mehemed:

- Tu çara wê tune ye, got.

Husik:

- Em zanin keko, lê çara wê tune ye, got.

Ûsiv:

- Yên ku bi Çûkûrovayê dizanin, dizanin. Ez bi Çûkûrovayê dizanim. Dişewite. Aweke wê heye weke xwîne ye. Her mêşeke wê weke gurekî birçî ye... Weke ewr bi ser mirov de digirin û xwîna leşê mirov hemûyî dimêjin. Dişewite keko, dişewite... Werin, vê mekin. Li rewşa min binihêrin. Min bidin ber çavan. Werin, vê mekin. Ava wê pîs e, gemarî ye, weke xwîne ye... Merin hevalno. Gotinên min peyvên hevaltiyê ne, şîreta bavan e. Li rewşa min binihêrin, birçî bimirin, dîsan jî neçin. Ji birçîna bimirin dîsan... Kar heye, pere heye, nan heye, şîrê çivîkan jî heye; tu çi baxwazehaye, lê mirin jî heye. Perîşanî û belengazî jî heye. Ta jî heye, êşa zirav jî heye. Li rewşa min binihêrin... Çûkûrova dişewite, dişewite... Bi a min bikin û meçin.

Husik:

- Çara wê tune ye, em bimirin jî dîsan em ê herin.

Mehemed:

- Em ê herin.

Husik:

- Mirin ji tunetiyê çêtir e. Ta ji belengaziyê çêtir e. Êşa zirav ji tunetiyê çêtir e.

Mehemed:

- Em ê herin, got.

Ûsiv:

- Li rewşa min binihêrin, got. Ez naçim. Ger carek din ez herim, wê li wira meytê min bimîne. Xwedê neke. Ez carek din narim. Ez ê pel û qaşilên daran bixwim, lê ez naçim.

Mehemed:

- Em ê herin, got.

Husik:

- Mirin ji tunetiyê çêtir e. Em ê herin, got.

Ûsiv:

- Li rewşa min binihêrin.

Wî bi destê xwe yê rastê her zikê xwe nîşanî wan dida. Zikê wî weke zikê jineke avis bûbû. Stûyê wî weke şivekê zirav, lêvên wî yên qalind qelişî û perçivîbûn û di rûyê wî de piça xwîne nema bû.

Ser û binê wî perîşan bûbû. Pehniyên lingên wî yên xwas perçivîbûn, bûbûn weke lastîkên otomobîlan.

Husik:

- Mirin heye veger tune ye, got.

Ûsiv:

- A min şîreta hevaltiyê ye, got. Her mêşeke wê...

Husik:



- Tu bi Xwedê kî bes e Ûsiv, got.

Ûsiv carek din devê xwe venekir.

Lihêfên wan yên pînekirî li piştên wan bûn. Dasên xwe jî xistibûn ber piştên xwe û li bendî Mehemed rawestiyabûn.

Mehemed bi jina xwe re dipeyivî. Dû re:

- Di xweşiyê de bimîne, wî got û meşiya.

Jina wî bi dû wî de:

- Zad hemû riziya, got.

Roj bilind dibû. Ew dereng mabûn. Ketin rê. Heta ku exa spî ya xaniyên gund ji ber çavên wan wenda bûn jî, ew li pişt xwe dizivîrîn û li gund dinihêrîn.

Ew wisa dimeşyan, ku ax di binê lingên wan de diherifi.

Dengek ji pişt wan hat. Ew sekinîn. Dîtin ku Ûsiv bi bazdan bi dû wan de tê. Heta ku Ûsiv gihîşt ba wan ew ji hal de ketibû, bêhna wî diçikiya.

Ûsiv:

- Hela rawestin, got. Ez hebekî bêhna xwe berdim. Ez ji gund heya vir bi bazdan hatime.

Li Ûsiv civiyan. Piştî Ûsiv hebekî bêhna xwe berda û bi ser hişê xwe de hat, got:

- Ez fikirîm, ez hizirîm, ez bi dû we de hatim. Kurdan gotiye, mirin mirin e, ev xirxira han çi ye! Mirin mirin e...

Bimeşin.

Asman çikî sayî bû. Ew deşta dûz di bin lingên wan de diherifi. Çaxa ku ew di kêleka erdan de derbas bûn, daqûl bûn û destên xwe li nav erd gerandin.

- Xêr tê de tune ye, wan gotin. Çê nabe...

Mehemed:

- Ku xêr tê de hebe jî ji çi re dibe. Bostek e.

Biçine, biçine dest namîne, neynûk namîne. Zadê jê tê jî du kulm in. Ma ku xêr tê de hebe ji çi re ye.

Husik:

- Bila tunebe, got.

Aşik Alî:

- Ku heba baş dibû, got. Ji qet tunebûnê çêtir e.

Ûsiv:

- Bila Çûkûrova di bin erdê keve, got.

Yên din kenyan.

Ew gihîştin Akpînarê. Li wir rûniştin û bêhna xwe berdan. Av vexwarin, ser çavê xwe şuştin. Bi carekê ve lê nihêrîn ku ew ji xwe re çi bibînin, şivanê Keklikoğlu Mehemedê Zarok di ber wan re derket.

Husik:

- Xêr e Mehemed, got. Tu li van deran çi digerî?

Mehemedê Zarok:

- Ez diherim, got. Ez ê herim Çûkûrovayê. Min çûyîna we bihîstibû, ev du rojên min in, ku ez li vir, li bendî we me. Ez ê herim êdî. Bila êdî Axa ji xwe re şivanekî weke min bibîne. Min xistiye serê xwe, êdî ez ê herim.

Mehemedê Zarok zeyif, weke şivekê bû, lê dest û lingên wî mezin bûn.

Aşik Alî:

- Te baş kir Mehemed, got. Min bihîstiye nebihîstiye, tu li ber deriyê Keklikoğlu ye.

Husik:

- Ne heq, ne tu tişt, ne wilo?

Mehemedê zarok:

- Ez mirim, got, ez ji canê xwe aciz bûme.

Husik:

- Her roj jî lêdan...

Aşik Alî:

- Tu ê xelas bibî, got.

Mehemedê zarok:

- Ma ew ê li Çûkûrovayê mafê min bidine min?

Aşik Alî:

- Çûkûrova jî ya Keklikoğlu ye, got.

Husik:

- Hela hela, got.

Mehemedê zarok:

- Mafê min, got.

Mehemedê din:

- Metirse, got.

Mehemedê zarok:

- Ez ê cotek gayê quloçmezî bikirim, got.

Ûsiv:

- Çûkûrova di bin erdê keve, got.

Aşik Alî:

- Paş de vegere!

Ûsiv:

- Çavên sedemê kor bibe, got.

Mehemedê mezin, yanî Mehemedê din:

- Xwişkek min heye, got. Layiqî Çûkûrovayê ye. Keko, ez çî dibim bila bibim, lê xwişka min layiqî Çûkûrovayê ye. Xwişka min wilo ji min hez dike ku... Em ê rast herin çiftlikê. Xwişk di ser xwişka min re li Çûkûrovayê tune ne. Em ê heya payizê li çiftlikê bixebitin.

Meşiyân, şevêkê li çûkûrovayê razan. Ji wir ketin rê:

- Gund di ser gundên Çûkûrovayê re tune ne, gotin. Ew yekemîn gund in, ku ji xerîban hez dikin.

Ew di riya dûz de meşiyân, bi ser serkaş ketin, daketin bin serkêş. Li ser zinarekî rûniştin û nan û çolika xwe xwarin. Bêhna zenbûrê a xweş ew dêhn kirin. Paşê wan xwe dirêj kirin û cigarên xwe kişandin. Ew ji Mazgaçê derbas bûn. Daristan dixuşxuşîn. Li ser girê Çîçekê çadirên koçeran dîtîn. Ji çadiran dûxan pêl dibû. Keçikên pêşmalsor dew diki-lan. Li sigîngaçê li hemberî wan Kurdekî pêxwas û serqot, di gel jina xwe û pênc zarokên xwe kerek di ber wan de bû û dahatin. Jina yê Kurd û her pênc zarokên wî wilo zeyif bûn, ku te pif bikirayê ew ê biketana. Li ser wan tu tişt nema bû. Te digot qey ev çil salên wan e di xelayê de ne. Silav da wan û derbas bûn.

Bi kurtebiriya gotinê, piştî rêveçûna du rojan ew gihîştin çûkûrovayê. Ava Savrûnê bi xuşîn diherikî, zelal...

Li jorî Dîkîrlînê, li bin darekê xewa xwe şikandin. Gava ew hişyar bûn, roj ber bi ava diçû.

Mehemedê zarok çavlixew, bê deng hêdî çû ba Mehemedê din. Devê xwe bire ber guhê wî û hêdî:

- Apê Mehemed, got. Li vir mafê min naxwin ne?

Mehemed:

- Metirse, got.

Mehemedê zarok bi kêf:

- Tu bi rastî dibêjî? Ma ew ê li vir mafê min bi temamî bidine min?

Mehemed:

- Ez ji te re dibêjim, metirse, got.

Mehemedê zarok:

- Ez ê cotek ga bikirim, got, cotek gayê quloçmezin. Ez ê pîrr bixebitim.

Mehemed:

- Ez ê te emanefî xweha xwe bikim. Tu ê jî xwe re kar bikî.

Mehemedê zarok:

- Mafê min... got.

Mehemed:

- Metirse, got. Di vî welatî de di ser xweha min re tune ye.

Wan lihêfên xwe pişt kirin. Aşîk Alî tembûra xwe ya serî bi gulî xiste destên xwe.

Mehemed:

- Çiftlik li vê jêrê ye, got. Em ê niha bigihênê. Ku xwişka min, min bibîne ew ê jî kêfa dêhn bibe. Wê li zarokan bipirse. Ew ê li jinikê bipirse. Wê çend sal berê du kirasên nikenû dabûne jina min. Koroxliya me hê jî wan kirasan li xwe dike. Ku em niha bigihên wir ew ê me bifermîne hundir. Ew ê karê herî baş bide me. Em ê heya payizê bixebitin.

Husik:

- Xwehên wenî li Çûkûrovayê nayêne dîtin.

Mehemed:

- Ku axa rojê yekê bide xelkê, ew ê rojê yek û nivê pê bide dayîn. Ji bo we jî wê bêje, ev hevalê Mehemed in.

Aşîk Alî:

- Xwedê bike ku wisa be.

Mehemed:

- Weke xweha min tune ne. Hûn ê niha bibînin. Çer ku em bigihêjin wir ew ê nên derxîne.

Mehemedê zarok:

- Mafê min...

Mehemed:

- Metirse.

Mehemedê zarok:

- Yên quloçmezin...

Mehemed:

- Ez bi qurbana xweha xwe bim. Ku ceger bi axê re hebe, bila mafê kesî bixwe. Xweha min wê derkeve hemberî wî û wê bibêje, jî Xwedê şerm bike, ma mafê van belengazan tê xwarin?... Hingî wê axa bi lez derxe û bide.

Aşîk Alî:

- Ger wilo be divê mirov xwe jî xwehên wilo re bike bi qurban.

Mehemedê zarok:

- Yên quloçmezin...

Husik:

- Ez ê quloçên mezin di diya te kim, got. Quloç, quloç!

Mehemed:

- Dev ji lêwik berde, Hosik, got. Wî xwe dîtiye nedîtiye ew li ber deriyên xelkê ye.

Aşîk Alî:

- Dest lêwik medin, got.

Mehemedê zarok:

- Ez ê pîrr pîrr bixebitim, got.

Mehemed:

- Cotek gayên mezin hebûn, got, min wek çavên xwe li wan dinihêrî. Xweha min digot, di nav Karkeran de yê ku wek te li gayan miqate ye tune ye. Xweha min weha digot. Gava ez ji wir hatibûm, gayê min ê zer giriyabû.

Aşîk Alî:

- Hela, hela, got, hela hela Mehemed!

Mehemed:

- Ger ez derewa dikim, ez xêrê ji zarokên xwe nebînim. Gava ez hatim wî stûyê xwe xwar kir û xwe alast. Hûn ê niha bibînin. Ku gayê zer min bibîne ew ê min nas bike. Ew ê ji kêfa di cihê xwe de bileyize û biûre. Hûn ê niha bibînin.

Aşik Afî:

- Xwedê bike wilo be, got

Mehemed:

- Ilim jî xweha min, got. Em ê bi saya serê wê bi hêsaniyê peran qezenc bikin.

Mehemedê zarok:

- Ez ê jî cotek ga bikirim, got. Cotek gayên ku ji min hez bikin.

Husik:

- Tu ê bikirî, got, tu ê bikirî..

Aşik Afî:

- Dest lêwik mede Husik, got. Roj nedîtine hîn, çenikek zarok e...

Husik:

- Em destê nadin...

Mehemed:

- Zikên Karkeran sal donzdeh meh bi şorba mirmirrkê dinepixin. Xweha min nanê bi goşt û rûn dide min. Xweha min evqasî ji min hez dike.

Ew ketin hundirê çiftlikê. Hewşa çiftlikê tije traktor, zadçin, erebeyên hespan, kamyon û jîpên hêşin, sor û zer bûn. Di bin tava rojê de dişewitîn. Massey-harris û Ferguson, makînen bi markeyên cûrbecûr... Çend peyayên kinçbiyax bi tebatî li dor wan makîneyan diçûn û dihatin.

Mehemed:

- Wa ye xweha min, got, û meşiya.

Şelwerekî reş li xweha wî bû û emir dida naneşîrî tenûrê. Xweha wî yeka qûnmezîna û dagirtîbû. Ji enîşka wê heya bi bazîne destên wê tijî bazînen zêr bûn.

Mehemed ber bi wê çû, çû ba wê tu nemabû ku ew li hev biqelibiyana. Xweha wî hîç guh nedayê. Mehemed şaş û ecêbmayî mabû, hîna jî dikeniya. Her çar hevalên wî li wir rawestiyabûn, geh li Mehemed, geh jî li xweha wî dinihêrin.

Mehemed xwe negirt:

- Xwişkê, got, ez Mehemed im...

Jinikê ew wilo di çav re derbas kir.

Mehemed:

- Xwişkê, got, ez Mehemed im, Mehemedê pale... Ma nayê bîrate ku min bi gayê zer cot dikir. Em hatine paleyiyê xwişkê, ez Mehemed im.

Jinikê serê xwe rakir, li wî nenihêrî û zîvirî ser pîrekên naneşîrî.

- Nanekî bidin ev ê han, bila here, got.

Jineke naneşîrî nanek dirêjî Mehemed kir, ew nan wilo di destê Mehemed de ma. Te digot, qey te ew di ava kelendî dakiribû, Xwîna di laşê wî de hemû ziwa bû. Rûyê wî reş û zer bû.

Bi hêdîka:

- Xwişkê, got, xwişkê, ez Mehemed im. Mehemedê Pale. Gayên zer. Ma nayê bîra te, gava ez çû bûm wan stûye xwe zîvirandin... Gayên zer li ku ne?

Xwişkê bê ku lê binihêre, piştî xwe dayê û ber bi malê ve meşiya.

Mehemed jî vê ecêba han tiştêk fêhm nekir, bi gêjî nan di dest de û li hevalên xwe zîvirî.

Hevalên wî tu tiştê jê re negotîn, lê dû re Aşik Afî:

- Guh mediyê, Mehemed, got. Vir Çûkûrova ye. Ne ku em nizanin. Guh mediyê. Xwezî te karîbûya gayên xwe yên zer bidîta-na. Kî zane bê wê belengazan çiqas kêfweş bibûna.

Ew çûn aliyê çiftlikê yê din, piştta xwe spartin dîwêr û rûniştin. Hosik girs bû, bi qasî du peyan bû. Aşîk Alî zeyifokî, Mehemed dirêj bû.

Gava lawikekî bi tilûmê bi yax û qetiyayî di ber wan re derbas bû, çavên wî li Mehemed ketin. Lawik ber bi wan ve reviya.

- Hoo apê Mehemed, tu bir xêr hatiyî, tu bi xêr hatiyî, got û çû destên wî.

Lawik di huvdehan de xuya dikir.

Min wer bêriya te kiribû, wer bêriya te kiribû, ma tu li ku mayî?

Ev du sal berê bû ku tu çûbûyî, ne wilo? min wer bêriya te kiribû, min bi xwe xwe digot, ew li ku be wê rojekê derkeve û were. Tu bi xêr hatî, tu bi xêr hatî. Lawik kirî ji kêfa bifiriya. Pir şukur apê Mehemed, pir şukur ku min tu dîtî. Min digot, çawa be tu ê rojekê werî, a va tu hatî.

Mehemed:

- Hela rûnê, got.

Lawik rûnişt.

Mehemed:

- Zero, te bihîst bê xweha min çi bi serê min de anî ? Min qet bawer nedikir ku dê xweha min weha be. Min ev ji diya xwe dipa, lê min ji xweha xwe nedipa. Gava pale bi xwarina şorba mirmirkê zikê wan dinepixî, xweha min nanê bi rûn û goşt dida min. serê xwe hejand. Min ev hevî nedikir. Min di xewna xwe de bidîta, min ê bawer nekira. Ev çi îş e? Ez şaş mame Zero...

Zero:

- Mepirse apê Mehemed, mepirse, got. Tiştê ku li vir dibin tu bibihîzî wê devê te ji hev bimîne. Xwişkê ne xwişka berê ye. Bi tenê ez li çiftlikê mame. Tu kes nema ye. Xwişkê yên din hemû qewirandin.

Mehemed:

- Min bawe nedikir, got. Min bawer nedikir...

Zero:

- Xwişkê hate dizîn, got. Dibêjin, ku ew bi dildariya reş ketiye.

Mehemed:

- Çiîî?

Zero:

- Çirka ku ew motor hatine, ew evîndar bûye ye. Motoran ew dizîn. Dil ketiye motoran...

Mehemed:

- Wey xwehingê! got.

Zero:

- Her sibeh, hema ku ji xew radibe, radihêje satilek av û qalibek sabûn, dihare ser motoran û teker û motorên wan dişon û wan pakij dike. Ku ew piçek herî û toz li wan dibîne, ew dêhn dibe. Ew her rojên Xwedê wan dişot. Dibêjin ku dilê wê ketiye tirimpêlan.

Mehemed:

- Wey xwehinga min, got.

Aşîk Alî:

- Zor e, got. Xwedê neyne serê kesî. Evîndarî zehmet e.

Zero:

- Ji roja ku tirimpêl hatine, ew nabêje ne zivistan e, ne pûk e, li ba şofêr siwar dibe û

dihare nav zeviyar. Ew her rojên Xwedê wilo dike.

Mehemed:

- Ez nas nekirim, got. Wey xwişka min a belengaz. Qey wa ye ha! Ji evindariya ku tê gotin zortir e. Wey belengazê...

Zero:

- Ne dêhn e, got, ew dîsa weke berê ye. Ew evîndar bûye, çawa te nas nake?

Mehemed:

- Min bawer nedikir. Ev qet nedihat hişê min. Wilo be, hişê wê li serê wê ye, lê evîndariya reş... Xwedê şifa xwe lê bike...

Zero:

- Tiştên li vir dibin tu bibihîze! Rojê hezar pale tîn û hezar diçin. Pale weke lavlakê ne. Kar tune, hal tune... Xwişkê jî şaş maye. Arvan tîr nake, nan tîr nake. Tenê bide, bide, bide.

Aşik Alf:

- Wilo ha!

Zero li Mehemed zîvirî:

- Ku hayate bigihîje tiştên ku dibê... Ku tu bi vî karî bihesî... Welî axayê kal, Dûrsûnê kût...

Mehemed:

- Çi bi Welî Axayê kal hatiye? got.

Zero:

- Qet mepirse, got. Tiştê ku bû bi wî bû, qet mepirse.

Mehemed:

- Rûyê wî bi nûr bû, got. Kar jî dikir, mirov digot qey xortekî bîst salî ye.

Zero:

- Çû, got. Hemû çûn, bi tenê ez mame. Li

Welî Axayê kal mepirse...

Mehemed:

- Min di mereqê de mehêle. De ka bêjê bê çî bi wî hatiye?

Zero:

- Apê Mehemed, got. Gava ev tirimpêl hatin, axê em hemû qewirandin. Hemû vekîşiyar û çûn. Welî derket hemberî axê û got, axa, ji Xwedê bitirse, ev çil û pênc salên min in, ku ez li ber deriyê te me. Ji Xwedê fedî bike axa, min riha xwe li ber vî derî spî kir. Piştî min li ber vî derî tewiya. Ez ê piştî vî emrî bu ku de herim. Ez ê çî karî bikim? Di vî goristanê de jina min radizê, diya min radizê, sê zarokên min radizên. Axa, wê Xwedê keviran bi ser te de bibarîne. Vê zulmê meke. Axayê gawir, min tu di hemêza xwe de mezin kir, min tu lorand û mezin kir...

Hîn gûyê te di nava neynûkên min de ye. Ez ê piştî vî emrî bi ku de herim? Lê, apê Mehemed, wî wisa got. Giriya, gazin kir, xeber da, li ber geriya, du rojan li ser vî kevirî rûnişt, riha xwe rûçikand, nifir kirin. Nedibû, ew kete rê û çû. Çirka ku ew çûye jî tu xeber jê tune ye.

Mehemed:

- Çi peyakî baş bû, got. Lê Dûrsûnê kût?

Zero:

- Ew niha di hepsêde ye. Ew bû ye hepsî.

Mehemed:

- Hela li kûto binihêrin kuro, got, mirov qet bawer nedikir.

Zero:

- Axê hemû pale dane hev, êdî ji we re kar nemaye, got. Oxira we a xêrê be, got. hemû çûn. Kûto jî çû. Mehek du meh di navberê de derbas bû, me dît ku serê tirimpêla Massey-Harris tune ye. Serê wê jê kiribûn û biribûn.

Tirimpêla mezin mir. Weke dêhnan li axê habitûbû. Çû hukûmetê, çû cem walî, çû Ankarayê. Dû re Kûto li cihekî gotibû, min weha û weha kiriye. Hukûmetê ew girt, lê xist, ew dane elektirîkê. Kûto gotibû, ji ber ku axê ew birçî hiştiye, wî ji îlada axê re wilo kiriye. Gotibû, oxx, min tola xwe hilanî. Wî Serê makîne jê kiribû û avêtibû cihê Anavazayê yê herî kûr. Gotibû, ku êdî ez bimirim jî ne xema min e...

Niha ew li hepsa Adanayê radizê. Axa geriya negeriya serê tirimpêlê nedît.

Tirimpêla Massey-Harris mir.

Mehemed:

- Çi li ba xelkê heye, got. Kûto qet nedipe-yivî, tim difikirî...

Zero:

- Hemû çûn, bi tenê ez mame. Ez ê jî biçûma, lê hostê got, ev ji kar re dibe. Ez ê bim şofêr. Ez li ba hostê dixebitim.

Mehemed:

- Gayên zer, got.

Zero:

- Axê ga hemû firotin. Gayê te yê zer û gayê mor jî kirin qurban. Ev makîne heye ya, ev makîna mezin, jê re dibêjin, zadçin, roja ku axê ew anî gayê zer û gayê mor li ber tekerên wê serjêkirin, jê re kirin qurban. Xwîna wan di bin tekerên wê de herikandin. Lêê, gayê zer ji makîne re kire qurban...

Mehemed fikirî û di cihe xwe de sar ma.

Zero:

- Ev heye ya, ew hem diçine, hem jî dukute, hem jî dixê çewalan û dide destên te.

Êdî kar nema. Rojê hezar pale tèn û hezar diçin. Dilê mirov bi rewşa wan perçe perçe dibê.... Dilê hostê jî bi wan dişewite... Van tirimpêlan hemûyan bişkîne, bişewitîne, dibêje, here ba Kûto... Dilê hostayê me pîrr bi rewşa

van paleyan dişewite.

Aşik Alî:

- Peyayekî baş bûye, got. Kî be ew ê ji dewlemendan hez bike. Divê mirov ji belengazan hez bike.

Zero ji cihê xwe pekiya:

- Hûn niha birçî ne, ez herim ji we re xwarinê bînim.

Piştî kurtedemekê Zero di gel qûşxanek şorbe û heft heş nanê somin vegeriya.

- Ku Darendî li vir bûya min ê ji we re helaw bianiya, lê ew ne li vir e.

- Spas, weke ku te anîbe, gotin.

Piştî ku wan nanê xwe xwarin, derketin derveyî çiftlikê. Lihêfên xwe kirin wek behîfan û razan.

Adinî rojê, sibehê zû dişan Zero şorbe û nan anî.

- Apê Mehemed, got. Hosteyê me peyayekî baş e. Ji bo ku karekî bide we ez li ber wî geriyam, lê kar tunebû.

Mehemed:

- Spas, çawa be em ê ji xwe re karekî bibînin.

Zero stûyê xwe xwar kir.

- Xwedê bike, got.

Rojê weke komek bizot, fûrêjen xwe berda herçar alî û spîsor derket. Bi rê de kamyonên bi bar, traktorên ku erebeyên naylon avêtibûn dî xwe, erebeyên hespan, zadçin, jîp, otomobîlên axê, yê modelên dawî ku dibiriqîn, bi refan paleyên stûyên xwe kişandibûn nava milên xwe û derbas dibûn. Heya niha hume guma ku li Çûkûrovayê nehatibû dîtin der û dor dadigirt. Hey û hûyek ecêb hebû.

Siyên wan ên dirêj di pêşiya wan de dimeşyan û ser û binê wan di tozê de mabû. Li

milê rastê yê rê jineke rû nuxumandî dîtin. Jineke weke miriyeyekê, parsûyê wê ketibûn hev û di nav wê zeviya biçûk de hêdî hêdî dizivîrî. Ne sîwanek wê hebû, ne jî holika wê.

Ewrekî ji tozê li hewa çêbûbû. Ew di nav toz û dûxanê de dimeşyan. Toza ku dida gîzoka wan, lingê wan dişewitand. Ew hêrs bûn, her yekî di tenga xwe de xeber dan. Her ku diçû Êsiv bêhaltir dibû.

- Çûkûrova di bin erdê kevc, gotin.

Siyên wan kişiyabûn bin lingên wan. Tî bûbûn. Di havîna Çûkûrovayê de av ji ku hatiyê? Zimanê wan bi ezmanê devê wan ve zeliqî bû. Bi hêviya ku ew ê avê bibînin, meşyan. Li wan deran ne gund hebûn, ne jî tu tişt...

Bi refan pale di ber wan re derbas dibûn, bi keder, westiyayî, mehfûyî, stûxwar, destên wan li ser newqên wan, ji tozê tenê çavên wan dixuyîn, diranên wan dibiriqîn. Bi gepên xwe yên kortbûyî, goreyên neqîşandî û qetiyayî li wan, peyayên ku ji piştên wan xwêdan diherikî... Silav dan û silav girtin.

Roja li ezmên, mêjyên wan dikeland, ew mehû kiribûn. Ji aliyekî tîbûn, ji aliyekî westandin, ji aleyikî jî acizbûn.

Ji dûr ve, ji aliyê dengê zadçinê ê wî alî, cotkarek dîtin.

Aşik Alî:

- Haydên, got, em herin wir. Ger av bi wî re hebe ew ê bide me. Pê li pûşê ku zadçinê davêt vî alî wû wî alî kirin û derbas bûn. Ji roja ku li pirêzê û qirşikan dixist, mirov nikarîbû çavên xwe vekira. Wan nikarîbûn çavên xwe vekirana û binihêrina.

Wan jî dûr ve silav dan.

Mêrik, jina xwe û di gel herdu keçên xwe yên donzdeh salî hespên xwe spartibûn ber pûş û pûş bar dikirin. Ser çavên wan di tozê de mabûn. Mêrik gomlegê xwe ji xwe kiribû û bi tevgerê xurt pûş davêt, jin û zarokên wî jî

ew pûş bi cih dikirin. Hespan serê xwe xistibûn nava pûş û kirtekirta wan bû pûş dixwarin. Mêrik melêva di destên xwe de avêt ser pûş û hate ba wan. Pirça sînga wî ya dirêj spî bûbû, damarên destên wî nepixî bûn. Wî bi pişta destê xwe xwêdana ser çavê xwe pakij kir.

Aşik Alî:

- Em tî bûne, got.

Mêrik ji kûpê di erebê de satilek av dagirt. Bi lez, beyî ku bêhna xwe berdin av vexwarin.

Aşik Alî:

- Em şewitîn, got. Em şewitîn, lê em neçûn ba vanên ku tirimpêlan dajon û me av ji wan nexwest. Ev mirovên ha bi min ecêb tî. Bi çavekî biçûk li mirov dinihêrin.

Mêrik:

- Kerem bikin, rûnên, got.

Aşik Alî:

- Bi ruhên yên ku çûne, got.

Hosik:

- Navê te bixêr?

Mêrik:

- Navê min Xelîl e, got.

Hosik:

- Ev Aşik Alî, ev Mehemed, ev jî Mehemed, ev Êsiv û ez jî Hosik im.

Mêrik:

- Kar tune, got.

Aşik Alî:

- Em nû hatine, em li kar digerin, got.

Mehemed:

- Maşalê em karekî bibînin.



Mêrik:

- Êdî ji me re nan nemaye.

Aşîk Alî:

- Ez şaş mame, got.

Mêrik:

- Axê xeber şandîye, gotiye, bes e ev li ser piştê min dijîn. Gotiye, ev sî sal in, ku ew van erdên min weke malên bavê xwe dajon. Gotiyê, bila êdî ji nav erdên min derkevin. Axê gotiye, bes e êdî ya ku ez ji destên wan dikişînim. Ji me re kar nema, divê mirov kîsek kevir bi stûyê xwe ve girê bide û xwe bavêje avê. Jê pê ve tu rê nemaye.

Aşîk Alî:

- Ev tiştêkî ecêb e, got.

Mêrik:

- Ev sî salên min in, ku ez vî erdî dajom. Di her bostek vî erdî de golek xwêdana min heye. Min digot, wê wilo here. Min digot, qey em ê her û her karibin erdê axê ji xwe re deman bigirin. Min mala xwe xerab kir û wilo bawer dikir. Ji xwe ji bi dardekirinê û ji kuştinê wê de tu çara me nema ye. Zulum e...

Aşîk Alî:

- Ne zulum e, mirin e, got.

Mêrik:

- Mirin e, got. Ji mirinê jî xerabtir e. Ew ê sibehê motora sor bîne bixîne nav... Di her bostekê de golek xwêdana min heye.

Aşîk Alî:

- Rast e, got. Ji mirinê jî xerabtir e.

Mêrik:

- Ez ê ji niha pêve karibim çî karî bikim? Ez ê beyî erd karibim çî karî bikim. Zulum e. Ê wî dîsa zad neqede jî, erdên we hene, cî û warên wan hene...

Aşîk Alî:

- Heye, got.

Hosik:

- Xwezî tunebûya, got.

Aşîk Alî:

- Wa mebeje, heyê, got.

Mêrik:

- Bila ê min jî maleke ku min serê xwe texistayê û pariyek erdê min hebûya, bila ez ji birçîna bimirama. (Serê xwe kil kir) Axx, ku ê min jî... Niha ez ê çî bikim? Ax ev gawirê Amerîka, ax ev muhendîzê mareşal... Zulum e...

Aşîk Alî:

- Gava deriyek tê girtin, yekî din vedibe...

Mêrik:

- Bila venebe, got.

Aşîk Alî:

- Çawa be wê vebe.

Mêrik:

- Deriyên ku vebin nemana ku, hemû hatin girtin.

Aşîk Alî:

- Wê vebe.

Mêrik:

- Gava hûn di vir de hatin we dît. Jinikek heye, bi serê xwe halet dajo.

Aşîk Alî:

- Me dît.

Mêrik:

- Berî niha bi sê salan lingê mîrê wê di ber patoza axê de ma. Jinik bi sê zarokên xwe ve li vê deştê ma. Zarokên bi tayê, zarokên bi êşa

zirav... Axê ji wan re jî gotiye, ji nav erdê min derkevin De bila Xwedê deriyekî veke... Ma deriyên ku bêne vekirin mane?

Aşîk Alî:

- Ez çî zanim, got. Xwedê gewriya ku qul kiriye vala nahêle.

Mêrik:

- Bila vala bihêle, got.

Hosik:

- Wer vala dihêle ku...

Zarokên ku li ber siya telîz razabûn, giryan.

Mêrik:

- Keçê, got, werin bîskê bêhna xwe berdin.

Jinikê û herdu keçikên xwe melêvên xwe danîn û hatin ba wan. Rûyê keçikan wek bi-zotên êgir sor bûbûn. Piştî ku têr av vexwarin, hatin û rûniştin. Jinikê rahişt zaroka xwe, piş-

ta xwe da wan û pêşîra xwe xiste dev.

Aşîk Alî:

- Rabin zarono, got, em alîkariya hevêl bikin.

Ji bilî Ûsiv hemû rabûn. Di hundirê saetekê de hemû pûşê gidîşê avêtin û hatin di bin holikê de rûniştin.

Mêrik:

- Xwedê kêmaniya we nede birano, got.

Jinikê jî ji meşka ku bi mirdiyaqê holikê ve bi dardekirî bû dew derxist û dawerivand.

Gîşa vexwarin.

Gava ji hev veqetiyên mêrik:

- Hûn kêmaniyê nebînin, got. Maşalê hûn ji xwe re karekî bibînin.

*Dûmahik heye.*

# FATIH MUDERIS

---

## Dilower Mêqerî

• *Sala 1922 an li herêma Helebê ji dayik bûye.*

• *Wênekêş î li Parîsê û Romayê xwendiyê.*

• *Wênekarî, peykarî, kurteçîrok û rismên pirtûk û rojnameyan, kiriye.*

• *Sala 1951 ê xelata sêyemîn wergirtiye û sala 1952 an ya yekemîn.*

• *Pêşangehên taybetî li welatên Ewrûpayê pêşkêş kiriye û bi hunermendên navneteweyî re beşdarî gelek pêşangehan bûye. Rexnegiran pirr li ser nivîsandiye.*

• *Di destpêka salên heftêyî de serokê Elmanya Federal Valterschell pêşwaziya wî kiriye û xelata herî buha li welêt pêşkêşî wî kiriye*

• *Niha ew li Sûriyê serokê sendîka hunermendan e û mamosteyê zanîngeha hunermendiya spehî ye.*

Bi serdana wênegeha. F. Mûderis ya li taxa "Tulyanî" ku di dilê şama bazirganî de ye, mirov sêrdar û matmayî dimîne. Odeyeke biçûk û teng, behemine belavbûyî li kuncikan

û hunermendekî mezin, ku ji simbolên tevgera hunemendiya spehî û nûjen e. Di wênegeha xwe de -gelek caran- pêşwaziya seredanên xwe ên Kurd dike. Di cih de resimekî dertîne, Kamiran Bedir-Xan û Anton Seadê serokê partiya Sûriyê ya neteweyî şanî wan dike û dest bi lêkolîna bîranînên xwe ên li gel Kudan li Beyrûdê û li cihên din, dike. Ji nişkê ve xwe bi pêlên muzîka Kurdî ya klasîkî re berdide. Ji mêvanan şerm nake, bi rewan û hunermendî radibe ser piyan, dest bi govendê dike. Zokê ku di nava wî de razayî ye hêdî şiyar dibe. Paşeroj û zarotiya ku bi bend û rewîştan hatibû dabeşkirin dilive. Ew rewiştên ku F. Muderis ji cîhana destanên çiyayî, ji razên daristanên qîz yê ku zaroktiya wî hemêz kiribûn li herêmên Kurdan bi dûr xist. Hunermend F. Muderis, çavê xwe li wê çarmedorê vekiribû. Çiyayên bilind yê rengo rengo, hîm û tehtên giranî, daristan û darên zeytûnan, yê ji keskê tarî, xwendina bibilan, xuşe xuşa çem û rûbarên tar û mar li tevî lorandina dayika wî dibûn Dayika çiyayî û dilovan, ya ku bi zimanê zinar û sipanan, bi alfabe destanan jê re dilorand. Loma Fatih Muderis hê ji bî nekiriye.



*Xebatek F. Muderis*

Bavê wi kurdên Helebê û ji malbateke maldar bû. Di dema Osmaniya de erd û desthilatdariya wan digihişte herêma Kurddaxê. Li Kurddaxê bavê wî keçeke Kurd ji malbateke cotkar nas dike, jê hez dike û wê bi dizî mehr dike. Bi dû ku malbata wî agahdarî vê bûyerê dibin, li hember radiwestin û didin diyar kirin ku kirina wî li dijî rewîşt û rola malbatê ya civakî ye. Lewra bavê Fatih Muderis temenê xwe yê kurt buhayê vê evîna xwe dide, bi dev û destê malvata xwe tê kuştin. Wê gavê Fatih li ser destê dayika xwe bû. Deh salan di hemêza wê de û li gundê wî jiya, lê malbata bavê wî bi kotekî wî ji sînga dayikê bi dûr dixînin, wî belû bûbû. hê guman, wê perwerdiya wî ya pêşîn, ya di nav wê xurîsta efsanewî de bandûreke bêhempa li hişyarî û rapêrîna hestên wî kiribe. Ne tişteki ji ber xwe ye ku, di salên pênciyê de tabloya F. Muderis xelata yekemîn wergirtiye. Tablo bi navê gundê "Kefer Cenê" bû. Ev gundê Kurdî ku xwe li ser çiyayên bakur ramendadiye. Çiyayên rengareng di gel jena jîndarî ya hîm û berdand. Hîmên şirikî ên rewan, an hîmên wi sorê germ wisa rexnegiran bi gelemperî dan diyarkirin, ku tabloya Kefer Cenê di hunermendiya Sûriyê de destpêka serdemek nu ye. Dîsa di vê demê de Muderis hevçaxê xwe bi kurteçîroka xwe ya pêşîn ku di rojnameyên Şamê hatibû weşandin, mat û sermest kirin. Fatih Muderis ne resimkêşê yekemîn e ku derbasî cihana peyvên efsanewî dibe. Berya wî gelek hunermendên mezin hene mîna, Mikael Ancelo, Van Gogh û Pîccaso jî. Carcaran hunermend û wênesaz hest dike ku bi awayekî rêk û pêk hew dikare renckêşana xwe bi gewde bike û Fatih Muderis ev tirsahundirîni ji zarotiya xwe anîye, an di dema zaroktiya wî de vê tirsê di hinavê wî de cih girtiye. Renckêşana bi dayikê re hiştiye ku F. Muderis li gel hunermendiya xwe, xwe berde cihana

peyvvan. Hin rexnegir dibêjin, çîrokên Fatih Muderis weke çêtirîn wêneyên wî ne. Çeqûlê Nehnehê, Reşo axa çêtirîn çîrokên ku bi erebî hatibû nivîsîn. Di van herdu çîrokan de Fatih Muderis êrişî peywendiyên civakî dike. Van peywendiyên her gav mîna berevajiya rêxistina çînî ya koledarî yî paşmayî dibîne. Û ji vê dûrtir, gava ku bi qehremanên xwe re li dijî zordestiya neteweyî deng bilind dike. Her dem gundiya belengaz ji hêla biyaniyên ku ji Helebê hatine, têne perçiqandin. Ji bilî wênesazî û çîrokan Fatih Muderis helbest jî nivîsandine. Helbesta wî ya bi navê "Dêrsim" di salên weşana xwe de navdar û dengdayî bû. Di vê helbestê de derd, perîşanî û trajediya gelê Kurd li Kurdistana bakur, stemkariya Kemalîstan, yekbûna çarenûsa Kurd û Ermenan dide xuyanîkirin.

Fatih Muderis hunermendiya xwe bi surrealîzmê dest pê kir. Paşê di wêneya xwe de berî dide simbolîzmê. Di wêneyên xwe de her dem mijarekê bikarîne û bi şeweyê çareserkirina objektîv berdeham dike. Bi balkeşî û heves danûstendinê bi rengên sor re dike, bi pîlan û bi hêrs xêzan dikêşê. Di pêş ve birina tercubeyên xwe yê hunerî de û têgihîştina zîmanê nûjen û nûdem de, F. Muderis ji hunermendên yekta ye.

Di van rojan de, tevgera çandeyî li Sûriyê xwe amade dike ta ku şahiya 70 saliya Fatih Muderis li dar xînin. Di bin destên wî re nivşên hunermendan berê xwe didin asoya afirandin û nûkirinê. Ji wan jî hunermendên Kurd ên ku herdem li nik dilovanî û rewîştên F. Muderis dijîn. Lewra tevgera hunerî ya Kurdî herdem bi payebûn û serbilindahî li F. Mudri temaşe dike. Ew hunermendê ku ji çiya hatiye û herdem çiya mijareke bê hedan bû di wêne, çîrok û helbestên wî de...

Mamastayê Muzîka Kurdî;

# ARAMÊ TÎGRAN

---

Derwêş M. FERHO

**M**e hemiyana nav û dengê Aramê TIGRAN bihistiye. Muzîka wî di dîlan û govend, şahî û xweşî, dawet û cejnana de tîn guhdarkirin. Di rojên xweş de em li sitranên wî yên kêf û evînê, di rojên ne xweş de jî deng û stranên wî yên bi derd û kul dibihîzin.

Me ji ozanê mezin pirsî û wî çîroka xwe ji me re got. "Ev dibe çil û heşt sal ku ez disitrêm. Bê rawestan û bê westan ez li ser hunerê xwe xebitîm."

Dê û bavê Aramê TIGRAN ji ber zilma neyarên xwînxwar ji Silîva reviyane Binxetê, Kurdistanê bin destê Suriyê. Li wira bi cî dibin. Aram di sala 1934 de li Qamislo dibe.

"Di duwanzdeh saliya min de kilam û miqam li ser zimanê min bûn. Min disitrand û destê xwe jî pê re dihejand. Di dibistana Ermeni de min dixwend. Mamostanê muzîkê tim deh li sere dehan dida min. Paş qedandina dibistanê ez ji alîkî ve bavê min ji aliyê din ve li cîhazeke muzîkê geriyam. Min Ud dît û sê salan li ser xebitîm. Paş sê salan cumbaş derketin. Min ew stend û min xwe li ser wê fêhr

kir. Dengê wê bilind û zîz bû. Tam ji dengê min re bû. Dengê min li xelkê belav bû. Di bîst û sê saliya min de ez dawetî şahiyana kirim. Bi Kurdî, Ermenî, Erebî û Tirkî min disitrand. Ev huner û karê min ta niha jî berde-wam e."

"Bavê min dît ku ez roj bi roj pêş de diçim. Bi vê yekê bextewar dibû. Şîret li min kir: 'lawo, tu dengbêjî û sazbandiyê bernede. Dewran tîn û diçin lê huner dimîne. Tu hunerê xwe berde-wam bikê ewê rojekê bikêrî te bê. Tu poşman nabê. Ji van şîret û daxwazan pê de tişteki ji te naxwazim. Bizane ku huner û sen'et bazim û gustîlka zêr e di destê meriv de ye."

Bavê Aramê TIGRAN jê re soz dide ku ew helbestan binivîse û bide wî ku ew jî wan bike kilam. "Helbestên ku ji te re binivîsim bike ser muzîkê û ji hemî Kurdên dinyayê re bisitre. Ji ber ku wan ez ji bin zilm û zordestiya dijmin xelas kirim. Bila ew helbest û kilamên min bi deng û muzîka kurê min li nav cemaeta kurda belav bibin. Bila ew sitran ji cemaeta



*D.M. Ferho, Aramê Tigran (Foto: Îzolda Bagîrova)*

Kurd re bibin diyarî." Bavê Aram jê re dibe îlham û şîretkar. Aram jî gotina wî naşikêne û bi ya bavê xwe dike. Van gotinên din yê bavê xwe jî tekrar dike: "Em û Kurd jî berê de cîranên hev in. Orf û adetên me, rabûn û runîştina me, sitran û kilamên me, bûnc weke hev. Govendên me, dawetên me, kincên me jî hev ferq nakin."

Sala 1966 bû. Riya Ermenistanê ji her kesê Ermenî re vebû. Bi evîna welêt û hêviyên mezin, malbata Aram berê xwe da Ermenistanê. Li wira bi cî bûn. Kar dane wan û wan jî ji bo jiyana xwe bidomînin karê xwe kir. "Heta ku jurnalistên (xebatkarên) Radyo û Televizyona Beşê Kurdî Li Erîvanê ez dîtîm. Wan deng û muzîka min nivîsin û di radyo û televîzyonê de programên min çê kirin. Ji min xwestin ku di beşa Kurdî de bi wan re bixebitîm. Min bi temamî 18 salan ji radyo û tele-

vîzyona Kurdî re xizmet kir. Yanî ji 1967 ta 1985 li wira xebitîm. Qismê Erebi jî min dikir." Kasetên Aram tî çapkirin. Nav û dengê wî bi wê yekê li nav hemî Kurdan belav dibe.

"Hebûn û kultura Kurda heta neh-deh salan berê nehatibû nasîn. Ev nenasîn cihê xwe da nasîn û pêşketina vê hebûn û kulturê. Adet, muzîk, edebiyat û folklorê Kurdî jî êdî hate nasîn û cihê xwe yê giring girt. Sebebên vê yekê piralî ne:

a) Li Kurdistan hişyarbûneke mezin heye. Di hemberê dijmin de şerekî giran, yê çekdarî, jî bo serxwebûnê heye.

b) bi vî şerî re xebata kulturî jî bi awakî xurttir pêşda diçe.

c) Kurd di van salên dawîn de ji nav sînorên welatê xwe derketin û herweha ji nav sînorên dewletên dijmin, yê dewletên kolon-

yalîst jî, derketin û li dinyayê belav bûn. Nasîna kultura Kurdî li dinyayê bi saya vê civaka Kurd çêbû. Entellektuelen Kurd di vî warî de wezîfa xwe bi awakî baş kir û bi ser ketin."

Aramê TIGRAN hez ji hemî sitran û hemî miqamên xwe dike. Her gotinek wî, her helbestek wî û her lêxistinek wî li tîlên cumbaşa wî jê re biha nabîne. Hemî jê re bi qedr û giranbiha ne. Lê dîsa hin sitran jê re xwedî bîranîn û bi qedr in. Wek sitrana "Dîlberê ku li ser eşqê ye. Civakî ye. Edebî ye. Ev helbest evîna merivekî di hember jinê de bi awakî pîr xweş tîne ziman. Helbest ya Feqiyê Teyra ye. Sitrana Şev çû, helbesta Cigerxwîn e. Wî ev helbest di hepsê de nivîsî ye. "Dema ku Cigerxwîn çîroka xwe a hepsê ji min re digot kezeba min diêşiya. Min ev helbest li ser vê yekê kire sitran. Dema min ev sitran çêkir û digot dilê min ne diçû xwarinê û ne diçû vexwarinê. Di-

ya min pir aciz dibû. Lê çi bikim ez bi vê helbestê diêşiyam. Helbest bixwe li ser Kurdistane." Aramê TIRGAN dijminê mîletê xwe û dijminê mîletê Kurd yek dibîne. Dijmin eynî dijmin in. Ji ber vê yekê jî wî di sitranên xwe de jî ev yek aniye ziman. Sitrana "Lo lo pis-mamo, li hember dijminê xwînxwar qêrîn e, banga şer e. Ev helbest ji ya Cigerxwîne."

Sitrana "Elegez, helbesta helbestvanekî Kurd, Fêrîkê Usiv e. Evîna welat tîne ziman. Em hemî, Ermenî û Kurd tev, di bin hezar kul û derd de dijîn. Gelê me bindest û zilm dîtine. Çar aliyê me dijmine, lê dost kêmin."

Aram, bi muzîk sitranên xwe şerrê azadiyê dike. Ew ji bo azadiyê her rengê şerr lazim dibîne. "Şerê azadiyê pîrralî ye. Bi çandê ye, bi sitranê ye, bi govendê ye, bi nivîsinê ye, bi qelemê û şûr e wek ku pêşiyên me dibêjin. Ji ber vê yekê min helbesta Şehîd Firat kire sit-



*Derwêş M. Ferho, Aramê Tigran (Foto: Îzolda Begîrova)*



ran û got. Ev helbest li ser şehîdê nemir Firat hatiye nivîsîn. Firat şervanekî hêja bû. Ew di sala 1990 de di şerrê dijî dijmin de li Kurdistanê Bakur şehîd ket.

Li ser rewşa muzîka Kurdî ewha difikire Aramê TIGRAN: "Muzîka Kurdî di van salên dawî de pirr zengîn bû ye. Lê, mixabin, rûhiyeta muzîka Kurdî tê de kêr bû ye."

Bi ser vê qasê de jî Aram ji bo xwe weha dibêje:

"Meraq eynî meraq e. Dil ew dil e. Huner ew huner e. "Berê jî û niha jî ez eynî kes im: Aramê TIGRAN." Bi vê yekê dixwaze bêje ku ew hunerê xwe di her demê de bi eynî dil û evînê berdewam dike.

"Divê ku hunermend ji hunerê xwe sar nebe. Xwe tim û tim nuh bikê. Huner bi nûbûnê dijî. Emrê min mezin bûye (58 salî) Li her aliyê hunerê xwe de xwe wek xortekî 24 salî dibînim."

Aramê TIGRAN li gelek cihan geriya ye û

hunerê xwe pêşkêş kirî ye. Pirraniya komarên Sovyeta kevn, hemî welatên Ewrûpa, pirraniya welatên kevn yê sosyalîst û hwd. Dewletên Erebbî neçû ye.

Aram bi hin tiştan şah e. "Berî ez bêm Ewrûpa, gava min disitrînd guhdarên min, li dora min kêr bûn. Min kêr kes didît. Dengê min digiha wan lê ez bi xwe li dûr bûm. Niha ne weha ye. Ez derdikevim cejneke Kurdan û dest bi muzik û sitrana xwe dikim, bi deh hezaran kes li dora min guhdarî dike. Şah dibê. Govendê digre. Ez bi vê yekê pirr şah me. Ev tim û tim ji min re wek xwenekê bû. Ew xewna min bû rastiyeke."

Hunerê Aram ne bi tenê di sitranên Kurdî de ye. Ew "bi Kurdî, Ermenî, Tirkî û Erebbî" disitrîne. "Ez bi van çar zimana sitranan çê dikim lê ji yê Kurdî re zêdetir sehwa min heye û zêdetir xweşa min diçin."

"100 sitran-kilamên min bixwe hene. 40 ji wan tekstên bavê min in. 60 ji wan yê helbestvanên kurdên cihê ne."

# KEÇIKA KIBRÎTFIROŞ\*

H.C. Andersen

Wergger: Bişarê SEGMAN

Çiqas sar bû... şevine hişkesahiyê... Berf dadiket, pê re jî tariya şevê. Şeva salê a paşîn bû. Sibetirê sersal...

Di vê şeva sar de keçikeke piçûk di nav kûçe û kolanan de digeriya... pêxwas û serkot. Gava terka mala xwe da, şekalin bi pê bûn: lê bi kêrî wê ne hatin. Ew pêlavine diya wê bûn, pêlavine kevin û lê fireh. Gava keçikê bi lez ji ber erebekê xwe dida alî, ew winda kiribûn. Keçik li wan geriya, lê ew peyda nekirin. Sêwlekekî fereke wan peyda kir û ew ji erdê hilanî. Lê temaşa kir, kenî û got: "Gava ji min re zaro çêbûn, ezê ji wan re bi vê şekalê landikekê çêkim."

Keçika kibrîtfiroş bi peyên xwe ên werimî û morbûyî di nav berfê de diçû: li rizqê xwe digeriya. Di berwanga wê de pakêtine kibrîtan hebûn û elbîkek bi destî ve bû. Lê bû şev û hêj tiştek ne firotibû. Birçî bû, diranên wê dirikrikîn, ji xurtiya sermayê ruyê wê diqermiçî.

Kuliyên berfê diketin ser keziyên wê ên şeh û di pora wê a gungîlî û hûrgurpik re diçûn. Lê tê de ne diheliyan, û li ser diqerisîn. Heçko xwîna keçikê jî cemidî bû.

Ji pencereyên xaniyan ronîke şîne li kuçan diherikî û bihîna qazên biraştî şîva şeva sersalê li hewayê belav dibû. Belê, şeva sersalê bû.

Keçikê dida eqilê xwe, nizanibû çî bikira. Vegere mal? Ne wêrî bû. Hêj tiştek nefirotibû. Çawan destvala wê vegeriya mal. Ma ji bavê xwe re wê çî bigota? Dizanî bû ku bavê wê dê jê bipirsiya, te çiqas firotin? Gava wê bigota, "min tiştek ne firot" kalo dê li wê bi-daya.

Bi van raman û texmînan keçik ket navbera du xaniyan û xwe bi talda xanîkî bilind girt. Heçko ew der talde bû û xurtiya sernê lê dişkiya. Ma xaniyê wan ji derve ji talda wî xaniyê mezin û depdepe germtir bû? Ma xaniyê wan çî bû? koxikek, ji her derê qulêr. Qulên koxikê bi ka û kincikan girtûbûn. Lê bayê kanûnan tê re dihat û carena ew ji qulan derdixistin, tavêtin erdê û baranê jî bi xwe re

\* Wergera vê çîrokê cara pêşî di sala 1943'an, di hejmarê ronahî ya 19'an de çap bûye.



*Hans Christian Andersen 1805 - 1875*

dixiste hundirê koxikê. Keçikê li destên xwe ên bêgoş û terikî dinihêrt. Hestiyokên destên wê di çermê wê re xuya dikirin. Qey çerm ji ser de ketibû.

Tiştêk hate bîra keçikê. Kibrîteke vêxista û di rivîniya wê de xwe germ bikira, çi dibû? Newêribû... Lê piştî midekî, bêî ko bide eqilê xwe, kibrîteke ji qûtîkê kişand û ew li teniştê elbikê şidand... Xirç... çi ronahîke geş, çi germîke şêrîn! Destên xwe ên qerisî li pêta kibrîtê gerand. Di germiya wê kibrîtê de canê wê ê mirî qey vejîya.

Sehwîrin didîtin. Digot qey li ber sobeke çînî û li ser doşekan rûniştiye. Çiqas lê germ bû bû! Kir ko lingên xwe jî bêxe ber wê sobê, wan jî germ bike. Lê sobe ji nişkêkê ve winda bû. Kibrît vemirî bû. Li destên xwe nihêrt. Tiştêkî di nav tiliyên wê de reş dikir... bizotê kibrîtê.

Keçikê kibrîteke din vêxist. Dîwarê xaniyê mezîni di ber ronahiya wê de qey bû bû pîpoqek. Bînahiya mirov tê re diçû digihaşte heta saloneke biheşmet. Di orta salonê de maseke xwarinê xuya dikir. Li ser masê, di nav lengerîke isfehanî de qazekî biraşî hebû: kêr li piştê wî daçinkandî bûn. Niho wê bihatana, bi kêrê ew perçe bikirina û li mêvanan lêk vekirana. Lê welê ne bû. Qaz xwe ji masê zer kir, daket erdê û berê xwe da keçikê...Kibrît vemirî. Di pêşîya keçikê de ji dîwarekî stûr pêve tu tişt nema bû.

Keçikê kibrîteke din vêxist. Nihêrtinên keçikê dîsan di dîwêr re çûn. Ma ne şeva sersalê bû? Qirdikek çêkiribûn û li dorê diyariyên danî bûn. Bi sedan find vêkafî bûn. Çi temaşeke cazîbebar! Keçikê kir ko destên xwe dirêjî wan bike... Kibrît vemirî, dîwarê stûr ket ber çavên keçikê. Bi tenê find bi hewa diketîn û

gesta ezmên dikirin. Gava gihaştinê dibûn stêrk. Yek ji wan stêrkan ket û wek stêrkeke pekok li singa ezmên xetêke sor kişand û winda bû. Keçikê got: yek dimire. Belê, dapîra wê jê re digot: "Gava stêrkek dikeve canekî ber bi Xwedê dibe" Ax, ew dapîra delal, mirova tekane, ya ko jê re qenc bû. Heyhat stêrka wê jî ketibû. Keçikê kibrîteke din vêxist û ew da ber dîwêr. Vê carê çi dibîne? Dapîra xwe! Keçikê xwe avête himbêza wê, da ber qîran û got: "Dapîra min, dakika min, min zûka bi xwe re bibe! Ez dizanim, heke kibrît vemirî, ez te jî, wek soba çînî, qazê biraşî û qirdikê sersalê, te dapîra xwe jî dê winda bikim". keçikê pey hev kibrîtên elbikê hemî vêdixistin, ko dapîra xwe winda nekit. Dapîra xwe tuçaran evçend spehî û dilovan nedîtibû.

Di ronahîya pêtên kibrîtê de dapîrê neviya xwe kir himbêza xwe, her du bi perwaza milyaketan ber bi ezmanê jorîn firîn. Ewçend bi hewa ketin ko nema bi serma û birçîtiyê diheşîyan. Gihaştibûn nik Xwedê.

Sibetirê emeleyên belediyê, gava kuçe û kolan rêş dikirin, di navbera du xaniyan de keçikêk dîtin. Keçik li erdê rûniştî bû: hanirikên wê sor dikirin, kenekî zîvariyê di ser lêvên wê re diqeliqî. Keçik mirî bû: Ji sermayê qufilî... di şeva sersalê de emirê Xwedê kiribû. - Dema ko tavika roja sersalê dida cendêke wê ê hûr, xelk lê dicivîyan û ew seh kirin. Di nav tiliyên wê de darikê kibrîteke vemirî reş dikir. Elbikeke vala li rex cendêkê keçikê bû. Xelkê digot: "Dixwest xwe bi kibrîtê germ bike, lê..."

Lê ew tiştên spehî, yên ko keçikê şevê di dîtibûn, ne dihatê bîra tu kesî. Dîsan kesî ne dizanî, çawan û bi çi awayî di himbêza dapîra xwe de pê li roja salê a pêşîn kiribû.

# HEVPEYIVÎN BI HESEN SILÊVANÎ RE

## XEM DÎHOKÎ

*Hesen Silêvanî di sala 1957'an de, li gundê Tirkija, nêzikî bajarê Zaxo, li Kurdistana Iraqê ji dayik bûye ye. Hukûmeta Iraqê zû gundê wan wêran kir û ereb anîne de-verê. Lewra ew ji wir çûne bajarê Mûsilê. Di sala 1975'an de dest bi nivîsandinê kiriye. Ew çîrok û helbestan dînivîstine. Wî berhemên xwe di kovar û rojnameyên Kurdî de belav kirine. Ew li Kurdistana Iraqê endamê ye-kîtiya nivîskarên Kurd e. Heya niha diwanek wî bi sêpên erebî, di sala 1991'ê de çap bû ye. Ew niha jî li Kurdistana Iraqê dimîne.*

\*Kengî û ji bo çi te dest bi nivîsandinê kiriyê?

\*\* Demê ez li mektebê şagird, li salên 1975-1976 ê, li bajêrê Mûsil, min dest bi nivîsîneka bê xêr, bi zimanê erebî kir. Min hindek rêz û pexşan dinivîsîn, em komeka hevala bûn û me nivîsînên xwe, bo hevdu di xwandin. Mamostayê me yê dersa erebî, gelekî tembel bû, lewa wî rê di da, di dersa wî da, berhemên xwe bixwîn û gengeşê li ser bikîn. Li destpêka sala heştîyê, min biryar da ez bi dirustî fêrî xwandin û nivîsîna zimanê xwe yê zikmakî bibim.

Piştî sê sala min wêra hindek hozanên xwe yên sava binêrime rojname û kovarên kurdî.

Paşî hîngê min çîrokên xwe yên kurt jî, kit kite belav kirin. Heta niha jî ezê vê rê dişeqînim. Xwezî min zanîba, bû çî min dest bi nivîsînê kir! Min hind xwe dît ezê dinivîsim. Min gelek hej vê cîhanê kiriyê û pêlên sihrîyên ne diyar bi hêzeka mezin min dikêşin vê cîhana pîrr xweş û hîvî û serbestiyê. Dema ez ji berhemekî serkeftî xilas dibim, hîngê dilê min dixwazît ji sîngê min derkevît û bifirît çîyayên ûmêda. Ez hest bi xweşiyeka pîrr mezin dikem. Lê nizamim bûçî!!

\* Barê edebê kurdî evro çewaye? Helbest, çîrok û rexne.

\*\* Bi renekê giştî karwanê edebê kurdî yê pêşve diçît. Hindek nivîser ji karwanê peyvê bi rê ve man, hindek yê li dûr xwe dizivirin û hindek yê pêngavên fireh diavên û bi bawerî didin rê. Helbesta kurdî, xwe ji kav-lankê kevin rizgar kiriyê û kirasekê nû li ber xwe kiriyê. Hozana kurdî, qet ji ya erebî kêmtir nîne. Çîroka kurdî, niha ji hemî tuxmên edebî bi hêztire û pêşkeftire, çîroknivîsên kurd, nexasim yên xurt, gelek nêzikin ji

teknîk û şeweyên hevçerx di cîhana çîroka ev-ro da. Ez bawer dikem, eger çîroka kurdî bi şehrezayî, hate wergêran bo çend zimanên bi-yanî, Hîngê dê dengê xwe li cîhanê hebît.

Rexna kurdî, seqet û kureye. Hindek nivîsîn li bin vî navî hene, lê gelek ji îdyemî dûrin û nagehin sîtafka rexna edebî. Di vî babetî da, em savane...

\*Hizra te li ser edîbên derveyî welatî çîye? Wezîfa wan û çî biken başe.

\*\* Ez nizamim ev edîbên dervey welatî, çî-ma bê dengî!! Bê bizavî!! Navê kesê ji wan, wek edîbên cîhanî, şewq ne daye! Nexasim dergehên serbestiyê li ber wan vekirîne û astengên mezin nînin. Mixabin edîbên me ji xerîbîyê vegeryan welatî û wan her şîrên berî deh, diwazde sala bo me dûbare kirine ve! Kanê berhemên wan yên nwî? Kanê ew mi-fayhe ji biyanîya wergirtî? Wezîfa wan ewe ku, dengê edebê kurdî bigehînin welatên ew lê bişên, alayê peyva kurdî bilindken û bi torê kurdî bi xurî û li nav civatên edebî belavken. Ez pîrr ji dîl supasya edîbên kurdên li Enstîtuya kurdî li Parîsê dikem. Hîvîdarim rê ya xwe ya pîroz bermeden û hemî edîbên derve harîkariyê li gel biken.

\* Tu bi çî mijolî û pirojên te çîne?

\*\* Ez niha berhemên nivîskaran kom dikem, da ku govara Yeketîya Nivîskaran (Peyv) derkî. Dîsan komela çîrokên xwe yên kurt, vediguhêzim ûpên lafînî û wêrdigerînim zimanê erebî. Eger min şîya ez dê çap kem. Careka dî ez yê li kurte romana xwe (Gulistan û şev) ewa li sala 1987 ê min nivîsî, pê da di-çim xawr û hindek guhrînen biçûk yê peyda dibin. Komelek hozan û çîrokên kurdî min

wergerandîne erebî û piştî dergehên serbestiyê ve bûyn, ezê kit kite belav dikem. Ez û desteka nivîserên genc li ser derxistina govara (Tî-roj) berdewamîn. Hindek kaxezên biçûk yên min piştî serhildan û reva mezin reşkirîn, ezê lê dizivirim da ku bibine binyatê romanekê yan jî çend çîrokên kurt.

\* Di vî kawdanê xirab da, dewrê edîbê kurd çîye?

\*\* Behra pitir ji serhildan û şoreşên Kurdistanê, edîb û rûşenbîrên kurd çirayên wan bûn. Nivîsînên wan, xelkê Kurdistanê ji xewa bêzaryê û nemanê hişyar dikirin û bo guhrî û xizmeta kurdîniyê palve didan. Evroke jî edîbê kurd yê şoreşgêr, qelemê xwe yê tîj kirî, da xizmeta kurd û kurdistanê biket. Serkeftina mezin ya miletê da, piştî serhildana bihara 1991 ê, diparêzin û dijî zulm û zûrya dijminê çepel di rawestin. Lê mixabin, hindek edîb hene, bi devî û nivîsînê, kurd perwerin, lê bi kiryarên xwe rwîvî ne û ji kurdîniyê gelek dûrin!!

\* Edebê biyanî, çî kartêkirin li ser yê kurdî kirîye?

\*\* Piştî peydabûna rêyên hevgehiştinên rûşenbîrî û dewrê wergêranê, di qada edebî da, torê biyanî kete ber destên me, di rê ya xwandina wan da, kartêkirin li ser edebê kurdî kir û şwîn tiliyên vê ekamê, li ser hindek nivîserên me, nexasim yên genc, diyarin. Ez dişem bêjim, torê biyanî çavên me bo pêşveçûn û dahîmanê vekirin. Lewra tuxîbên nivîsîna kevin û besthi şkandin. Gelek torevanên kurd hene, çî ji torê biyanî nexandîne û na xwînin! Tinê navên nivîser û kitêbên wan ve dicîn!!

## EVÎNDARE MEHABADÊ

---

Hesen SILÊVANÎ

Hoy Memo, Memê Alan  
Hevalê evîndaran.  
Li wê zîndana bi tirs û tarî.  
Ji bîr nakî,  
Dîmê Zîna xem xwarî.  
Û zer hinî  
Werin, werin  
Evîndarên evî warî.  
Dê zû werin  
Desta dirêjkîn bo cana bi wefa  
Da bînîn derê, lawkê xir xema.  
Da geşbin stêrên şeva  
Da kutirk bigehin refa.  
Da bizanîn ka em hene!  
Ma em hene!!  
Ma em hene?!

\* \*

Li çar suya çar çira  
Ew xwîna zelal rija  
Bi dengê şêra li daristanê  
Gote gulistanê  
Ger gotne te:  
Çû û naête ve.  
Dê mirî û na bînye ve.  
Wan peyva bawer neke  
Pirça bê xena şeke  
Çavên belek kilde

Lewendîyên şûr hilde  
Digel kewa bi qeq qebe  
Dê min bîni di nav davhen tavê  
Mîna çulî li çîyayên Kurdistanê  
Dê min bîni li ber lêvên avê  
Wek gulek gelek geş li biharê  
Dê min bîni li hemî cih û wara  
Mîna siha kevr û dar û bara  
Dê min bîni li nav rêzî  
Li ber pezî  
Mîna rezvanekê heyî  
Şivanekê terş lê zayî û  
Bilîr li ber devî.  
Vêca çewa  
Dê çim û na ême ve?  
Dê mirim û min na bînye ve?  
Çewa? Çewa?

1982. Kerkûk.

## DENGEKE TÎJ JI EFRIQA

*"BO Maryam Makîba"*

Erê canê.  
Ma tu nizanî,  
Îro li bajêrê janê?  
Xela û celaye û mirov xwarine?  
Dê lez bike û  
Kaxezên xwe komke û herre.  
Çi wêna negirê ji merre!  
Qet ne bêje evîn çîye û çî nîne!!



Li vir bîrtî û zikreşî ye.  
Evîn ji me revfye.  
Tereqîye.  
Bûye pezkovî, nêçîrvana kuştîye.  
Hizra hizar, hizara  
Genim û birinc û goşte,  
Sewkeka nanê sotîye.  
Dewîneka şeş şevîye.  
Saqo û kiras,  
Derpêyekî dirandîye.  
Ker xepaleka pêlaveka,  
Pirt, pirtîye.  
Û evîndar  
Ho peyamêra reng purtegal  
Evîndarên ho rengreş û  
Hizir zelal  
Bo hêviyekê mayîn e!  
Ne mirin e!  
Bo Efrîqaya me,  
Bo me mayîn e, mayîn e...

1984

# KAM BÎ EDITH SÖDERGRAN?

EDITH SÖDERGRAN (1892 - 1923)

Faruk YAKUP

**E**mser, se (100) salê hozanwano (helbestvan) Swêdî Edith SÖDERGRAN bî. Edith SÖDERGRAN S: t Petersburg (Lenîngrad) di 4. Nisan . 1892 di ame yo dinya. Piyê cî û may a ci Finland-Swêdî bîyo û eleqa yê înan zî wûnî bol wendiş û niwîştîşî çinêbîyo. Maya Edith, cinya yê kêye bîyo û pî yê ci zî nêcar bîyo. 1908 di tbo ra (tîberkîloş ra) mireno û zey şima zî zanê ki, tbo o çaxana neweşey a bêderman bî.

Çi çax pî yê Edith mireno, maya ci berpirsîyarî ya Edith gîno xu mil û Edith rişeno mektebê no (niwistanî) herî weştir. O niwistan, niwistanî herî weştirê S:t Petersburg (Lenîngrand) bîyo. Jew ser, dima pîyê xu, Edith zî nêweşey a tbo ra kewno senatorîyûm. O çax a na Edith 16 serî bîyo.

1916 di pirtûkê xu yê "Dikter" (Hondiraway) çap keno. No pirtûkê ci di çen hondirawayê ci yê, meşhûr (weşî) est bîyo. O hondirawayê ci zî ser hez kerdene bîyo. Edith, grupê litaretorê Swêdî (mîyanê rewşenbîrê Swêdî) bol gird bîyo û merdim şeno vaco ki



*Edith Södergran (1892 - 1923)*

litaretorê Swêdî di rayê newe akerd. Bewnê se

vano kurd,nas û Kurdistan-nas hozanwano gird Gunnar Ekelöf "Jew zaf hozanwano gird. Çûçikê no bî rûmet, heyf bî ma êy devin ke. Guna yo ma êy devin ke bin no erdî. No erdî ki çen cara lej vîna yo ser xu di. O malê nêy erdî nêbî." Nêy ra weştir hevok (kelîme) zî ez nêvîna...

Hondirawa yê xu Edith bol hez kerdeni ano kar. Ma nêy weş zanê ki, jîyan a ci di qe kes çinê bîyo. Ma vîna şenê vacê ki jîyan a ci di jew est bî. Merdim nêy hondirawa yê ci yê "Dagen svalnar" (Rojo honik beno) di merdim şeno nêy weş bivîno "Nika ez ferq kena destanê ci yê giranî ser qolê mi." Eger embazê ci nêbîya yê, Edith nêşabî nêy biniwisno. 1917 di Sovyetî soresbî û Lenîn welat girot destê xu û o çax Edith û may a ci Lenîngiradi bî yê. O wext a na Sovyeti vêşaney û nêweşey bol bîyo. Ema Edith vîna zî bawerî bijîyan keno û 1918 di pirtûkê ci yê "Septemberlyran" (Lyra yê Îlonî) (Lyra yeno no name: Instrumenê Rusî). 1920 di zî pirtûkê xu yê "Sista Framtidens skugga" (Sersî ya wextê qedayenî newe) ni-

wisnayo. Ser 1955 di zî embazê ci Hagar OLSSON name yê ci çap keno û name yê pirtûkî zî no bîyo "Ediths Brev" (Name yê Edithî). Nika Swêdi di jew niwiskari ser jîyan a Edith SÖDERGRAN doxtorey kerdo (1985) û nika zî pirtûk ine ser Edith niwisna yo. Name yê pirtûkê ci heta nika eşkere nêbîyo. Ema name yê niwiskarî noyo Ernst Brunner.

Edith Södergran, bol etkî yê Zardeştî û Rudolf Steiner mend bîyo. Çî yê bol eceb noyo ki bol niwiskarî Swêdi bin testrê Zardeştî mendo. No çî yê rasto ki Nietzsche bi pirtûkê xw yê (Wûnî va Zardeşt) na Ewrûpa di rayê newe akerdi. Heta Hitler zî pirtûkê xu di nêy vano...

Ser 1923'ê di, 31 sere keynekê no ciwan, hozanwano gird û jîyan hez kerd a Edith SÖDERGRAN'i sûki Karelska di, nezdî yê kêye yê ci û ser erdê ci di, ay devin kenê. Zey Ekellf vano "Ti malê êy erdan nêbî. Ki o erdî lejî vînay" û raşto. Hozanwanê no wûnî homanîst, senîn beno erdî ay qabûl ke.

# ROJO HONİK BENO

Edith SÖDERGRAN

- 1 -

Rojo honik beno hemberê şani di  
destê mi ra bişmi germey  
germey a gûniy a destê mi zeydê bihar o  
destê mi tepşi, tepşi qolê min o sipe  
tepsi hesretey a ziravey a qolincê mi...  
Hîs kerdeni heme çî ra weştir o  
tenya jew şani, jew şani zeydê nêya  
sere yê to yê giran, ser sîne yê mi di.

- 2 -

Ti eşî gula sûr a evîn a xu  
mabêno şeqê min o sipe  
ez tepşena destanê xu yê germî  
gul a sûr a evîney a to, o yo beno wûşki  
ti çimê serdi, wêhêr benê heme çî rê  
ez êy taci gîna, ki ti danê mi  
êy a sere yê mi yeno cêr, ser dilê (qelb) mi...

- 3 -

ewro heta nika no jew fino, ez wehêrê xu vîmena  
wûnî qûvet lertzîya ya û jew car êy naskerda  
nika ez ferq kena destanê çî yê giranî ser qolê mi  
ka kotî di ro, zey zingil a hûwatan a min o keynekey  
ka azadî ya min o cinyatey û qandê çî çî dûvarî kerdê çorşman di  
sere yê mi  
nika destanê çî yê giran, canê min o lertzayeni tepşeno-germ-  
vengê wûşkey a rastey, yeno nika mi rê  
hemberê min o nazîk, hewinê min o nazîk.

- 4 -

Ti jew kulîlk gêyra  
û mêywe vînay.  
Ti jew kanî gêyra  
û ti derya vînay  
Ti jew cinya gêyra  
û ti ruh vînay  
Ti ecizê.

Açarnayîş: Faruk YAKUP



# ZEWTE Kİ ÇORŞMEY (DORMEY) SÊWREGİ, ÇERMÛĞİ Û ALDÛŞÎ DEYÊNÊ:

---

## Koyo BERZ

A- Adir a bandê to / şima kewo.

Adir a bedendê to kewo.

Adir a gandê to kewo.

Adir a keydê to/şima kewo.

Adir a qesibada to kewo.

Adir a Zerîda to kewo.

Adir a pirêndê to kewo.

Adirê cahnimî di ti biveşê/a.

Adir di ti biveşê/a, ûkoz bê/ba.

Adir a mîyan di ti kizrikî bê/ba.

Adirî miyan di ti bipirayneyê/a.

Adirî miyan di ti bipeyşê/a.

Axba mi to bo.

Axbetê mi bîro to sere di

Axbetê to (gî) bîro.

B- Barê to çewt bo, ti nêşê hewadê.

Barê to dîndeyo, ti şewi gema bimanê.

Barê to dîndeyo, ti bin di bimanê.

Bedenê to biveşo laco/keynê.

Bedenê to biqurmiçîyo laco/keynê.

Bejna to nêvijîyo, ti bicewê bimanê/a.

Bela to ser ra kemî nêbo.

Bela to/şima rê bivaro.

Belayo gird to/şima rê bîro.

Belay ver ti/şima nêreyê.

Beynê to vîla bo.

Beynê to, to sere ra bivijîyo.

Boka adir a gandê to kewo.

Boka aqilê to vînî bo laco/ keynê.

Boka bejna to, to bin di bimano.

Boka boy bexi to kewo.

Boka boy bexi lejda to kewo.

Boka boy bedendê to kewo.

Boka cahnim di ca to dest nêkewo.

Boka cay to cahnim bo.

Boka cîger a to kebab bo.

Boka cîger a to bihelisîyo.

Boka cîger a to kul bo.

Boka çimê to birijîyê mi lep kewê.

boka çimê to korîbê.

Boka çimê to nêvînê.

Boka çimê to tarî di bimanê.

Boka dest û lingê to bişikîyê.

Boka derdandê to rê derman (darû)  
nêvîneyo.

Boka demaşkul to pero (to di do).

Boka derdandê to rê diqtoran di derman  
nêvîneya (peyda nêbo).

Boka erdosê ardî key şîma nêkewê, Şîma kêber kêber bigeyrê û parse bikerê.

Boka erdîşa to sipê bo.

Boka erdosê heri to dest nêkewo to pa tirbi kerê.

Boka erdosê heri çîmanê to mird kero.

Boka erdîşa to birijîyo.

Boka ê to, to gana neyê.

Boka fekê to çewt bo.

Boka fekê to kok ra kilît bo.

Boka fekê to, to ra bikewo.

Boka gangêr ganê to bigîro.

Boka (gî) to, to pîze di wişk bo.

Boka îniyê şîma bipeyşo (bimiçiqîyo) û ci ra çilkê awi nîro, şîma bişimê.

Boka jan gandê to kewo.

Boka jahra ti bimirê

Boka jew ê to didi nêbo.

Boka jew do şitheram şêrîkê to bo.

Boka jû da şitherami raştê to bîro.

Boka kemerî dîndeyê to ser.

Boka kuçî to rê bivarê.

Boka kuçê Ellay bûrê to sere ro.

Boka kulî to pîze kewê.

Boka leş a to to dimi kaş bo.

Boka leş a to tîkey tîkey bo.

Boka lingê to erd nêresê.

Boka lingê to erdî nêtepeşê.

Boka lingê to to bin di bîmanê.

Boka lingê to to bin nêşaneyê.

Boka lingê bişikîye

Boka loqrey to bivijîyê.

Boka loqrey to qul bê.

Boka loqrey to to ra bikewê.

Boka malbata şîma pergem pergem bo.

Boka nan to/şîma dest nêkewo.

Boka nan arwêş bo ti tazî bê, bifetilnê, bifetilnê nêşê tepêşê.

Boka ocaxê to kor bo.

Boka ocaxê to pergem pergem bo.

Boka ocaxê to vila bol.

Boka ocaxê to biveşo.

Boka peynîya to çinê bo paştîya to bigîro.

Boka porê to birijîyo.

Boka porê to sipe bo.

Boka qeçê to to gan a neyê.

Boka qeçê to kuçan di bîmanê.

Boka qeçê to bê may û bê pî bîmanê.

Boka qeçê to sêkur bîmanê.

Boka qeda to ya guno.

Boka qere xeber a to mi rê bîro.

Boka rîyê to sîya bo.

Boka rîyê to nêhûwo.

Boka soyinê to (gî) bîro.

Boka soyinê to nîro.

Boka soyê to telaf bo.

Boka şîma kêber kêber bigeyrê û parse bikerê.

Boka şîma îfleh nêbê.

Boka şîma roj nêvînê

Boka şîma dişmenî destî bîmanê.

Boka şîma dêmarî destî bîmanê.

Boka tîkey to ra werzê, birijîyê.

Boka tîkey to ra biqlayê.

Boka ti adirdê cahnimî di biveşê.

Boka ti a dimî di cahnim di bîmanê.

Boka ti bûrê kiştîni.

Boka ti bimirê, to rê kefen nêvîneyo.

Boka ti bimirê meytê to nêvînê.

Boka ti be, parse to dest nêkewo

Boka ti bê îman şîrê.

Boka ti cahnim ra nêvijîyê.

Boka ti çimsûrîkî bê û raştê beladê xobirê.

Boka ti aw di şîrê.

Boka ti dari ra biperê mezgê to vila bo.

Boka ti dari ra biperê letey to nîyarêbîyê.

Boka ti darda qiznawerîya bîmanê û qêrînîya to erd û azmînî bibîmo.

Boka tewê giranî to depşê.

Boka ti gema bîmanê, cinawirî to bûrê.

Boka ti hewna şîrê fina aya nêbê.

Boka ti jahra bimirê.

Boka ti jahrdê marîya bimirê.

Boka ti kemer ra biperê.

Boka ti kemerî bin di bîmanê

Boka ti key xo nêresê.

Boka ti key xo nêvînê.  
 Boka ti kuçi bin di bimanê.  
 Boka ti lingan xo ver nêşanê.  
 Boka ti lingan ser darda bê.  
 Boka ti mal xirab bimanê.  
 Boka ti mankeri ra biperê.  
 Boka ti mihtacê dişmendê xo bê.  
 Boka ti nan nêvînê.  
 Boka ti parse bikerê.  
 Boka ti pêlan ver şîrê.  
 Boka ti qansêr bê.  
 Boka ti qangiran bê  
 Boka ti qerşûn a şîrê.  
 Boka ti qerşûnan ver şaneyê.  
 Boka ti raştê jewdê gunsîyay birê.  
 Boka ti raştê jû da şitherami birê.  
 Boka ti raştê merdimandê xiraban birê  
 Boka ti ray bin kewê  
 Boka ti rîyê cenetî nêvînê.  
 Boka ti rîyê nanî nêvînê.  
 Boka ti ro di şîrê.  
 Boka ti roj o hera nêvînê.  
 Boka ti serî ser şîrê erd ra  
 Boka ti seqet bê.  
 Boka ti şan nêkerê.  
 Boka ti şefaq nêresê.  
 Boka ti şefaqî nêvînê.  
 Boka ti/şîma bê ti/şîma nan nêvînê.  
 Boka ti/şîma bê nan to/şîma dest nhekewo.  
 Boka ti/şîma bê qatira to/şîma bizo.  
 Boka ti tavi ver di bimanê.  
 Boka ti teber a bimanê.  
 Boka ti tewan ver kewê.  
 Boka ti tîjî ver a bimanê.  
 Boka ti umet a xo ra dûrî bimanê.  
 Boka ti ûrîsî dest kewê.  
 Boka ti vergan rê werd bê.  
 Boka ti vernîya xo nêvînê  
 Boka ti veraroj a bimanê  
 Boka ti verî ser şîrê era.  
 Boka ti werem bê.  
 Boka ti wişk ba to ra qeç nêbo.  
 Boka ti wirna çîman ra kor bê/a.

Boka ti wirna dest û lingan ra bibê/a.  
 Boka ti xo bin di bikerê/a.  
 Boka xof to pîze kewo, ti tim bitersê/a  
 Boka zoxî to ra biqlayê.  
 Boka zerîya to biteqo.  
 Boka to ra bibê to gan a neyê.  
 Boy to kewo  
 C- Ca to dest nêkewo, ti tey sitarbê/a.  
 Ca çînê bo to tirbi kerê.  
 Cay Ellay to dest nêkewo.  
 Cay to çînê bo ti tey biheweyê.  
 Cay to cahnim bo.  
 Cay to çînê bo ti tey rakewê.  
 Cahnim di jî ca to rê çînê bo.  
 Cîgera to xul bo.  
 Cîger a to kul bo.  
 Cîger a to birîjîyo.  
 Cîger a to biveşo.  
 Cîger a to qansêr bo.  
 Cîger a to werem bo.  
 Cîgeri to ya nêmano.  
 Cîger a to kebab bo.  
 Cîger a to bihelisîyo.  
 Cîger a to to ra cibo.  
 Ç- Çenge to ya nêmano, ti pa nan bûrê.  
 Çengey to bikewo  
 Çengey to bişikîyo.  
 Çengey to çewt bimano.  
 Çeqçeqe ayredê to nêgeyro.  
 Çewresê to pîrr nêbê.  
 Çimê to korî bê.  
 Çimê to birijîyê to var.  
 Çimê to bivijîyê.  
 Çimê to mi lep kewê.  
 Çimê to akerdey şîrê, bimanê.  
 Çimê to boka şaş bimanê.  
 Çimê to roj o hera nêvînê.  
 Çimê to beloq bimanê  
 Çimê to roşnayî nêvînê, nêkewê  
 Çimê to boka qeç nêguno, nêvîno.  
 Çimê to nan nêguno, nêvîno.  
 Çimê to çimê bênamûsan bê.  
 Çimê to birijîyê mi lep.



Çogê to bişikîyê ti nêşê werzê xo ser.  
Çogê to zey qewsîya çewt bimanê.  
Çogê to to ver nêşaneyê.  
Çogandê to di taget, derman nêmano.  
Çorr şîma kewo, şîma ra jew nêmano  
Çorr şîma rê bîro.

D- Darê qiznawêrî şîro to pîze ra.

Demaşkul to pero  
Demaşkul to di do.  
Dest û lingê to to ver nêşaneyê.  
Dest û lingê to pûç bê.  
Dest û lingê to bişikîyê.  
Destê to bişikîyo.  
Destê to çewt bimanê.  
Dest û lingê to bihinglêsiyê.  
Dest û lingê to bihelisiyê.  
Dest û lingê to to ra bikewê.  
Destê to seqet bo.

Dest û lingê to seqet bê, ti tim xo bin di bikerê, kes çinê bo to bin ra berzo.

Dest û lingê to bişikîyê, ti erd o diskîyê.  
Destê to çîyê nêtepişê.  
Dindanê to birijîyê.  
Dindanî to fek di nêmanê.  
Dindanê to bişikîyê.  
Dindananê to hemini kermî bûrê.  
Dûrê mi/ma ti belay xo bivînê.  
Dûrî ra qere xeber a to mi rê bîro.

E- Ecelê to dişmenî dest ra birê.

Ella ganê to bigîro.  
Ella belayê xo bido to.  
Ella rihê to bigîro.  
Ella to/şîma rê Ellayey nêkero  
Ella çîmanê to sipey kero.  
Ella mi/ma ra dûrî bela bido to.  
Ella to kemer ra bipemo.  
Ella to rê nêverdo.  
Ella to zincî ra bîyaro.  
Ella to pîrnîki ra bîyaro.  
Ella to ver di dîndo.  
Ella to herûn di wişk kero.  
Ella fekê to çewt kero.  
Ella to ra bigîro bido mi.

Ella heyfê mi to ra bigîro.  
Ella heyfî to ser o nêverdo.  
Ella to mihtacê, mihtacan kero.  
Ella to rê bîro xezeb.  
Ella to cahnim di biveşno  
Ella çîmanê to vejo.  
Ella çîmanê to korî kero.  
Ella girwey to raşt nîyaro.  
Ella kar û barê to xirab kero.  
Ella qeçanê to to ra bigîro.  
Ella qeçandê to rê nêverdo.  
Ella wela sûri bîvarno to ser.  
Ella tofanê xo to rê biqlayno  
Ella to afetan ver şano.  
Ella to pêlan ver şano.  
Ella to sêlan ver bero.  
Ella to dest û lingan ra mahrûm kero.  
Ella adir a qesîbada to fîno.  
Ella to dest û lingan fîno.  
Emel to ser kewo  
Ereba dîndeyo ti bin di bimanê  
Estey to werdî werdî bê.  
Estey to biheleyê.  
Estûna bandê şîma dîndeyo, bişikîyo şîma  
heme bin di bimanê.  
Espîjî to ser kewê.  
Espîwî to bûrê.  
Ê mi to rê nêmano.  
Ê mi to zincî ra bîro.  
Ê mi to çîman ra bîro.  
Ê mi to pîrnîkî ra bîro.  
Ê mi to rê zehîr zuqum bo.  
Ê mi to gan a neyo.  
Ê mi to rê heram bo.

F- Fekê to bişikîyo.

Fekê to çewt bo.  
Fekê to kilît bo.  
Fekê to tadeyo.  
Fek to ya nêmano  
Fek û zincî da to ra bîro.  
Fîrki to mîyane kewo, ti xozîk bimanê.  
Fîtîl fîtîl to zincî ra bîro.  
Fîtîl fîtîl to pîrnîkî ra bîro.

# Lêkolîn Mehmed Uzun

## Destpêka Edebiyata Kurdî

### Weşanên Beybûnê

---

Husên DÜZEN

Nivîskarê Kurd Mehmed Uzun di vê lêkolîna xwe de bi awayekî zanistî li ser edebiyata Kurdî radiweste. Wî bi sedan pirtûk, kovar û rojnameyên li ser vê babetê tevdane.

Di Kurdî de du maneyên peyva "Destpêk" hene: Ew hem tê maneya peyva tirkî "Başlangıç", hem jî tê maneya "Giriş". Di navê pirtûkê de ew bi maneya duwemîn haytiyê bikaranîn. Ango di vir de nivîskar ne tenê behsa pêşiyên edebiyata kurdî, berevajiyê wê, wî tevaya edebiyata Kurdî vebiriye. Mehmed Uzun bi awayekî xurt xwendevanan dikişîne nav behra edebiyata kurdî. Kesê ku bixwaze bêtir li ser edebiyata kurdî serwest bibê, dikare vê pirtûkê weke rêberê bi kar bîne. Di dawiya pirtûkê de nivîskar gelek çavkaniyên bikêrhatî dane. Wek mînak em dixwazin navê diduwan ji wan li vir bidin: "Dîroka Edebiyata kurdî" ya Qanadê Kurdo û "Mêjûyî Edebî Kurdî" ya

Eladîn Secadî.

Wek me li jor got, nivîskar di "Destpêka Edebiyata Kurdî" de gelek çavkaniyên bikêrhatî bi kar anîne. Qala bi sedan roman, kurteçîrok, helbest û hwd. dike. Lê wî nexwestiye bînderek ji rastî û fakta li ber xwendevanan kom bike. Wî di gelek cihî de gava qala nivîskarekî kiriye, rexneyek edebî jî bi awayekî kurt lê girtiye. Ew li ser xweseriya nivîskariya gelek nivîskara sekiniye. Ji aliye-kî din, M. Uzun ramanên xwe wek tîzan aniyê ziman.

Wek mînak:

- Edebiyata kurdî jî wek welatê kurdan û jiyana wan her dem tîkoşîna parastina hebûna xwe dide.

- Tu deverên din ku wek li Kurdistanê edebiyat û poîtîka bi hev re hatine girhedan tune

ye.

- Hemû xebat û lêkolînên li ser edebiyata kurdî pêwîst e ku dakevin ser rehên edebiyata kurdî ya devkî.

- Dengbêj û çîrokbêj gelek karên civakî fîn in cih; dîrokê didin naskirin, civakê şa dikin, hebûnek çendî û edebî dicivînin ser hev û di navbera rabirdû û pêşerojê de weke pîreyekê kar dikin. Û hwd.

Nivhîskar M. uzun di vê pirtûkê de giraniya xwe daye ser edebiyata kurdî ya modern, wî bi kurtayî qala rewşa kurdan û perçekirina welatê wan kiriye. Bala xwendevanan kişandîye ser çetînî û astengên li ber ziman û edebiyata kurdî. Bi awayekî pir kurt jî behsa pêşî û klasîkên edebiyata kurdî kiriye. Piştî vê jî ew li ser edebiyata devkî radiweste.

Mehmed Uzun, nivîskarekî kurd î pir zîrek e. Di wêre ziman, çand, edebiyat û rojnamegeriya kurdî de wî gelek karên rind kirine. Lê ew bêtir bi romanên xwe tê naskirin: "Tu" (1985), "Mirina Kalekî Rind" (1987), "Siya Evînê" (1989), "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" (1991).

Mehmed Uzun di romanên xwe de û di berhemên xwe yên din de pirtir li ser ronakbîrên kurdî disekine. Ew dibêje "Ronakbîrên welatêkî rûmeta wî welatî ne".<sup>1</sup>

Nivhîskar rola ronakbîran ji bo pêşketina civateke paşdemayî bir baş dizane: "Hewl û karê ronakbîrî her tim li pêşîya dîrokê ye. Gelek caran dîrok li gora firehbûn, kûrbûn û qeweta van hewl û karên ronakbîrî şikil digire. Pêşketna ronakbîran û tevgera ronakbîrî, pêşketina welat e".<sup>2</sup>

Mehmed uzun hemû romanên xwe bi kurdî nivîsîne. Ew sedema bi kurdî nivîsandina

roman û berhemên xwe weha tîne ziman: "Gava rewşa zimanê min ê bav û kalan ewçend kambax be, ez ê çawan jê rû ba bidim û bi zimanekî din binivîsim? Ez ê çawan beşdarî li avakirina edebiyata kurdî ya modern nekim. Çawan ez ê xwe ji avakirina tevgera ronakbîrî, felsefî, çandî û edebiyatî millî bidim alî?.. Li gora kîjan prensîbên exlaqî ez ê wan yekan bikim?"<sup>3</sup>

Ev bûn panzdeh sal in ku M. Uzun li surgunê, li Swêdê dijî. Berî ku ew derkeve derveyî welat, ji bo karê xwe yê rojnamegerî û xebata li ser zimanê kurdî li Tirkîyê çend caran hayite girtin û ketiye hevsê. Piştî ew mecbûr dimîne ku welatê xwe terk bike, ji ber wê yekê ew ji hemwelatiya Tirkîyê jî tê avêtin. M. uzun herçar romanên xwe li surgunê nivîsandine, ew nivîskarekî surgunê ye. Ew dibêje ku "Surgun hem dikare mirovan bikuje, hem jî bi pêş bixe".<sup>4</sup> Lê wek tê zanîn surgun ji bo wî bi xwe bû cihê afirandina berhemên pir çak.

Mehmed uzun xwe wek nivîskar û ronakbîrekî kurdî û navneteweyî dibîne: "Ders û tecrubeyên merivahiyê divê ne "xerîbê" kurdan bin. Ji lewre ez dil dikim, Ehmedê xanî hem bavê ziman û edebiyata kurdî, hem ji hevalbendê Dante, Cervantes, Firdewsî, Shakespeare bibînim."

M. Uzun ji aliyê bir û baweriya xwe ve ne dogmatîk e. Ji ber vê jî gotarên wî di gelek kovar û rojnameyên cihê de dertên. Ew hertim pêwîst xwe ji bo fêda gelê xwe bi kar tîne.

Ji damezirandina komara Tirkîyê û vir de dewleta Tirkî ziman û edebiyata kurdî hertim înkâr kir. Kesên ku bi Kurdî nivîsandin wê ew girtin û avêtin zîندان. Zanîngeh û ronakbîrên (!) tirk hewl dane ku bi ilmî(!) îsbata tunebûna ziman û edebiyata kurdî bikin. Lê ew nikaribûn bi ser biketana. Bûyerên li welêt û

guhertinên li dinyayê yê nû ew mecbûr kirin ku hebûna kurdan û zimanê wan qebûl bikin.

Van salên dawî gelek weşanxane pirtukên giranbuha bi tirkî li ser kurdan diweşînin. Bê şik ev karekî pir baş e. Gava meriv çavên xwe li pirtûkên bi kurdî digerîne, mixabin hejmara wan nagihîje tiliyên destan. Berhemên edebî yê bi kurdî hejmara wan ji didu sisiyan derbas nabe.

Daxwaza me ew e ku ev "Destpêka Edebiyata Kurdî" bibe destpêkek ji bo çapkirin û belavkirina berhemên kurdî li Tirkîyê. Wek M. Uzun dibêje: "Tarîx bêbext e, eger meriv ne xurt be û bi xurtî nexebite û eserên hêja neafirîne, bûyer, kirde û tiştên qewimî, bi demê re ji bîr dibin, şikil û şêwe dighurînin. Hingê ji bo serdestan pir hêsan dibe ku ew bikaribin bi van tiştan bilfizin, biguherînin û şekil û şêweyên nû bidinê.5

# DANASÎNA PIRTÛKAN

---

Amadekar: E. HUSEYNÎ

**N**avê pirtûkê: ji hesreta te... min peranga kevin kirin

Nivîsevan: Ehmed Arif - Helbest.

Wergêr: Dîldar Şeko.

Yekemîn care ku xwendevanên kurd li Kurdistanê Sûryê helbestên Ehmed Arif bi kurdî dixwînin. Pêşgotina pirtûkê mamoste Deham Evdîlfetah nivîsiye..

Navê pirtûkê: Xelek û peyman.

Nivîsevan: M. zîlanî-şano

Ev pirtûk di sala 1990 î de li Beyrûtê hatiye çapkirin. Pelên Şanoyê 110 in û ji sê biran şanoger û kesên cuda hatiye avakirin.

Navê pirtûkê: xwîna kewan û siwarên rew-rewkê.

Nivîsevan: Royarê Amedî-Helbest, bi zimanê kurdî.

Pirtûk ji 53 ê pela ye. Naveroka wê bi 17 e helbestên nûjen û serbest hatiye aferandin. Li Beyrûtê hatiye çapkirin û li Suryê belavkirin

/Kurdistan / Kurdistanê min / Kurdistanê lêv zuhabûyî ji qedexekirina gelek pirsan / Kurdistanê çav zuhabûyî ji pîrbûna hêsrên / Ez ê çawa bighême dengê teyî belavbûyî bê tirs?/

Navê pirtûkê: Çîrokine hîlbijartî.

Nivîsevan: Ezîz Nesîn

Wergerandina Keça kurd. Bi zimanê kurdî.

Pirtûk bi pêşgotina Keça kurd, ku li ser ziman û torevaniya kurdî ye û bi danaskirina Ezîz Nesîyîn û kurtejiyana wî, û bi nivîsareke Dr. Kemal Mezher, dest pê dike.

Pirtûk 102 pele, 7 çîrok in, ji zimanê erebî hatine wergerandin. Sala 1990 î li Beyrûtê hatiye çapkirin û li sûryê hatiye belavkirin.

Navê pirtûkê: DELAL

Nivîsevan: Henîf yûsif - (Danhev û wergerandin)

Pirtûk ji folklorê kurdî ye bi zimanê kurdî li gel wergerandina wê ya erebî li Şamê sala 1991 ê hatiye çapkirin.

Naveroka pirtûkê ji devê dengbêjekî ku dastana Edûlê û Derwêşê Ebdî ye, hatiye berhevkirin. Herdû bergên pirtûkê bi perîka hunermend Ehmed Berho hatine amade kirin.

Navê pirtûkê: Li ber dergêhen LALEŞ.

Nivîsevan: Sîmyar Yezdî-Helbest bi kurdî û Erebî.

Pirtûk ji du helbestên dirêj bi navê TEMA-RA û ANAHITA hatiye avakirin. Di helbestan de sîmbolên destanî ên rêberîya ola Zerdeştî hatine bikar anîn. Sîmyar Yezdî hewl daye ku hevpeyvînekê di navbera paşeroj û pêşerojê de biafirîne û alavên wî herdem rençkêşan û qirkirin û wewna berbadbûyî ya gelê kurd e, Pirtûk li ŞAMÊ bi alîkariya yekîtiya nivîskarên ereb sala 1990 î çap bûye. Wêneyên bergan hunermend Dr. Ebdulhekîm Huseynî amade kiriye.

Navê pirtûkê: Zarokên Cina (bîranîn)

Nivîsevan: Margirêt Kan

Wergerandina ji Îngilîzî: Nûra Şêx Bekir.

Pirtûk ji 439 pelên mezin e. Sala 1991 ê li şamê çap bûye.

Di pirtûkê Margirêt Kan bîranînen xwe, rewîşt, rabûn û rûniştina gelê kurd, kurte dîroka kurdan, jiyana xwe ya rojane ya bi jina kurd re, pîlanên navnetewî ên ku li dijî şoreşa kurdistanê îraqê hatine kirin, nivîsiye. Bi awakî rêk û pêk lêkolînê li pîsikolojîya mirovê kurd dike. Wêneya bergê Sêid Huseynî amade kiriye.

Navê pirtûkê: Ji folklorê kurdî.

Berhevkirin û wergerandin: Dr. Mihemed Ebdo Necarî.

Pirtûk 151 pel e bi zimanê Erebî sala 1991 ê li şamê çap bûye. Pirtûk ji pêşgotina Deham Evdulfetah û heft çîrokên ligel 406 metelokan û ji kurte nasîneke folklorî bi pênûsa Dr. M. E. Necarî hatiye pê. Di pirtûkê de mirov dikare Zembîlîroş - Siyamend û Xecê - Sêva Hacî - Leyla û Meşrûm-Mem û Zîn-Dimdim-Mamo û Eysê, bixwîne. Berg ji amadekirina Dr. Ebdelhekîm Huseynî ye.

